

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Erkan AKIN**

**MELA EHMEDÊ CİZİRÎ'NİN GAZELLERİNDE KULLANILAN EDEBİ  
SANATLAR**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2017**



**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Erkan AKIN**

**MELA EHMEDÊ CİZÎRÎ'NİN GAZELLERİNDE KULLANILAN EDEBİ**  
**SANATLAR**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**  
**Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER**

**MUŞ-2017**

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLAN**  
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Erkan AKIN**

**HUNERÊN BELEXETÊ DI XEZELÊN MELA EHMEDE CİZİRÎ**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER**

**MUŞ-2017**

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim- Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Hunerên Belexetê Di Xezelên Mela Ehmedê Cizîrî ” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin üç (3)yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

  
28/04/2017  
Erkan AKIN

**TEZ KABUL TUTANAĞI**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER danışmanlığında, Erkan AKIN tarafından hazırlanan bu çalışma 28/04/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan: Yrd. Doç. Dr. Hemin Omar AHMED

İmza: .....

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK

İmza: .....

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER

İmza: .....

Yukarıdaki imzalar adı geçen öğretim üyelerine aittir.

...../...../.....

Doç. Dr. Mehmet Kamil COŞKUN

Enstitü Müdürü

## NAVEROK

<b>NAVEROK</b> .....	I
<b>KURTE</b> .....	IV
<b>ÖZET</b> .....	VI
<b>ABSTRACT</b> .....	VIII
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	X
<b>KURTEBÊJE</b> .....	XI
<b>DESTPÊK</b> .....	1
1.1. Armanca Xebatê .....	2
1.2. Girîngiya Xebatê .....	2
1.3. Sînorên Xebatê .....	2
1.4. Komkirina Daneyan û Dahûriya Wan .....	3

## BEŞA YEKEMÎN

### EDEBÎYATA KLASÎK A KURDÎ Û MELA EHMEDÊ CİZÎRÎ

<b>1.1. EDEBÎYATA KLASÎK</b> .....	4
1.1.1. Nûnerên Edebîyata Klasîk a Kurdî.....	7
<b>1.2. JİYANA MELA EHMEDÊ CİZÎRÎ Û ŞEXSİYETA WÎ YA EDEBÎ</b> .....	10

## BEŞA DUYEMÎN

### TESBÎTKIRIN Û ŞÎROVEYA HUNERÊN EDEBÎ

<b>2.1. PEYD Û ŞÎROVE</b> .....	14
<b>2.2. HUNERÊN MECAZÎ</b> .....	15
2.2.1. Teşbîh .....	15
2.2.2. Îstiare .....	26
2.2.3. Kînaye .....	30
2.2.4. Mecazê Mursel .....	31
2.2.5. Mecaz .....	32

2.2.6. Ta' rîz .....	33
<b>2.3. HUNERÊN CIWANKARÎ (BEDÎ' /WATEYÎ) .....</b>	<b>34</b>
2.3.1. Tenasub .....	34
2.3.2. Telmîh .....	37
2.3.3. Îstifham.....	40
2.3.4 Husnê Talîl .....	43
2.3.5. Îrsalê Mesel .....	45
2.3.6. Mubalexe .....	46
2.3.7 Lef û Neşr.....	47
2.3.8. Tezad .....	49
2.3.9. Tewriye.....	51
2.3. 10. Îqtîbas .....	52
2.3.11. Tecahulê Arif.....	54
2.3.12. Îstixdam .....	55
2.3.13. Tedrîc.....	56
2.3.14. Tekrîr .....	56
2.3.15. Nîda .....	58
23.16. Tecrît .....	60
2.3.17. Telmî .....	60
2.3.18. Teşxîsh / Întaq .....	62
<b>2.4. HUNERÊN PEYVÎ .....</b>	<b>63</b>
2.4.1. . Cînas.....	63
2.4.2. Îade .....	64
2.4.3. İştîqaq .....	65
2.4.4. Alîterasyon .....	67
<b>ENCAM.....</b>	<b>71</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>73</b>



<b>PÊVEK</b> .....	76
<b>HUNERÊN BELEXETÊ DI XEZELÊN MELA EHMEDÊ CİZİRÎ</b> .....	76
<b>JÎNENÎGARÎ</b> .....	251
<b>ÖZGEÇMİŞ</b> .....	252



**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**HUNERÊN BELEXETÊ DI XEZELÊN MELA EHMEDÊ CIZÎRÎ**

**AKIN Erkan**

**Şêwirmend: Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER**

**2017, 252 rupel**

Di vê xebatê de li ser Mela Ehmedê Cizîrî û li ser hunerên belexetê, hunerên edebî, yê di xezelên wî de derbasbûne hatiye amêdekirin. Bi saya vê lêkolînê ve hatiye gihîştina encamên derbarê Mela Ehmedê Cizîrî û şewaza wî. Hunerên di xezelên wî de hatine bikaranîn li gorî çavkaniyên wê mijar hatine salixdayîn û bi mînakên di xezelên dîwanê de hatine ravekirin. Xebat li ser sê beşên bingeh pêk hatiye: destpêk, teher, nûve(peyd), encam û pêşniyarî.

Di beşa destpêkê de li ser Edebîyata Klasîk a Kurdî, nûnerên Edebîyata Klasîk a Kurdî, jiyana Mela Ehmedê Cizîrî û şexsiyeta wî ya Edebî, Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî û rêzikên edebîyata klasîk hatiye rawestan û di Edebîyata Kurdî de cihê Mela Ehmedê Cizîrî hatiye nîşandan. Piştî vê beşê derbarê hunerên edebî de bi desteka lîteratûr agahî hatiye dayîn. Pey re bi awayê lêkolîna lîteratûr li ser jiyana û şexsiyeta edebî ya Mela Ehmedê Cizîrî û di xezelên wî de hunerên edebî hatine bikaranîn. Di beşa teherê de li ser rîya agahî û mînakî, berhevkirina daneyan û li ser dahûrînan hatiye rawestan. Di vê xebatê de gelaleya lêkolînê hatiye bikaranîn. Bi vê gelaleyê ew tiştên ku berê hebûye an jî diyarde û bûyerên hebûna xwe dom kiribe hatiye xwestin ku derê holê. Di berhevkirina daneyan de jî tehera lêkolîniya dokûman hatiye bikaranîn da ku dane bi dahûriya naverokê ve werine analîzkirin û peyd werin bidestxistin.

Di dawiya dawî de pêvek hatiye dayîn. Di pêvekê de, hunerên di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de hatine dîtin yek bi yek lêkolîn bûne û bi mînakan hatine ravekirin. Gava hunerên edebî hatine tespîtkirin cihê ku hewce bûye bûyerên di hunerên de derbas bûne derbarê wan de agahî hatiye dayîn. Lewra di kevneşopa edebîyata klasîk de hunerên ku bikar hatine dibe ku li pişt wan bûyerekan an jî diyardeyek hebe. Bi vê rîyê hinek bûyerên di xezelên Cizîrî de derbas bûne dê werin ragihandin. Bi vê xebatê xezelên Mela yê di nav kevneşopa edebîyata klasîk de wê werin lêkolîn û di Edebîyata Kurdî de têkarî bike. Lewra Mela Ehmedê Cizîrî di Edebîyata Kurdî de mîrê şî'rê tê

zanîn. Ji bo Edebîyata Kurdî berhemên wî di cihê mifteyê de ne. Ji ber vê yekê ev xebat di Dîwana Mela de li ser xezelên dîwanê ye.

**Peyvên Sereke:** Edebîyata Kurdî, Xezel, Mela Ehmedê Cizîrî, Hunerên edebî



## ÖZET

### YÜKSEK LİSANS TEZİ

#### MELA EHMEDÊ CİZİRÎ'NİN GAZELLERİNDE KULLANILAN EDEBİ SANATLAR

Erkan AKIN

Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER

2017, 252 sayfa

Bu çalışmada Kürt edebiyatının önemli şahsiyetlerinden olan Mela Ehmedê Cizîrî'nin gazellerinde kullandığı edebi sanatlar üzerinde durulmaya çalışılmıştır. Çalışma giriş, yöntem ve bulgular, sonuç ve öneriler olmak üzere üç ana bölümden oluşmaktadır. Giriş bölümünde, klasik Kürt edebiyatı, klasik Kürt edebiyatının temsilcileri, Mela Ehmedê Cizîrî'nin hayatı ve edebî kişiliği Mela Ehmedê Cizîrî'nin Divanı ve Divan Edebiyatındaki yeri Mela Ehmedê Cizîrî'nin kişiliğinde klasik Kürt edebiyatı ile klasik Türk edebiyatının karşılaştırılması ve bu çalışmanın klasik Türk edebiyatına katkısı belirtilmiştir. Sonrasında edebi sanatlarla ilgili edebiyat destekli bilgiler Mela Ehmedê Cizîrî'nin gazellerinde yer alan örneklerle verilmeye çalışılmıştır. Sonra alan yazın taraması yapılarak Mela Ehmedê Cizîrî ve edebi sanatlar üzerinde yapılan çalışmalara değinilmiştir. Yöntem kısmında çalışmada tutulan yol, evren ve örneklem, verilerin toplanması ve analizi üzerinde durulmuştur. Çalışmada tarama modeli kullanılmıştır. Bu modelle geçmişte var olan ya da var olmaya devam eden olgu ve olaylar ortaya çıkarılmaya çalışılır. Verilerin toplanmasında ise doküman incelemesi yöntemi kullanılmıştır. Veriler içerik analizi yoluyla analiz edilerek bulgular elde edilmeye çalışılmıştır.

Tezin sonunda bir ek verilmiştir. Ek'te bulgular sunulmuştur. Bulgular kısmında Mela Ehmedê Cizîrî'nin gazellerinde bulunan edebi sanatlar tek tek incelenmiş ve örneklerle açıklanmıştır. Edebi sanatlar tespit edilirken gerekli yerlerde bu sanatların işaret ettiği olaylarla ilgili bilgiler sunulmuştur. Çünkü Divan edebiyatı geleneğinde kullanılan sanatların arka planında o sanatın içerdiği bir olay ya da olgu var olabilir. Bu yolla Mela Ehmedê Cizîrî'nin gazellerinde işaret edilen bazı olaylara da ulaşılabilir. Bu

çalışmayla, Divan Edebiyatı geleneğinin içinde yer alan Mela Ehmedê Ciziri'nin gazelleri incelenerek Kürt edebiyatı ve Türk Edebiyatı alanına bir nebze de olsa katkıda bulunmaya çalışılmıştır. Çünkü Mela Ehmedê Cizîrî ve eseleri Divan Edebiyatı, bilhassa Kürt edebiyatı için bir anahtar konumunda olduğu düşünülmektedir. Mela Ehmedê Cizîrî Kürt edebiyatı araştırmacıları bazen de Türk edebiyatı araştırmacıları için alanda bilinmesi gereken bir edebi kişilik niteliğindedir. Çünkü Osmanlı İmparatorluğu içinde geniş bir tebaayı barındıran ve bu tebaanın birbiriyle etkileşim içinde olduğu milletler bütünüydü. Bütünü görebilmek için parçaların varlığından haberdar olmakla mümkündür. Kaldı ki Divan edebiyat kalıbıyla, aruz vezniyle ve mazmunlarıyla farklı dillerde yazılmış olsa dahi bir biliktelik göstermektedir. Bu çalışma yukarıda saydığım nedenlerden dolayı sadece Kürt edebiyatına değil aynı zamanda Türk edebiyatına da katkı sağlayacaktır. Mela Ehmedê Cizîrî ve edebi kişiliğini çözmeye çalışmak Kürt edebiyatı sahasında önemli sayılacak bir bilgi ve birikime adım atmakla eşdeğerdir.

Son olarak çalışmada elde edilen sonuçlar üzerinde durularak kullanılan sanatlardan hareketle Mela Ehmedê Cizîrî'nin edebi şahsiyeti ve sanatların ilişkisine değinilmiştir. Öneriler kısmında ise konu ile ilgili araştırmacılara önerilerde bulunulmuştur.

**Anahtar Kelimeler:** Kürt Edebiyatı, Mela Ehmedê Cizîrî, Mela Ehmedê Cizîrî'nin Gazelleri, Edebi Sanatlar.

**ABSTRACT**  
**MASTER'S THESIS**  
**SITUATED ON THE LYRIC LITERARY ARTS MELA EHMEDÊ CİZİRÎ**

**Erkan AKIN**

**Thesis Advisor: Yrd. Doç. Dr. Turan GÜLER**

**2017, Page: 252**

In this study of important Kurdish literature is the literary use of the Ode to Mela Ehmedê Cizîrî they tried to wind down on art. Study introduction, method, results, conclusion and recommendations consists of four main sections. In the introduction, Classical Kurdish literature, Classic representatives of Kurdish Literature, Mela Ehmedê Cizîrî's life and literary personality, Mela Ehmedê Cizîrî Board and Divan Literature in, Mela Ehmedê Cizîrî personality comparison of classical Turkish Literature with Classical Kurdish Literature and the contribution of classical Kurdish literature of this study. After that, the information about the literary arts literature supported with examples of Ode in Cizîrî attempts. Method study on the part of the road is maintained, the universe and sample, data collection and analysis are emphasized. Study of screening model. I have in the past, this particular model or that continue to exist in the case and an indication that exposes events. If a document review data collection method used. The data is analysed through content analysis findings tried to be. Results portion of the Mela Ehmedê Cizîrî'lyrics he examined one by one the literary arts in and explained with examples. Literary arts is being identified wherever necessary, this art point of information about events. Because Divan literature, in the tradition of art used in the back ground of it have an event or phenomenon that is contained in art. In this way, Mela Ehmedê Cizîrî lyric pointed to some event in. This work of Divan Literature tradition of Mela Ehmedê Cizîrî lyrics can be determined by examining the Kurdish literature and Turkish literature even if we tried to contribute a little bit. Because Mela Ehmedê Cizîrî and his arts are one key to the Divan Literature, in particular is thought to be in the position of Kurdish literature. Mela Ehmedê Cizîrî; Kurdish literature researchers sometimes need to know in the area for the Turkish literature researchers is a literary personality. Because the Empire of Osmanlı, in a wide range of nation and this is the interrelated subjects interact with an old plane tree branches as a whole. To see

the whole being much aware of parts is possible. Besides, Divan literature mold, measure of Prosody and notion even if written in different languages with this work not only for the reasons enumerated above Kurdish Literature at the same time Turkish literature will contribute, too. Mela Ehmedê Cizîrî and literary personality, try to resolve a significant information in the field of Kurdish literature and knowledge without contemplation can be equivalent steps. Finally, the results obtained in the study of art of motion used with emphasis on Mela Ehmedê Cizîrî of literary personality and art of the relationship. Suggestions made suggestions about the subject is.

**Key Words:** Kurdish Literature, Mela Ehmedê Cizîrî, Mela Ehmedê Cizîrî Lyrics, Literary Arts.



## PÊŞGOTIN

Mijara teza me ev e ku hunerên di xezelên *Dîwana* Mela Ehmedê Cizîrî de bikar hatine werin lêkolîn. Armanca xebata me ew e ku hunerên edebî yên di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de werin dîtin û bi vê xebatê em derbarê şêwaza wî de bigihîjin encaman. Heke ku mirov bixwaze wî bê kêmasî nas bike hewce ye mirov jiyana wî, di serdema ku tê de jiyaye Edebiyata Kurdî û *dîwana* wî fam bike. Ev famkirin jî bi zanîna hunerên edebî ve girêdayî ye.

Me jî jo bo ku Mela Ehmedê Cizîrî (1564-1631) baştir were famkirin hunerên edebî yên di xezelên wî de hatine bikaranîn bi saya vê xebatê derxistin holê. Armanca me ew e ku Mela Ehmedê Cizîrî, *Dîwana* Mela û bi taybetî girîngiya ku Mela daye huneran werin zanîn.

Ez sipasdar im ji şêwirmendê teza xwe re, mamosteyê dilnizim Turan GÜLER re ku ewî bi fidakariya xwe herdem alîkarî bi min re kir. Bi taybetî sipastariya pêşkeş dikim ji bo birayê xwe Erhan AKIN ku herdem ji min re alîkarî bû.

Sipasdar im ji bo sebir û desteka hevalrêya xwe; ji bo sebra herdu zarokên xwe, Hebung Ebrar û Hüseyin Ali, ku kefên destê xwe yên piçûk ber bi asîmanan ve dikirin û ji bo min ji Xwedê serkeftin dixwestin.

**Erkan AKIN**

**MUŞ-2017**



## **KURTEBÊJE**

amd.:	amadekar
bnr. :	bi nihêrin
D. :	Dîwan
h. :	huner
h.e. :	hunerên edebî
hwd.:	herweha didome
K. :	Klasîk
mlk. :	malik
r. :	rûpel
W. :	wêje
Edb. :	Edebîyat
E.D. :	Edebîyata Dîwanî
E.K. :	Edebîyata Klasîk
x. :	xezel

## DESTPÊK

Edebiyat bi qasî jîyanê rast e, dîsa edebiyat di jîyanê de weke tiştêkî ku mirov bidest nexer an weke tiştêkî xeyalî mecazî ye. Edebiyat bi xemilandina hunerên edebî dewlemend dibe. Ji bo qedir û bihayê eserên edebî, ji bo wêjenasan gotina bihuner bûye peyvek, ev gotin jî bi hunerên edebî bûye rêzik. Ji bo wê dema ku edebiyat tê gotin edebîyatên hunerî tîndîr hişê mirovî. Ev rewş jî bi vekolîna lîteratûr dertê holê.

Hunermendî û mezinahiya di vê edebîyatê de kesê dinivîse hewce ye peyv û gotinên wisa bikar bîne ku kesekî din pêşiya wî ew nekiribe. Edebiyata klasîk edebîyatek pir xemilandî ye û bîngêhên wê jî li ser xemilandin û kokkirinê ye. Lewra hewce ye ku helbestvanên dîwanê hemû zanîna xwe, hunermendî û fêrîsiya xwe tîxin nava helbestên xwe. Ji ber hindê ye divê helbest hem pir bi wate û hem jî pir xemilandî be, kok be ku kesê dixwîne wekî helbestvanî gêj û mest û serxweş bibe.

Di Edebîyata klasîk ya Kurdî de Mela Ehmedê Cizîrî ku helbestvanên edebîyata klasîk, “mîrê şî’re”, xwediyê dîwanê tî zanîn li ser lêkolîna hunerên xezelên wî hatiye xebitîn. Bi tenê hunerên di xezelên Mela de derbas bûne hatine dayîn. Hunerên ku hatine raberkirin li gorî pîranî û hindikbûna huneran hatine rêzkirin.

Bi vê xebatê li ser hunerên edebî, edebîyata klasîk, Edebîyata Klasîk a Kurdî, helbestvanên dîwanî û nûnerên edebîyata klasîk lêkolîn hatiye kirin. Li ser xezel û hunerên di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de hatiye rawestan. Ev xebat ji bo xezelên Mela Ehmedê Cizîrî û hunerên xezelên Mela Ehmedê Cizîrî, ji bo Edebîyata Kurdî wê bikêr were.

Dem a mirov li sedsala Mela Ehmedê Cizîrî (1564) hatiye dinê dinêre ku helbestvanên edebîyata dîwanî girîngiyê mezin dane wate û lefza huneran. Di sedsala 16 û 17an de helbestvanên dîwanî, bi giranî li ser wate û lefza huneran rawestiyane. Hunerên ku bikar anîne ji bo bixemil û bimubalaxe bin gelekî xîret kiriye. Ev rewş weke hunera teşbîh, îstîfâre, kînyayê, mecaz, tewriye û kesandin zêde kiriye. Li pîrê cihan beytek bê huner heta risteyek bê huner nayê xuyan.

Tê xuyan ku hinek helbestvanan di risteyekê de sê çar huner bikar anîne. Herwiha hewce ye ku mirov vê edebîyatê nas bike û jê zewqê hilde. Ev jî bi zanîna gotinên bihuner ve mumkin e.

Heke li Edebîyata Klasîk a Kurdî were nêrîn mirov dibîne ku gelek helbestvanan tê de navê xwe li ser pelê dîroka kurdan û edebîyata diwanî nivîsine û wan helbestvanan gelek berhemên birûmet li pey xwe hiştine. Lê belê ew berhem di refikên dîrokê de, di refên bitoz de mane. Li benda rojê ronahî, li benda lêkolînerê fidakar sekinîne. Ji bo derketina wan a ku derkevin rûye tavê, xebatên bêhempa hewce ne.

Di vê xebatê de li ser Mela Ehmedê Cizîrî, bi taybetî li ser hunerên di xezelên wî de derbas bûne hatiye rawestan. Ev xebat ji bo xezelên Mela Ehmedê Cizîrî û dîwana wî û tevî şexsiyeta wî ya edebî baştir were famkirin e. Ji bo lêkolîner û xwendevanên edebîyata klasîk ev xebat dê bikêr were.

### **1.1.Armanca Xebatê**

Armanca ve xebatê ewe ku li ser hunerên di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî ku di Edebîyata Kurdî de kesekî girîng e were rawestan. Bi vê armancê ew pirsên li jêrê hatine diyarkirin ji wan re persiv hatine gerandin.

1. Mela Ehmedê Cizîrî di xezelên xwe de kîjan hunerên edebî bikar anîne?
2. Hunerên di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de bi çi awayî û bi çi qas sixletî hatine bikaranîn?
3. Di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de hunerên edebî yên bûyerê nîşan didin an jî diyarde ne çi ne?

### **1.2. Girîngiya Xebatê**

Bi vê xebatê xezelên Mela Ehmedê Cizîrî ku di kevneşopa edebîyata klasîk de cihê girîng girtiye werin lêkolîn û di edebîyata kurdî de hindik be jî têkarî were kirin. Lewra Mela Ehmedê Cizîrî û berhema wî ji bo Wejêya Kurdî di cihê mifteyekê de ye. Mela Ehmedê Cizîrî ji bo lêkolîna Edebîyata Kurdî şexsiyetekî girîng e û hewce ye ku were naskirin. Mela Ehmedê Cizîrî û şexsiyeta wî ya edebî, Mirov dikare bêje weke gavavêtina nav behra ilmê û agahiyê ye. Dema tê nêrîn li pêşiya vê xebatê li ser vê mijarê nehatiye xebitîn, ji ber vê yekê ev xebat gelekî girîng e.

### **1.3. Sînorên Xebatê**

Ev xebat li ser hunerên edebî di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî û sixletiya bikaranîna hunerên wî hatiye sînorkirin. Di vê xebatê de bi tenê hunerên di xezelên

Mela Ehmedê Cizîrî de hatine bikar anîn hatine nîşan. Li ser 85 xezelan lêkolîn hatiye kirin û di wan xezelan de hunerên hatine bikaranîn hatine dayîn.

#### **1.4. Komkirina Daneyan û Dahûriya Wan**

Ev xebat cara ewil li ser edebîyata klasîk hatiye rawestan. Li ser peyvên edebî hatiye sekinandin. Salixa van peyvên hatiye dayîn. Di lîteratûra edebî de wateya wan hatiye ravekirin. Derbarê wan de gotinên hatine kirin bi çavkaniyan hatine tesbîtkirin. Di vê derê de: wêje çi ye? Klasîk çi ye? Dîwan/dîwanî çi ye? Ji pirsê han re bersiv hatiye dayîn. Piştî wê, li ser edebîyata dîwanî/klasîk hatiye rawestan. Edebîyata klasîk çawa derketiye holê, hêmanên wê çi ne, ji kîjan çavkaniyan tê xwedîkirin, nûnerên wê kî ne? Ev pirs hatin bersivkirin. Peyre, di sedsalên 16-17an de edebîyata dîwanî(klasîk) di kîjan rewşê de bûye? Di sedsala 16 û 17an de Edebîyata Klasîk a Kurdî di çi rewşê de bûye, nûnerên hunermend û helbestvanên kurd ên di vê edebîyatê de kî ne? Li ser wan hatiye sekinandin. Peyre li ser rê û rêzikên dîwan û Dîwana Cizîrî xebat hatiye kirin.

Di dawiyê de li ser xezelên Mela Ehmedê Cizîrî, hunerên di xezelên wî de hatine bikaranîn hatiye rawestan. Di vê beşê de pêşî huner hatine ravekirin. Girîngiya huneran a di edebîyata klasîk de hatiye nîşandan. Peyre jî xezel yek bi yek hatine lêkolîn, di hemû xezelan de çiqas huner hatine bikaranîn tesbît bûne. Di her xezelê de çend lib û kîjan huner bikar hatine, hatine raberkirin. Hunerên di xezelan de bikar hatine wateyên wan û taybetiyên wan ên di edebîyatê de rave bûne. Her huner bi mînakên xezelên Melayî hatine dayîn.

Ji vê beşê şûn de jî xezelên Mela Ehmedê Cizîrî beyît beyît (malik malik) hatine likolîn, di her malikê de hunerên derbas bûne li ser wan xebat çêbûye û hatine ravekirin. Di vê beşê de hunerên hatine bikaranîn hatine nîşandan. Pêşî malik, pey malikan re navên huneran û li pêş wan jî peyvên hunerî hatine raberkirin.

Di dawiyê de jî xezel û hunerên di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de derbas bûne hatine nirxandin, bi çend hevokan jî encama xebatê hatiye raberkirin.

## BEŞA YEKEMÎN

### EDEBÎYATA KLASÎK A KURDÎ Û MELA EHMEDE CIZÎRÎ

#### 1.1. EDEBÎYATA KLASÎK

Tiştêkî ku dema wî buhurî be, dema wî kevin be jê re klasîk tê gotin. Tiştêk di nav gel de navdar be, bingehêk zexim û qedîmî bigire û piştî demên borî kevneşopiyeke zexim bigire jê re klasîk tê gotin.

Di nav gel de demên pişt re jî rê, rêzik û kevneşopiya xwe didomînin. Ji bo vê di edebîyatê de nivîs û berhemên di her demê de birûmet re “klasîk” tê gotin. Ji ber vê yekê berhemên klasîk di demên pişt re de jibîr nabin, ew berhem dibin nemir û govanî dikin ji deman re (Pala, 1992: 57).

Di nav gel de wek avek qedîmî ji dema borî were û bikişê pêşerojê ye. Ew kesê ti bibe ewê xwe kûz bike û ji vê ava qedîmî têra xwe vexwe. Berhemên klasîk wek çemekî ji dîrokê dikişê û diçe pêşerojê. Mîna pirekê di navbera dîrok û pêşerojê de hertim li piya ye. Di nav gel de birûmet e û tê xwendin. Zinar, Zana Farqînî û Qanetê Kurdo di berhemên xwe de bi awayekî zelal terîfa peyva klasîk dikin. Zeynel Abidîn Zinar peyva klasîk wiha terîf dike:

Peyva klasîk, wek bêje bi wateya xwe ya ferhengî, ji wê nivîsê re tê gotin ku di çarçoveyêkê kifş de hatiye amadekirin. Lê di nava xelkê de bi gelek hawayên cuda tê famkirin. Îcar ji ber ku piraniya berhemên kurdî bi kêş û nîkl û qafîye hatine nivîsandin, ji ber hindê ye ku ji wan re klasîk hatiye gotin. Ev gotina klasîk, li piraniya welatên dinyayê jî her klasîk/kilasik tê gotin (Zinar, 2009: 168).

Zana Farqînî di ferhenga xwe de wiha behsa klasîkê dike:

Tiştê ku bi ziman û hunera serdema kevn a Roma û Yewnan re têkildar e, tiştê ku bi ziman, huner û nivîskarên Fransîz ên serdema XVII. re têkildar e, behreman jî hunermendê ku demeke dûvdirêj di ser re derbas dibe, tiştêk jî qîmeta xwe wînda nake. Herwiha kevneşopî, kevnare, vetûrî yanê tiştê ku tê de nûnî çênebûye, kevnare (Farqînî, 2002: 731).

Dema li edebîyata klasîk tê nêrîn wiha tê famkirin: Edebîyata klasîk edebîyatek xweser e û pêşiya mislimanetiye jî di nav ereb, faris, tirk, kurd û gelên din de hebûye. Dema ku van gelan mislimantî qebûl kir, baweriya xwe bi Rebbê Alemê û resûlê wî anî û nemaze, piştî derketina tesewifê û selteneta xelîfeyan rewac da û pir bi pêş ket. Helbestvan û nivîskarên vê edebîyatê yê mezînan ku tu demê nayên jibîrkirin rabûne û berhemên xwe dane nîşandan. Helbestvanên wekî Firdewsî, Hafîz, Ebulfarîz, Gencewî, Ebû Newas û hwd. Ev helbestvan bi giştî jî edebîyata klasîk tî hîlbijartin. Di erebî de

Ebûle'la el-Muerrî, Ebu'l Fariz; di farisî de Hafizê Şîrazî, Se'dî Şîrazî, Gencewî, Celalleddîn Rûmî û di tirkiya osmanî de jî Celalleddîn Rûmî, Ferîdûn Ettar, Fuzûlî, Nabî, Şeyxî, Şêx Xalib û hwd, berhem û mînakên pir sereke di vê edebîyata klasîk de dane. Di kurdî de jî Melayê Cizîrî, Elî Herîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran nûnerên Edebîyata Kurdî ya Dîwanî ne.

Mirov li zayîna edebîyata klasîk dinêre ku ev wêje çavkaniyên xwe ji van mijaran hildane: Qur'ana Mezin û hedîs û kirinên Pêxember, zanînen olî, tefsîr, kelam, fiqih, Dîroka Îslamê û milletên misliman, bûyerên bi nav û deng ên dîrokî; tesewif, gotin û kirinên mutesewifan, peyvên wek mehbûb, yar, me'şûq aşiq, eşq, şerab, mey, xemr, serxweşbûn, mestbûn û hwd, bi wateya tesewwîfî bikar tên. Ji bilî van çavkaniyên tewahî di edebîyata dîwanê de hinek qalibên edebîyata dîwanê hene ku hemû helbestvanan di nav wan qaliban de helbestên xwe nivîsîne. Ji wan qaliban jî qalibê ji hemûyan bêtir bikar tê sêgaha eşq-aşiq û me'şûq. Gelek caran hemberî aşiq, reqîb jî dikeve holê. Di vê helbestê de bi çî cureyê dibe bila bibe esas evîn e, û her tişt li dor evînê derbas dibe. Fuzûlî di aliyê evînê de fikir û ramanên xwe bi awayekî zelal tîne ziman. Li gor wî “Çî hebe di alemê de evîn e, zanistî wek qirş û qal e” (Îpekten, 1997: 194).

Çî evîna îlahî be û çî evîna beşerî yan giyanî be, evîn herdem platonîk e û hema hema esasê hemû beytan ew e. Helbestvanê dîwanê hemû deman evîndar e, aşiq e, me'şûqa wî evîna wî jî hemû gavan bêwefa û cefakar e. Di ser bêwefa û cefakariya yarê de jî reqîbên evîndar jî hene ku evîndar ji dilê dîlberê ditirse ku xwe deyne ciyekî din. Me'şûq yek e, evîndar û reqîb gelek in û evîn jî bêderman e. Birîna wî kûr e. Ev evîna evîndar, kul û kovanên evînê jî dibin riste, beyt, xezel, qesîde û helbest dikevîne nava dîwanê.

Di wan her çenda ku bi wateya xwe ya heqîqî me'neya peyvê civat, meclis û şûra be jî di edebîyatê de bêtir di Edebîyata Îslamî de bi vê me'neyê ye: Dîwan, berhevoka helbestên helbestvanekî ye ku li gor çarçoveyê taybetî hatibe nivîsîn û di pirtûkekê yan defterekê de hatibe berhevkirin e. Ji vê pirtûkê re dibêjin “dîwan”. Ji ber hindê ye helbestên helbestvanekî bi weznên erûz û li gor taybetiyên edebî yên rojhilatî hatine nivîsîn. Çî ji aliyê helbestvanî bi xwe, çî jî piştî mirina wî di pirtûkekê de tên berhevkirin û li gor taybetiyekê tên rêzkirin. Eger xwediyê dîwanê navekî xas li dîwana xwe kiribe ji xwe bi wî navî tê naskirin. (Turan, 2010: 12)

Lê eger helbestvan bi xwe nav li dîwana xwe nekiribe ew dîwan bi navê wî helbestavanî tê zanîn; wek Dîwana Hafîz Şîrazî, Dîwana Şeyh Galîb, Dîwana Melayê Cizîrî û hwd. Eger dîwan bi taybetî û bi tertîba xwe ya xas hatibe nivîsîn û berhevkerin jê re dibêjin dîwana rêzgîn. Çawa ku helbestvanek bi xwe bixwaze dîwana xwe amade bike, herwisa piştî mirina wî yekî din jî dikare helbestên wî berhev bike û dîwana wî çêbike.

Dîwaneke rêzgîn ji van beşên dîwanê û cure helbestan (menzûmeyan) pêk tê: Beşa Yekemîn: Qesîde ne. Qesîde li ser yekîtiya Yezdanî munacat, na't û helbestên li ser mezinan, pêxemberan, padîşehan hatine nivîsîn ku wan bipesinînin. Ji 33 heta 99 beytan in. Lê kêmtirî 33 beytan jî hene. Beşa Duyemîn: Dîrok, helbestên dîrok tê de heyî, wek helbestên behsa dema jîdayikbûna helbestvan, mirin an jî behsa meseleyên girîng ên demê dikin û tê de li gor jimara ebcedê dîrok hene. Beşa Sêyemîn: Musemmat (Bend helbest) in. Musemmat ew helbest in ku ji bendan hatibin çêkerin, wek murebba (çarrêzî-çarmalkî), muxemmes (pênçrêzî-pênçmalkî), museddés (şêşrêzî-şêşmalkî), musebba (heftêrêzî-heftmalkî), musemmen (heştrêzî-heştalkî), mutessa (nehrêz), muaşşer (dehrêzî), Terbî' (çarrêza li ser beytên xezela yekî din hatibe çêkerin), texmîs (pênç rêza li ser beytên xezela yekî din hatibe çêkerin). *Beşa Çaremîn: Xezel in. Xezel cûre helbesteke ku li ser eşq û evînê, bûyerên xwezayî, tebîet, wêsfên Yezdanî û hwd. tê gotin û nivîsîn. Kêmtirîna wê 5, pirtirîna wê 15 beyt (durez) e. Pêwîst e ku di dîwanê de li gor rêzbûna tîpên erebî qafîye hebe ku peyva dawîya beytê ye. Herwisa pêwîst e ku qet nebe bi her tîpeke erebî helbestek hebe. Beşa Pêncemîn: Qit'e ne. Ev qit'e jî bi "Metle", "muemma" (tiştonek), "lugaz" "yekane" (ferde) û "azade" têne navkerin, û her yek bi serê xwe kurtehelbestek e.*

Hinek caran dibe ku helbestvanê dîwanê di van beşên li jorî navborî tevan de helbest nevehewandibin, wê demê jî ji dîwana wisa kêr re dibêjine "dîwançe" Dema mirov li edebîyata Kurdî dinêre gelek berhemên ku di nav gel de weke yaqût û mercan weke zêr û durr hertim bi qîmet in û roj bi roj bihayê wan zêde dibe hene. Wekî Dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Mewlîda Mela Huseynê Bateyî, Dîwana Feqiyê Teyran hwd. Ev berhem klasîkên kurdan in.

Helbestvanên edebîyata klasîk ên kurd, bi piranî di bin bandora Folklor a Kurdî, çanda îslamê û tesewifê de mane. Tehsîn Îbrahîm Doskî, sê çavkaniyên Edebîyata Kurdî dijimêre:

Sê serkaniyên, yanî çavkaniyên Zimanê Kurdî hene: "Çavkaniya yekemîn, axaftina xelkê kurd ê ku nehatiye bişavtin. Çavkaniya duyemîn a Zimanê Kurdî Folklor a Kurdî ye, ji xwe folklor jî dinava xelkê nehatî bişavtin de ya zindî ye. Çavkaniya sêyemîn jî Edebîyata Klasîka Kurdî ye, lewra ev klasîka han hatiye nivîsîn û parastin. Rast e di nava Edebîyata Klasîk a Kurdî de, peyv û termên biyanî wekî peyvên erebî, farisî û tirkî hene. Edebîyata çekirî ne mumkîn e ku xwerû bi zimanekî be (Doskî, 2013: 9-10)

Lêkolîneran li ser Edebîyata Klasîk a Kurdî gelek xebat kirine. Li ser dîroka Edebîyata Klasîk a Kurdî, di navbera lêkolîneran de bergehên cuda hene. Di nav van lêkolîneran de yekbûn tune ye. Dema ku mirov xebatên li ser dîroka Edebîyata Kurdî dinêre, kêmasiyên nivîskar û lêkolînerên kurd xuya dikin. Lewra nivîskarên ku li ser Edebîyata Kurdî xebat û lêkolîn kirine, bi piranî nivîskarên biyanî ne. Wekî Alexander Jaba, Rudenko, Mînskî hwd. Xebatên lêkolînerên kurd û biyanî yê li ser Edebîyata Kurdî, piraniya helbestvanên Edebîyata Klasîk a Kurdî û dewlemendiya Edebîyata Kurdî nîşan dide. Qanatê Kurdo kesê navdar ê di nav gelê kurd de bi me dide nasîn:

Di tarîxa edebiyata Kurdî de tê li ber çavan, ku li nav sing û berê çiyayên Kurdistanê de gelek mêrên çê, gelek camêr, zanyar, hozan û şêrbêj û helbestbêj derketine, ku di tarîxê de ji nav neteweyê kurd mêrên qehreman hebûne, tiştên wusa rind û heja afirandine, ku merivên niha jê ecêb mayî dibe (Kurdo, 1992: 8).

### **1.1.1. Nûnerên Edebîyata Klasîk a Kurdî**

Mirov ku li ser dîroka Edebîyata Kurdî ya Klasîk lêkolîn dike, dinêre ku ji bilî berhemên edebîyata klasîk ên derneketine rûyê rojê, yê di nav quncikên tarî, li ser refikên bitoz; ên ku li benda lêkolînerêkî fedakar û xebatkar mane gelek nûnerên Edebîyata Kurdî ya klasîk dibîne. Berhemên bisiûd hatine heta roja îro, lê yê bîsiûd di dîrokê de ji bîr bûne, berhemên wan qet nehatine çapkirin û negihîştine roja îro. Hinek jî wekî Melayê Cizîrî navdar bûne û berhemên xwe gelek caran çap kirine. Li ser nûnerên Edebîyata Klasîk a Kurdî lêkolîn zehf in. Qanatê Kurdo, di berhema xwe ya "*Tarîxa Edebîyata Kurdî*" de li ser helbestvanên Edebîyata Klasîk a Kurdî helbesta Ehmedê Xanî nimûneyekê digire û wiha dibêje:

Berê pêşin sertacê lîteratûra Kurdî, binyat û binaxedarê bîr û baweriya kurdewerî, kurdperwerî û wetenperweriya serxwebûnakurd û Kurdistanê, şairê kurd ê mezin û bi nav û deng Ehmedê Xanî di "Mem û Zîn" a xwe de nivîsiye, ku



berî wî şair û nivîskarên kurdan hebûne, lê navê wan hatiye ji bîr kirine, çimkî kesekî tune bûye navê wan ji bîr bûne û binivîse, ku kurd jî xwediyê şair û nivîskaran bûne, ku şairên wan jî hebûne. Derheqa vê yekêda Ehmedê Xanî ev rêzên jêrîn di "Mem û Zîn" a xwe de nivîsiye :

Ger dê hebûwa me jî xudanek

Alî keremek, letîf danek

U'lm û huner û kemal û ezan

Şêr û xezal û kitab û dîwan

A'lî bikira li banê gerdun,

Binave ruhê Melê Cizîrî,

Pê hê bikira Elî Herîrî,

Keyfek wê bida Feqê Teyran,

Heta ba ebed bima heyran

Li paşê aşkera bû, ku bi rastî ev hersê şair (Mele Cizîrî, Elî Herîrî û Feqê Teyran) li berî Ehmedê Xanî hebûne, şêr û dîwan bi kurmancî nivîsîne. Lê sed car heyf, ku di wê demê de kes tune bûye, ku serhatiya wan û nivîsarên wan di nav gel de belav bikin. Le divêt bêjin, ku li nav goveka xwendekar û xwendevanê silsilata derebegên kurdan de navê gelek şair û nivîskaran aşkera bû, ku di nav wan de bi nivîsar yan jî bi zargotin gilî dikirin, ku şêrbêj û helbestbêjên kurd hebûne (Kurdo, 1992: 13).

M. Emin Demir, di gotara xwe ya bi navê, "Li Ser Klasîkên Kurdî" de ramanên Alexander Jaba, Enwer Mayî û Celadet Elî Bedirxan û nûnerên edebîyata klasîk a Kurdî di jimêre.

Nivîskarê Edebîyata Klasîk a Kurdî yê yekemîn, Elî Herîrî ye. Hin ji Tahirê Hemedanî re dibêjin ku ew mitesewifê kurdan ê pêşî ye. Lêkolînerên kurd jî dibêjin ku nivîskarê edebîyata klasîk a Kurdî Îbn Xelîkan e. Di zemanê me de qet berhemên Îbn Xelîkan tune ne. Feqet berhemên Elî Herîrî gihîştine roja me. Alexander Jaba di pirtûka xwe de heşt nivîskarê klasîkên kurd dihejmêre. Elî Herîrî (1010-1078), Melayê Cizîrî (1407 – 1481), Feqiyê Teyran (1560-1650), Melayê Batê (1417-1491), Ehmedê Xanî (1650-1706), Îsmailê Bazîdî (1654-1709), Şerefhanê Hekarî (1682-1748), Murad Xanê Bazîdî (1736-1778). Celadet Elî Bedirxan jî di nav nivîskarên klasîk ên kurd de, Axayê Bêdarî, Siyahpûş, Axayok, Mewlana Xalid, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hedî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Şêx Nureddînê Birîfkî, Şêx Evdîrehmanê Axtepî, Melayê Erwasî dihejmêre. Van helbestvanan bi kurmancî nivîsandine (Demir, 212).

Zeynel Abîdîn Zinar, 202 helbestvanan di Edebîyata Klasîk a Kurdî de dide nîşandan. Zeynel Abîdîn Zinar, di berhema xwe "Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê" de ji wan hinek helbestvan anîne ser ziman:

Axa Şewqiyê Bêdarî, Bekir Begê Erzî, Celadet Elî Bedirxan, Derdî, Dr. Mes`ûd Kitanî Bihnarî, Ebdulqadir Beg Guş, Feqî Sirayî, Ebdulqadir Kuvlî, Ebdulsemed Babek ji S. Beh, Ebdurehîm Rehmiyê Hekarî, Ebdurehîm Şewqî,

Ehmed Emîn Nalbend, Ehmed Ramizê Licî, Ehmedê Katib, Ehmedê Mirzayê Wanî, Elî Herîrî, Elî Seydo Goranî Kurdî, “Elî Teremaxî, Eliyê Amêdî (Elî el Emadî), Enwerê Mayî, Feqe Ehmed Rusî El Muxliss, Feqî Reşîdê Hekarî, Feqî Reşîdê Şalekî, Feqiyê Teyran, Fethulahê Sêrtî, Hacî Fetah Hezroyî, Hamidê Mayî, Haris Bedlîsî Sewadî, Heme Kûr Hemûdî, Hesênê Bamernî, Hesênê Kewaşî, Hicrî, Huseynî, Husniyê Bamernî, Huznî, Îsmâil Bayezîdî, Kamîran Bedirxan, Laxerê Cizîrî, Macid, Melayê Bateyî, Melayê Cizîrî Ehmed, Mele Ebdulkerîmê Banî, Mele Ehmed Qoxî, Mele Ehmed Xasî, Mele Evdilhadiyê Comanî, Mele Evdilmecîd, Mele Hesênê Kurdî, Mele Hesênê Qerenazî, Mele Huseyn Keleş, Mele M. Emîn Heyderî, Mele Mehmûd Bazîdî, Mele Mehmûd Dêrşewî, Mele Mehmûdê Hoserî, Mele Mihemed Liceyî, Mele “Mûsa Mizî, Mele Naîf, Mele Necmedîn Tengezarî, Mele Nûriyê Hesarî, Mele Nûrulah Kodişki, Mele Şêx mûsê Hesarî, Mele Ûnisê Herqetênî, Mele Xelîlê Sêrtî, Mele Yasîn Yusrî, Memdûh Birîfkanî/Xelatî, Mensûrê Girgaşî, Mêzer Rast, Mihemed Axayê Bisrî, Mihemed Elî Ewnî, Mihemed Emînê Hilalî Goyan, Mihemed Hezînê Xalidî, Mihemed Sedîqê Şernexî, Mihemed Seîdê Birîfkî, Mihemed Teyar Paşa Xerîbî, Mihemedê Mexribî, Mihemedê Zêbarî, Mihreban Berwarî, Mihrî, Mîna, Mîr Emadedînê Hekarî, Hakimê Hekarî, Miskîn, Mistefayê Bîtarî (Zinar, 2009: 170).

Ev nûnerên li jor hatine nivîsîn nûnerên Edebîyata Klasîk a Kurdî ku lêkolîner dijimêrin, berhemên hemûyan negihîştine dema me. Lê hin helbestvan bi tenê navê xwe hene.

Hinek helbestvan jî berhemên wan tune ne, lê hinek helbestên wan di nav gel de belav bûne. Wekî helbesta Elî Herîrî ya bi navê “Têt”. Berhemên Elî Herîrî negihîştine dema me û çap nebûne, lê helbesta wî ya “Têt”, di nav gel de navdar bûye. Derbarê nûnerên kurd de Zinar wiha dibêje:

Di dîroka Edebîyata Klasîk a Kurdî de zaravayên Kurdî jî berhemên herî baş hatine nivîsandin. Ew jî dewlemendiya ziman û Edebîyata Klasîk a Kurdî ye. Hin nivîskarên klasîka kurdî jî bi zaravayê soranî, goranî û zazakî berhemên xwe dane. Hecî Qadirê Koyî, Nalî, Kurdî, Şêx Riza Telebanî bi zaravayê soranî nivîsîne. Ehmedê Textî, Şêx Mistefayê Beseranî (1641-1702), Xanay Qubadî (1700-1759), Feqî Qadirî Hemewend, Mewlana Xalid (1777-1826) jî, bi goranî berhem dane. Mele Hunij û Ehmedê Xasî jî bi zazakî nivîsîne. Em dikarin vê navnîşê jî pir bikin. Nehcul Enam, berhema Mele Xelîlê Sêrtî(sedsala 18’an) ye. Şêx Evdirehmanê Axtepî, bi navên Dîwana Rûhî û Rewdneîm du berhemên xwe Kurdî ne. Mela Zahirê Tendûrekî, Seyîd Eliye Findikî, Mela Nezîrê Bedewî, Mela Beşîrê Bedewî, Mela Ebdulfettah Hezroyî, Mela Zahirê Tendûrekî, Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî, Mela Mihemedê Liceyî helbestvanên dema edebîyata klasîk a Kurdî ya dawî ne. Wan jî dîwanên xwe hene. Pertew Begê Hekarî, Selîm Silêman, Xaris Bêdlîsî û Elî Teremaxî jî bi kurdî nivîsandine û bi berhemên xwe zimanê kurdî dewlemend kirine. (Zinar, 2009: 170).

Qanatê Kurdo jî ramanên xwe wiha tîne ziman,

Sala 1980an li Bexdayê kitêbeke mezin ya zanyarê kurd Sadiq Behadin Amedî çap bûye. Navê wê kitêbê 'Hozanê Kurdî' ye. Evkitêbeke baş e û gelek bi nirxe, bi zaravayê Behdînanî, herfên erebî li ser şanzde şairên kurd hatiye nivîsandinê. Têda jîngariya wan û nimûnên şêrên wan çap bûne. Xên jî şairên bi navdar û 'eyan Elî Herîrî, Feqê Teyran, Meleyê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Pertewê

Hekarî ye. Sadiq Behadin Amedî nav û nişanên jîngarî û nimûneyên şêrên di kitêba xwe de navê donzde şairên nehiya Behdînanê nivîsîne. Navê wan evin: Mele Mensûr (1417-1490), Xalîd Axa Zehar (905-974). Mela Husêyn Batêy (ji Hekariye, 1417-1475), Bekir Beg Erzî(1867 hatiye dinyayê) , Şêx Nuredîn Brîvkanî(1791 hatiye dinyayê) , Şêx Tahayê Mayî(1844 hatiye dinyayê), Huseyn Bamernî (1868 hatiye dinyayê), Şêx Xeyatêdîn Neqşbendî(1890-1944) Mela Enver Mayî (1913 hatiye dinyayê), Taha Goş (1918 hatiye dinyayê), Ehmed Enver Neqşbendî(1891 hatiye dinyaye),Taha Ruşdî (1912 hatiye dinyayê) (Kurdo, 1992: 9).

Dema li klasîk a kurdî tê nêrîn tê dîtin ku gelek lêkolîner li ser wêjenasên mêr rawestiyane. Lê ji bilî wêjenasên mêr wêjenasên jin ên girîng jî navê xwe li ser pelê dîroka edebîyata klasîk bi tîpen zêrîn nivîsîne. Derbarê wan de Mehmet Emin DEMİR wiha difikire:

Di nav nivîskarê Edebîyata Klasîk a Kurdî de tenê mêr tune ne. Her çiqas ku kêmbin jî, lê belê helbestvanên jin jî hene. Helbestvanên jin ên kurd jî bi berhemên xwe ziman û Edebîyata Kurdî dewlemend kirine. Mah Şeref Erdelanî (Mestûre Xanim) (1800-1847), Sirre Xanima Amedî(1814-1865) û Mihribana Berwarî (1814-1865) berhemên xwe yê bi Kurdî gihîştine roja me (Demir, 2012: 1).

## 1.2. JİYANA MELA EHMEDE CIZÎRÎ Û ŞEXSİYETA WÎ YA EDEBÎ

Mela Ehmedê Cizîrî (1564-1631), helbestvanekî bi evîna îlahî coşbûyî ye, helbestvanekî kurd ê bi nav û deng, pîrê evînê, mamosteyê vecd û eşqê; şa'îrek mezin di geliyê kelecana, zewq, şadî, û helbestan de dimeşe. Ew, coş û kelecana evîna di dilê evîndaran de ye. Mutesewifê ehlê tesewifê ye ku di navbera sedsalên 16 û 17an de li Cizîra Botan jiyaye. Derbarê Cizîrî de Osman Tunç wiha dibêje:

Mela, yek ji wan rindê edîban e ku payeya wî suxenmîr e. Ew li meydana fotinên bedew mîr e. Di mîrîtiya xwe de dîlnizmiyê nake. Lewra dizane ku dîlnizmiya nerast riyakarî ye û ew ji riyakariyê dûr e. Ji lew rutbeya xwe bi eşkere dibêje. Hemtayê xwe ne Şîrazî dibîne ne li deverên din digere. Şa'îrên mîna Ferxî jî li ber çavê xwe weke fexikan dibîne. Her rêzeke şî'ra wî weke gerdeniyên ji yaqût û elmas in. Heta yaqûtan nixê xwe li ber şî'ra Melê wînd kiriyê. Firehî û kûrbûna şî'rên wî weke ûmanê ye. Pêlên bilind lê radibin û gelek caran lehî ne. Rûbarên mîna nîl û feratan tî dirijine hundurê wê ûmanê, lê ew pê jî nahise. Mîna dîlopekê tev li deryayê bibin û derya cardin mîna xwe bimîne, ne kêmbibe, ne jî di ser re here (Tunç, Dilovan, 2009: 8).

Mîrê şî'rê, rindê edîban Melayê Cizîrî, weke hemû helbestvanên dîwana klasîk di helbestên xwe de navê xwe yê esas negotiye. Ewî jî wekî edîbên din di Dîwana xwe de mexles bikar aniye. Di hinek helbestan de navê xwe yê Ehmed aniye ziman Ji bilî vê du mexles bikar anîne: Mela/Melê, Nişanî. Derbarê mexlesa Cizîrî de Prof. Dr. Abdulbaki Turan wiha difikire:

Cizîrî di helbestên xwe de du heb mexles bikar anîne. Mexles di helbestên dîwanî de leqebên helbestvanan in.

**Mela an jî Mele:** li gor kevneşopiya kurdan ew kesê icazeta zanistiyê bistîne û bi taybetî ew zanyarê olî ku di beşa 'ilmên îslamê de fêr bide û xwendekaran bide xwendin re tê gotin.

**Nîşanî:** Nîşanî di wateya peyva nîşan de ye. Nîşan di me'neya armanç, menzîl, armanca tîrê an jî di wateya nîşanê ye ku li ser rû, gerden û endamên dîlberê dertê re tê gotin. Mela xwe weke armanca tîra evînê an jî ji bo meftûnê nîşanên li rûyê yara xwe bûye ev mexles bikar aniye." (Turan, 2010: 15)

Li gor Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî a ji aliyê Osman Tunç ve ji tirkî hatiye wergerandin bal kurdî, ji aliyê Selman Dilovan ve hatiye latînzekirin û di weşangeriya Nûbiharê de hatiye çapkirin de ji bo mexlesa Mela wiha tê gotin:

Di gelek şî'rên xwe de ji bo xwe peyva Mela, Melê bikar tîne. Melayê Cizîrî ji xeynî mexlesa "Mela" di şî'rên xwe de mexlesa "Nîşanî" jî bikar tîne.

Carekî gotî Nîşanî ne Mela yê were banî

Heta bi felek her dirêtin ah û ehê min

**Nîşanî** bi me'neya kesê ku bûye nîşan ji tecelliyatên îlahî re, me'neyeke din kesê ku bûye nîşan ji tîrên qeza û qedere re ji awirên yarê re tê gotin (Tunç û Dilovan, 2009: 11).

Abdurrehman Durre jî di hejmara *Rewşenê* de li ser jîdayîkbûna Melayê Cizîrî ramanên xwe tîne ziman. Li gor Abdurrehman Durre: Pişavtina malika Ji herfan mah û salê me Nehat der şîklê falê me Kuca danendi halê me sibikbaranê sahilha 974 dike ku beramberî 1564ê mîladî ye (Durre, 1992: 34). Ev ramanek rast e, lewra raman û delîlên Abdalbaki Turan û Abdurrehman Durre, salek kêma an jî zêde, wek hev in. Baş tê zanîn ku Melayê Cizîrî hevalînî ligel Feqiyê Teyran kiriye û wan herduyan bi hev re sala 1631ê jî li Cizîrê bi hev re helbestek danberhev çêkiriye.

"Navê Melayê Cizîrî yê esas Ehmed b. Mela muhemmed el-Botî el-Cezerî ye. ew kurê Muhemmed e. leqeba (bernav) wî: Melayê Cizîrî ye. Ew li Cizîra Botan hatiye dinyayê. Ji eşîra Boxtiyan e." (Turan, 2010: 15).

Mela jî wek helbestvanên dîwanî di helbestên xwe de mexles bikar anîne.

Mexles: Mexles di helbestên dîwanî de leqebên helbestvanan in. Mexles nahêlê ku helbestên helbestvanî û ên din li nav hev kevin. Bi piranî ji du an sê kêteyan çêdibin. Mexles li gor mîzaca helbestvanî tîna hîlbijartin (PALA, 2004: 294).

Cizîrî di helbestên xwe de du heb mexles bikar anîne. Mexles di helbestên dîwanî de leqebên helbestvanan in.

Mela an jî Mele: li gor kevneşopiya kurdan ew kesê icazeta zanistiyê bistîne û bi taybetî ew zanyarê olî ku di beşa 'ilmên îslamê de fêr bide û xwendekaran bide xwendin re tê gotin.

Nîşanî: Nîşanî di wateya peyva nîşan de ye. Nîşan di me'neya armanç, menzîl, armanca tîrê an jî di wateya nîşanê ye ku li ser rû, gerden û endamên dîlberê dertê re tê gotin. Mela xwe weke armanca tîra evîne an jî ji bo meftûnê nîşanên li rûyê yara xwe bûye ev mexles bikar aniye.” (Turan,

Cizîrî di sala 1631 dîwana xwe qedandiye. Dîsa baş tê zanîn ku ew heta 66 saliya xwe li jiyane bûye û piştî hingî bo me tarî ye. Lewra gelek lêkolîner û nivîskarên kurd ên wekî Abdulbaki Turan, weke Abdurrehman Durre dibêjin ku helbesta Feqiyê Teyran a bi navê “Werin werin xelkê Hêşetê” li ser mirina Cizîrî hatiye nivîsandin. Li gor pişaftina malikekê ji vê helbestê, ( Heft eyn û lam jê bûn cuda/şîn û girî dîsa dîsa têve dur) Cizîrî di 1641ê de çûye ser dilovaniya xwe (Durre, 1992: 34). Lewra gelek lêkolîner dibêjin ku Melayê Cizîrî di 75 saliya xwe de çûye ser dilovaniya xwe. Evyek mumkin e, dostanî û hevalîniya Cizîrî û Teyran bi danberheva wan jî aşkere ye. Dema ramanên van lêkolîneran û nivîkaran ên di berhemên wan de tê nêrîn û nirxandin tê dîtin ku temenê Mela teqriben di navbera 70 û 75 salî de ye.

Melayê Cizîrî bi dîwana xwe navdar bûye. Sedemê navdarbûna wî ya herî mezin, bêgûman, dîwana wî ya binavûdeng e. “Helbestên Mela weke yê helbestvanên dîwanî bi qalibê erûzê hatine nivîsîn.” (Tunç, 2009: 14)

Em dizanin ku erûz ji aliyê hemû helbestvanên dîwanî ve bikar hatiye. Wateya erûzê stûna kon e. Helbest bi vê wezin û mêzîne tîne nivîsîn, wezina erûzê şibiyaye stûna kon. Ev stûn di navenda kon de ye û wezina kon pê rast dibe. Erûz qalibekî bihezarsal berê hatiye nivîsîn û qalibekî edebîyatê yê herî kevin e. Wateya vê peyvê bi erebî ye. Qalibê erûzê ji ber rîtmaya lingê devehê derketiye. Wateya wê ya dîwanî ji edebîyata erebî derbasî edebîyatên din bûye. Piştî ereban di edebîyata farisî de hatiye bikaranîn. Ji edebîyata farisî jî derbasî edebîyata kurdî, tirkî û yê din bûye (Tunç, 2009: 14).

Mela Ehmedê Cizîrî helbestên xwe bi wezina erûzê nivîsîne. Lewra şî'ra erûzê şî'ra xelkê misliman e ku weke xelesa zincîrekê li hev tê zêdekirin, Mirov dibîne ku helbestvanê ereb, faris, kurd, tirk û urdû heman tiştî dibêjin. Jiber ku rê û nêrîna wan şa'iran bi piranî dişibe hev. Di nav wan xelekên zincîrê de reqabetek şêrîn heye. Li pêşiya Mela, di edebîyata klasîk de gelek helbestvanên binav û deng hebûne. Weke, Sa'dî, Hafîz, Camî, Ferûxî û hwd. Ev hemû beriya Mela jiyane Lê Mela di vê zincîrê de xwe weke xelesa dawiyê nabîne. Mirov li Dîwana Mela dinêre ku peyv û zimanê ku Melê bikar aniye dibîne ku Zimanê Kurdî bi rê û rêzikên xwe, bi her me'neyên xwe yek parçe ye.

Di dîwana xwe de wî li ser eşq û evînê, li ser eşqa îlahî û beşerî, hebûn û meseleyên hebûnî, mirin û meseleyên bêmirinîyê -baqiyetê-, bûyerên dema xwe û pêşiya xwe, mezinên dema xwe û pêşiya dema xwe helbest nivîsîne.

MelaAhmedê Cizîrî, xwediyê 'ilmê, mutesewif, helbestvan û xwediyê nasnameya xwe, di dîwana xwe ya rengîn de meferê Zimanê Kurdî bi jêhatin û hostatiya xwe bikar anîye. Ewî helbestên xwe bi awayek metaforîk ve di nav sînorê edebîyata rojhilatê de anîne holê. Ew derheqê serdema xwe û edebîyata klasîk de agahdar e. Haya wî ji wêje, dîwan, helbestvanên navdar, ji 'ilim, ol, tesewif, fiqih, mantiq, werze, astronomî, felekiyat, tarîx, erdnîgarî, siyaset, bijîjkî, ji hunerên bedew û 'ilmên din hebûye. Mela, alîmekî giran, filozofekî navdar û helbestvanekî bihuner bûye. Ev taybetî di Dîwana wî ya bêhempa de tê xuyan. Osman Tunç derheqê helbest û kesîtiya edebî ya Melê de wiha difikire:

Mirov li helbestên Mela dinêre ku ew agahdarê hemû 'ilmên li dema xwe û li ser wan lêkolîn kiriye. Ji kitêbên tesewifê, fiqhê, mantiqê, û tefsîrê yên wek Gulşenên raz, Şerha Lubabê û Hikmet-uleynê, Tefsîra Keşşaf kitêbên İbnîsîna, Qanûn û Şifa, ji Iqlîdesê Yûnanî bigirin ku yek ji alimê geometriyê ye, heta bi Merûfê Kerxî, şiblî Sa'diyê Şîrazî, Alê Ferx, behsa gelek mutesewif, filozof, edîb û alimên fiqhê dike. Mijarên mîna felekiyat, tarîx, erdnîgarî, hunerên bedew û siyaset di şî'rên wî de tê dîtin. Ev jî tê vê me'neyê ku Mela ji van mijaran jî agahdar e. Zimanê erebî, tirkî û farisî zane. Zimanê ku Melê pê şî'rên xwe lê kirine zimanê medrese û ilmê ye. Kelîmeyên erebî, farisî di şî'rên wî de gelekî zêde ne û yek libên tirkî jî bikar anîne (Tunç, 2009: 12).

## BEŞA DUYEMÎN

### TESBÎTKIRIN Û ŞÎROVEYA HUNERÊN EDEBÎ

#### 2.1. PEYD Û ŞÎROVE

Famkirina huneran bi agahdariya helbestan ve dibe. “Helbest, kirineke qedîmî yê estetîk ê hişê însan e.” (Caudwell, 1997: 19). Însan his û fikra xwe dema aniye ziman xwestiye vê yekê bi rewşek bedew, bi xemlek xweşik bêje. Ji ber vê daxwaziyê huner derketiye holê. Huner, “peyvên ji bilî wateya rastî di wateyên din de were bikaranîn hatiye dîtin.” (Dilçin 1983; Kocakaplan, 1992; Özünlü, 2001). “Hunerên edebî ji bo metnên edebî werin famkirin û şîrovekirin di edebiyatê de cihekî girîng digirin.” (Dilçin, 1997: 36)

“Girîngiya hunerên edebî bi tesorufa gotinê, bi cazîbe û xemla gotinê; bi bandorkirina li ser hisa muxateb(xwendevan) û qanîkirina wî tê pîvandin.” (Mermer. 2006:151).

Tarlan, hunerên edebî bi du beşan dide nîşandan:

1. Hunerên bi kelecane hatine ziman
  - a) Hunerên rasterast bi kelecane ve hatine dayîn: mecazê mursel, îltifat, husnê ta’lîl, tekrîr, rucû, mubalexex, Tecahulê arif, qatî’, nîda, tarîz.
  - b) Hunerên ji ber kelecane zayînê, hatine holê: Teşbîh, îstîfare, teşxîs, û întaq, îrsalê mesel, telmîh û tezead.
2. Hunerên ji aliyê fikir û ramanê de hatine ziman.
  - a) Hunerên li ser peyvek an jî terkîbekê çêbûne: di vê beşê de Herdu wate jî di hevokê de hene: İham, îstixdam, mulxatê maneviyê – hunerên wateya duyem di hevokê de tune: İhamê tenasub hunerên bi du wateyê terkîb ve çêbûne: kînaye, tarîz.
  - b) Hunerên li ser du peyvan çêbûne: Cînas, îttihad, îştîqaq, qalb. Ev hunerên ji aliyê armanca xwe ve di navbera xwe de bûne du beş. b.1) Hunerên bi zên û zerafet ve çêbûne: îrsalê mesel, iham. b.2) Hunerên ji bo meqsedek xisûsî çêbûne b.3) Hunerên ji bo di dîmaxî de întibahê bihêle: Aqîs, terdîd, zem bîma yuşbihu’l-medh, medh bîma yuşbihu’z-zem (Tarlan, 1981:152).

Ji bo ku hunerên edebî baştir werine famkirin hewce ye şexsiyata helbestvan û girîngiya daye huneran were zanîn. Çumkî “dîtina gotin û teşeyê hunerên edebî nêrîna li pencereya şexsiyeta hunermend e. Lê belê ev tişt ne ji bo dîtina huner a di metnan de ye. Ev tişt ji bo deng û wateya huner e ku hunermend deng û huner herdu bi hev re bikar anîbin û yek dernexistibe bêşiya yê din (Saraç, 207: 32).

Mela Ehmedê Cizîrî girîngiya huneran zanîbûye. Ewî hunerên di nezma xwe de weke xemla bûkê, weke xemla li ser gerdena dîlberê dîtiye. Li gor wî çawa dîlber bê xemil nabe nezim jî bê huner nabe. Ji ber wê yekê ew hunerên di nezma xwe de weke

yaqût û mircanan dibîne. Di aliyê hunerê de ew nezma xwe ji yê gelek helbestvanên navdar ên dîwanî birûmettir dibîne.

## 2.2. HUNERÊN MECAZÎ

### 2.2.1. Teşbîh

Li gor lêkolînerên edebîyatê hunera teşbîhê wiha ye: “Teşbîh, du tişt ku bi hev re hevpar bin ji wan tiştan a lawaz were şibandinê bi tiştê dijwar re teşbîh tê gotin” (Pala, 1992: 107).

Pala, ji bo hunera teşbîh du hebûn hewce daye nişan. Li gor wî gere du tişt (hebûn) hebin, di navbera wan herdu tiştan de jî hevparî hebe û di wan herdu tiştan de ya lawaz bişibe tiştê dijwar.

“Ji bo ku gotin bihêz be du tiştên di navbera wan de bi rastî an bi mecazî şibandin hebe ya lawaz were şibandin bi ya dijwar teşbîh tê gotin.” (Soysal, 1998:98).

Soysal girîngî daye hêzabûna gatinê. Armanca teşbîhê hêza gotinê ye. Hunermend heke bixwaze ku gotina xwe bi hêz bîne ser ziman û bala xwendevan bikşîne ser gotina xwe gere gotinê bi awayek hunermendi derxe holê. Ev yek jî gelek caran bi şibandina tiştê lawaz dibe.

Du tiştê ku di navbera wan de wesif, şibandin hebe ji wan yek were şibandin bi tiştê din e. Di teşbîhê de du heb hemanên bingeş hene: yek muşebbeh a din jî muşebbehun bih e. Ji wesfê di navbera wan de vechê şebêh tê gotin. Di vê rewşê de daçeka teşbîhê tê bikaranîn (Saraç, 2007: 129).

Li gor Saraç jî, ji bo çêbûna hunera teşbîh hewce ye ku du dişt hebin û di navbera wan tiştan de jî şibandin hebe, ji wan yek lawaz ê dî jî dijwarbe û ew herdu tişt bişibin hev. Saraç jî wekê Soysal salixa hunera Teşbîh dike. Lê saraç salixa çar hemanên teşbîhê jî dide. Ji bo teşbîh bi hêz be hecye ku ew herçar heman werin bikar anîn. Di teşbîhek bêtêmasî de ev herçar hemanên teşbîhê gere hebin. Lê carna ji van hemanan dibe ku hinekî wan neyên bikar anîn

Bi gotina Turan, hunera teşbîh ji hunerên dî pirtir hatiye bikar anîn. Ev huner di edebîyata klasîk de ji hemû hunerên dî zêdetir bikar hatiye. Bedewîya dilberê, taybetîya wê bêjn û bala wê, dêm û gulîyê wê û ser de pê de de hemû taybetîyên dilberê gelek caran bi hunera teşbîh hatiye bikar anîn Hunermend, rindî û bedewîya yara xwe pîrî caran bi hunera teşbîh daye nişan.



Ev hunner di nav helbestvanên dîwanî de ji hunerên din pirtir hatiye qebulkirin. Hunermend gava li hemberê hebûn, rindî, bedewî, rewşê de kelacan û hessê tîne ziman, ji bo gotina wî raydan be hunera teşbîhê bikar tîne. Ji ber vê yekê di wk. de teşbîh di hemû berhemên dîwanî de hatiye bikaranîn. Şibandin ne hunerekî mecazî ye. Çunkî peyv bi wateya rastî tîne bikaranîn. Di şibandinê de şêrîniyek, rindiyek heye. Di belaxetê de cihekî girîng digire (Turan, 2010: 94).

Cîzîrî, di 314 malikan de hunera teşbîhê bikar aniye. Ewî jî weke helbestvanên edebîyata klasîk ji bo gotina xwe bi awayekî rind, bedew; ji bo rewşa ku agah bide bikelecan, bihêz be, ji bo ku huner raydan be hunera teşbîh li gelek cihan bikar aniye. Bi vê hunerê wateya gotina xwe bihêz û dijwar kiriye.

Mela li pirê cihan qesta dîlberê bi mazmûnê wejêyî aniye ziman. Di şûna dîlberê de padîşeh, belqîs, gul selw, rihan, rimbaz, tîrendaz, durdane, durrê yetîm, yaqût, sedef, şervan, cellad, saqî, rind, meyfiroş; di şûna endama dîlberê de selw, rihan, dara çam, şitla gul an jî şitla rihan hwd; şûna por û zulfê dîlberê de şev, pût, senem, çengel, zulmat; şûna dêmê (rûyê) dîlberê de wehdet, ava heyatê, sibeh, şeveq; şûna birhê dîlberê de qews, hilal, hîva nû, keman, kevan, mihrab, qabeqewseyn, secdgah, mîraç hwd.; şûna bijangê dîlberê de tîr, rim, xencer, qime; şûna nîne li rûyê dîlberê hîndû, şev; di şûna lêvên dîlberê de şekir, şîrin, nûn, rê, xal, noqte; şûna diranê dîlberê de sedef, durr, mircan; şûna gerdana dîlberê zozan, ziyaretgah, deşt, berf hwd. daye nîşandan. Ev teşbîh carinan bi herçar hêmanên teşbîhê carinan bi yekî carinan jî bi du an ji sê hêmanan çêkiriye. Evyek dide nîşandan ku Cîzîrî girîngiyeke mezin daye hunera teşbîh û hunera îstîfayê.

*“Meşşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da*

*Da ‘îşqi hil bit pêli pêl qelbê me pê cellabi da”*

(X. 1, m.1)

Teşbîh: **çengal, zulf,**

(Meşateya rindiyên (bedewiyên) ezêlî ji bo ku evîna me pêl bi pêl kaş bike û dilê me bike hêsîr çengela zulfan ji me re kiriye dafik.)

**Zulf:** “Por, luleya porê ye ku li herdu aliyê rûyê (sûretê) dîlberê berjêr dibe.” (Pala, 2015: 495)

**Por:** Di edebîyata klasîk de hêmana bedewiyê a herî hatiye bikaranîn, bi navê mû, gîsû, zuluf kagul hwd. hatiye gotin. Por li gelek cihan bûye mijara teşbîh û mecazê. Bi şiklê xwe, rengê xwe û bi bêhna xwe wate daye gelek beyitan. Por bi

gijikbûna xwe, bi perîşaniya xwe bi dirêjahiya xwe hişê evîndar ji serê wî hildide. Wî dike bende, kole; wî perîşan dike. Bêhna wê weke misk û enberê ye. Misk û enber jî pirê caran weke porê dîlberê xweş bêhn nade. Ba wê bêhnê hildide dibe ji evîndar re. Rengê porê herdem reş e. Ji bilî reşbûnê bi tu rengî nayê xuyan.

Di aliyê şikil de por bi navê: resen, rişte, risman, zincîr, silsile, mar, ejderha, su'ban, jehr, çevgan, abê ewan, tul'ê emel, omrê cawîdan, qisse, rê, teşbîh, hemayîl, fitîl, qendîl, rayet, şehper, berg, perda qe'bê, seccade, nîqab, zirx, cam, sayeban, cîm, dal, lam, **çengal**, dar, fitraq, ne'l, dûpişk, nerdûban, xet, kemend, dam, çengel, tor, helqe, çenber, bend, uqde, sunbul, hûşe, carûb, cerî, qelem, name, heykel, baxban, neqaş, kamran, aşiq, cadû, sêr, harût, diz, şehbaz, tawiz, huma, ebr, mehşer, rivayet, bid'at, fitne, bela, cewr, ehd, ferzane, îbrahîm hwd.

Aliyê bêhnê de: Misk, enber, nafe, semen, reyhan (rihan), ûd, abid, xaliye...

Aliyê reng de: Şev, Leyla, leyl, şam, şebistan, zulumat, maxrîb, dûman, sebdiz, şebrev, dax, binevş, Hînd, Hindîstan, hîndû, kufir, kafir, bêdîn, bûtperest, zunnar whd.(Pala, 2015: 384-385).

Di beyta jor de Mela Ehmedê Cizîrî, zûlfên dîlbera xwe şibandine çengelê. Lê belê çengel serê wî xwar e. Serê zulfa yarê jî wek çengelê helqe helqe ye. Li gor edebiyata klasîk zuluf şev e, dêmê dîlberê jî ava heyatê ye. Por kesret e, dêm (rû) wehdet e. Li ser riya wehdetê hertim kesret heye. Dema ku aşiq bixwaze yara xwe bibîne zulfên yarê weke perdeyeke reş, weke şeveke tarî û weke dujminekî dikeve navbera evîndar û rûyê dîlberê. Nahêle aşiq rûyê maşûqa xwe bibîne. Ji ber wê yekê dilê aşiq pare pare ye û her perçeyek wî bi tayê zulfên yarê ve dardakirî ye. Dîlber çiqas wek selwê bi endamek narîn here were ew qas dilê aşiqê birîndar xwîn dibe û tê sotin. Zulfên yarê weke dafik, wek torê ye ji evîndar re. Dilê evîndar wek çûkekî ye. Gava hêz bide xwe ber bi yara xwe ve here dikeve çengela zulfên yarê. Serê zulfê weke çengel xwar e. Ji ber xwarbûna wê zuluf şibihaye çengelê.

**a. Muşebbeh (Şibîn):** Tiştên şibihane hevdu ji wan tiştê bêhêz (lawaz) re tê gotin.“ Peyva ku heyîniyek an jî taybetiya heyîniyekê agahdar bike re tê gotin.” (Pala, 1992: 107) Mela hêmana şibînê girîng dîtiye û di xezelên xwed de li gelek cihan bikar aniye.

*Zulfên put û şîrînleban jehrî ne şubhet 'eqreban*

*Lê min ji biska purgirê îro tinê girtin du ta*

(X. 4, m.4)

Muşebbeh (Şibîn):**Zulfên put**

Muşebbeh (Şibîn):**şîrînleban jehrî ne şubhet 'eqreban**

(Min îro ji biska porgirê du ta tenê girtin. Zulfên pût û lêvên şîrîn weke dûpişk bi jehrî ne.)

**Put:**“Di serdema cahîliyê de hinek pûtê mezin hebûne ku Ereban ew Îlah dîtine. Ji wan ên herî navdar Hûbel, Lat, Menat û Ūzza ne.” (Pala, 2015: 284).

**Leb:** Leb, di helbesta dîwanî de hêmanek bedewiyê herî tê bikaranîn e. Bi xuyandina bedewî, bi reng bi tengbûn û piçûkbûn, bi gloverbûnê, bi nîşana li kenarê xwe, di aliyê axaftinê û gotinê de leb hêmaneke bedewiyê ye ku helbestvanê dîwanî dev jê bernade. Leb bi lêkerê mijandin, ramûsandin, pirsandin û gotinê tê ziman. kenandina lêvan ji bo aşiq rewşek pir baş e. Dev û diran di nav wê de ne. Ji bo ku derketina can a herî dawiyê ye leb bi can re jî eleqedar e. Leb li gelek aliyên dibe mijara teşbîh û mecazan. Lêv ji aliyê reng û şiklê xwe de şibiyaye şerab, qedeh, saqî, meze, meyxane hwd. Taybetiya lêvê ya herî diyar şîrînî ye. Leb dîsa gotinên biêş dibêje. Ji aliyê reng ve dişibe laleyê. Carinan dişibe yaqût û mircanan. Ji aliyê şiklê xwe ve dişibe hoqqe, durr, muhra Suleyman. Di vê hoqqeyê de diranên wek durr veşartî ne. Ji aliyê wesfê ve dibe tebîb, darûşşîfa, derman, dewa, gulşeker. Carinan dibe şekir, neyşeker, şehd, xurme, şîrîn, carinan jî dibe peyvek weke jehrî. Taybetiyên weke xwîn, xwînxwar, xwînbaha jî di şûna lêvê de tên bikaranîn. Lêv gonce ye, gul e, semen e, ava heyatê ye. Çeşmê can e, kewser û çeşmeyê heywan e. Lê tu kesî jê venexwariye. Bi gotinan mirriyan ji gorê radike ji ber vê lêv sê nefes e, sêdem e. ew kesê ku wejîn dibe aşiq e. Carinan jî lêv sirekî ye, razê nihan, nuqteyê îlahî ye. Carinan bi qasî ku nexuyê piçûk e, wek xal (noqte) e hetta dibe ku qed nexuyê, xeyal e, xewn e aşiq wê difikire lê tu wextî xwe nagihîne wê (Pala, 2015: 285).

Di malikê de bi gotina “zuluf û pût, lêv û şîrînayî, zuluf/lêv û ‘eqreb” ve sê heb teşbîh hatine çêkirin. Zulfên yarê şibiyane pût. Çumkî zuluf şev e, kesret e, rû wehdet e. Bisk, zuluf weke pûtekî li pêşiya wehdetê ye, nahêle aşiq bigihêje wehdetê. Lêva yarê şibiyaye şîrînayiyê. Axaftina yarê ya derbarê aşiq de wek şekir şîrîn e. Zuluf û lêv şibiyane dûpişkî. Zuluf û lêv hêmanên bêhêziyê ne. Lewra tiştê bêhêzî re şibîn tê gotin.

Endamên yarê bi du tiştan şibiyaye: Li cihekî zulfên yarê şibiyane pûtan, li cihekî jî lêvên yarê şibiyane şîrînayiyê. Li cihê din jî lêvên yarê şibiyane dûpişkî. Li gor Cizîrî, zulfên yara wî weke pût her daîm jê re gunehan dinivîse, zuluf jê re cewr û cefa ye, lêvên yara wî wek dûpişkekî hertim jehrê dirijîne nav dilê wî. Çawa ku dûpişk jehriya xwe berdide nav bedena mirov. Lêvên yarê jî bi agir û bedewiya xwe hesret, derd û kul dixê nav dilê evîndarî. Evîndar hertim bi agirê eşqa dîlberê dişewite.

**b. Muşebbehun bih(Şibandin):** Tiştên dişibin hevdu ji wan wê tiştê bihêz, (dijwarî) re tê gotin. “Heyîniya bihêz re tê gotin.” (Pala, 1992:107)

*Nisbet perî zîbaye ew wek nêrgiza yekta ye ew*

*Ya men re'a xillî fe-hel yuşbî bi-şey'in qameta*

(X. 4, m. 5)

Musebbehun bih(Şibandin):Nisbet *perî* zîbaye ew

Musebbehun bih(Şibandin):wek *nêrgiza* yekta ye ew

**Nêrgiz:** Li gor mîtolojiyê narsîs xortek pir bedew û ji evînê fam nedikir hebûye. Keç û qîzên ku jê hez kirine û ji ber derdê bêxembûna wî gazin û giliyê wî li cem îlahan kirine. Ji ber ku cezayê îlahan dane rojekê nêrgiz eqsa xwe di avê de dibîne û dibe evîndarê xwe. Dema eqsa xwe ya li avê temaşe dike dikeve avê û dixeniqe. Bedena wî dirize û di cihê wî de çîçekek, (kulîlkek) weke çavan hêşîn dibe û bi awayek heyran heyran li bedewan dinêre. Li gorî efsaneyêke din jî nêrgiz lawê çem (robar) û perî bûye. Însan û perî evîndarê wî bûne. Hetta periya dangan ji destê eşqa nêrgiz miriyê û bûye kevir. Li gor efsaneyêke rojhilatê (şerq) jî di navbera gul û nêrgizê de evînek derbas bûye. Ji van herdu hezkiriyên nêrgiz bûye kulîlkek şiklê çav û heta roja qiyametê bûye mehkûm û întizar û hicran kêşandiyê. Di temamê van efsaneyan de di navbera nêrgiz û çav de têkiliyek heye. Çavê dîlberê nêrgiz e. Bi awayek xwar û şaşî dinêre. Îtnizarê dikişîne û mestane ye (Pala,2015:356).

**Perî:** Perî ji cinên mê re tê gotin. Kesê ku ew dîtîbin tune ne ji ber vê yekê li gor însanan perî gelek bedew û xwediyê cazibeyê girîng in. Perî bi efsûn, bi sihrê dertên holê. Warê wan kanî û hemam in. Ji insanan direvin û nayên xuyan. Di aliyê ku hinek însanan dikin aşiqê xwe, geh xuyan û hundabûna xwe û meftûnkirina însanan hwd. ve dişîbin dîlberê (yarê). Ew kesê ku gazî periyên dike û tîne holê jê re perihan tê gotin (Pala,2015: 369).

Yar ji aliyê ku aşiq meftûn kiriye, aliyê hiş û aqil ji serê aşiq hildaye, bi bedewiya xwe şibiyaye periyê. Evîndar dîlbera xwe weke periyên bedew û bi efsûn dibîne.

Nêrgiz, mazmûnek di şûna dîlberê de di gelek helbestan de ji aliyê gelek helbestvanan ve hatiye bikaranîn. Dîlber weke nêrgizê bêxem e. Haya wê ji evîndar tune ye. Haya wê ji cewr û cefaya bi aşiqan dide kişandin tune ye. Bedew e, lê bi bedewiya xwe eş û elemê dixê nav dilê evîndarî. Herdem xemkêş e. Ji bo wê dîlber şibiyaye nêrgizê.

**c. Wechê Şebih(Hêla şibandin):** Tiştên dişîbin hevdu ji wan pêwendî û şîbîna di navbera wan re tê gotin. “Peyva ku mahiyetan, şeklan di navbera du heyîniyan de dide nîşan re tê gotin.” (Pala, 1992: 107)

*Peyweste tu her bangî me kî şubhetê ney*

*Bê yar û mey û sazê mi go nayim ez*

(X. 31, m. 10)

Wechê Şebeh (Aliyê/hêla şibandin):Peyweste tu her **bangî** me kî şubhetê ney

Di vê derê de dîlber di aliyê bangkirinê de şibiyaye neyê. Bangkirin, hêmana aliyê şibandî ye. Mela dîlbera xwe dişibîne neyê, dibê tu weke neyê gazî min bike. Peyva “bangî” wechê şebah e.

**d. Edata Teşbîhê (Daçeka şibandinê):** Daçekên di navbera peyv û têgehên de pêwendî damezirandîye re daçeka şibandinê tê gotin. Li gor Îskender Pala jî: “Peyva ku têkiliya wekhevîya herdu aliyên dide nîşan re daçeka şibandinê tê gotin.” (Pala, 1992: 107).

*Min dîlberek wek dur heye mehbûbê şîrînsur heye*

*Husn û cemalek pur heye Belqîssifet mesken Seba*

( X. 3 m. 2)

Edatê Teşbîh (Daçeka şibandinê):dîlberek **wek dur**

**Dur:** Di edebîyata klasîk de diranên dîlberê, xwêdana wê, wuslet, hêsirên evîndarî, helbestên helbestvanî, û di şûna gotina bedew de tê bikaranîn. Taybetiya wî ya herî tê ber çavan: di behrê de çêbûna wî, teyisandina wî û bihayê wî ye. Di demsala biharê de di meha nîsanê de dema ku sedef bi qaşilê xwe yê mîdye ve derdikeve devê behrê dilopek barana biharê meha nîsanê dikeve nav qalîkê wê û ew dema dikeve behrê, ew dilop ava şêrîn e. Ava şor û şêrîn dema ku temasê hev dîkin, bedena sedefê dişê û ew pêzeyek ron derdixe. Piştî wexta ew pezeyê ron hişk dibe. Pey hişkbûnê evyek bi caran dewam dike. Bu vî awayî dur çêdibe. Bi navê durrê dane, durrê xaltan, yekdane, durrê şehwar tê gotin. Berê durrê rind ji aden (dev) derdiketin. Ji bo wê dur bi peyva aden re pir tê ziman. Gotina durrê aden zehf hatiye bikaranîn. Biwêja “dura li cihanê yakane” ji bo pêxemberê me tê gotin. Dur pirê caran bi behr an jî bi sedef re tê bîranîn (Pala, 2015: 126)

**Belqîs:** Hudhud çûyîna xwe ya warê Sebayê, li wê derê dîtina Belqîsê ku Belqîs sahibeya Sebayê ye. Belqîs jî melîkeya qewmê ku tavê dihebîne bûye. Evyek ji Suleyman re got. Li ser vê gotinê Suleyman Hudhud efû kir û bi wî re ji Belqîs re name şand. Piştî wexta Suleyman pêxember Belqîs dewetî îslamîyetê kir û ew bû mîslîman (Pala, 2015: 412).

Belqîs bi bedewiya xwe û bi hiş û eqlê xwe bûye mijara edebiyata dîwanî. Weke edebîyata klasîk a hemû gelên biyanî de û di Edebîyata Klasîk a Kurdî de jî peyva dur, belqîs, warê seba bi awayekî girîng li gelek cihan bikar hatiye. Cizîrî jî girîngiyek mezin daye van motîf û mazmûnên han û di gelek xezelên xwe de bikar anîne. Diran û bedewiya dîlberê şibiyane dur; demê dîlberê şibiyaye rûyê Belqîsê.

Dîlber ji aliyê hêjatiyê ve û ji aliyê bedewiya xwe ve hatiye şibandin bi durê. Ev şibandin bi daçeka “wek” ve çêbûye. Peyva **wek**, daçeka şibandinê ye. Dîlber weke dur

ender û biha ye. Xwedanê heskirinê ye. Bi heskirina xwe gelek şîrîn e. Husn û cemala dîlberê weke rûyê Belqîsê ye.

*Nisbet perî zîba ye ew **wek** nêrgiza yekta ye ew*

*Ya men re'a xillî fe-hel yuşbî bi-şey'in qameta*

(X. 4, m. 5)

Edatê Teşbîh (Daçeka şibandin): **wek** nêrgiza yekta ye ew

(Ew jî ji periyar bedewtir e, nêrgizek mîsalê elif e. Ey! kesê ku (ew) dîtiye bêjin gelo tu tişt dişibe endamê yarê?)

Dîlber xwe gelek bedew dibîne û pozbilind e. jiber vê yekê Cizîrî ew şibandiye nêrgizê. Bedewiya wê şibandiye ya periyar. Bedewiya dîlberê ji ya periyar zêdetir e. Ew gelek bedew e. Lê weke nêgizê haya wê ji evîndar an jî ji evîndaran tune ye. Bejn û bala wê weke elifê dirêj e.

**Teşbîha Belîx:** Bi tenê hêmanên şibîn (drûvîn) û şibandin (drûvandin) ve tê çêkirin. Teşbîhê belîg, bi tenê tarefeynu't-teşbîh-in (muşebbeh û müşebbehun bih in) were gotin, daçek û hêmana aliyê şibandin neyê gotin e. Ev cure teşbîh, ji teşbîha mufassal û mucmel puxtetir (sergewretir) e. Lewra hêmanên teşbîhê çiqas kêr bin wateya wê ewqas xurt dibe (Kûlekçi, 1995: 36).

*Selwa rewanzerrîn wereqçîçek Melê dîn sed neseq*

*Yaqûtuha yehkî'ş-şefeqyehkî 'uqûden kewkeba*

(X. 3, m. 12)

(Mela bi sed terzê selwa rewan û kulîlka pelzêrîn dît. Mirov dibê qey Yaqûta wê weke şeveqê, gerdena wê weke goşiyê stêrkê ye.)

Muşebbeh (Şibîn): **wê (dîlber)**

Muşebbehun Bih (Şibandin): **selwa rewan, zerrînwereq**

Muşebbeh (Şibîn): **Yaqûtuha yehkî'ş-şefeq**

Muşebbehun Bih (Şibandin): **yehkî 'uqûdenkewkeb**

**Selwî (serwî, serw):** Di edebîyata klasîk de herî pir behsa dara selwê tê kirin. Bejna selwê carinan dişibe yarê carinan jî bejna yarê dişibe selwê... Ew dareke xemlê ye. Sivistan û havînan hêşîn dimîne. Bayê payîzê jî wê hişk nake. Bi hatina bayekî sivik hejandina wê rêveçûna ber dil bibîr aniye. Pirê caran ji bo

dîlberê selwê rewan bikar tê. Dara selwê bi piranî di nav goran de tê çikandin û hêşîn dibe. Sedema wê jî dema ku ba tê dengê “hû” derdixe. Ev îşareta zîkrê Xwedê ye. Jiber vê yekê jî bo miriyan dibe sedema mexfîretê.. Di bax û baxçeyan de jî dara selwê tê çikandin. Di bin selwê de etek an jî pê tê tebîrkirin. bi vê yekê etek an jî pê ber dilê (dîlberê) tê vegotin. Çem etekê wê maç dîkin. Pelê çinarê bi piyê wê ve dizeliqîn. Gula lavlavkê bi selwê re tê xuyan. Bi selwê re gul, lale, nêrgîz, binevş, sunbul, tîr, naz, bela û qiyamet tê bikaranîn (Pala, 2015: 400/401).

Di vê beytê de dîlber bi teşbîhê belîx şibiyaye selwa rewan û pela zêrîn. Di vê derê de Wechê Şebêh (Aliyê/hêla şibandin) û edatê teşbîh (Daçeka şibandin) nehatiye bikaranîn. Bi gotina selwa rewan qesta dîlberê hatiye kirin. Mela dîlbera xwe şibandiye selwa rewan a ku pelê çinarê pê ve zeliqîne. Dara çinarê ji aliyê bedewî û xemlê de tê mînakdayîn. Zivistan û havîn hêşîn dimîne. Yara Mela jî bedew e û herdem bixeml e. Tu wextî pîr nabe. Weke dara çinarê ciwan e.

**Yaqût:** Sê cure rengê kevirê yaqût hene: sor, zer, şîna ewranî. Ya herî biha weke rengê hinarê sorgewez e. Ji wê re “ yaqut nûmanî” jî tê gotin. Ku tê xwarê ji dilê insan re baş tê. Ji bo wê ji yaqût şerbetek biha tê çêkirin ku jê re “yaqûtê mufferreh” tê gotin. Di helbesta dîwanî de yaqût û le’l taybetî wek hev dane nîşan. Lêwê dîlberê, çavê evîndar ku ji ber girîne sor bûne weke xwîn û hêşirên bixwîn dişibe yaqût. Yaqûta ku qedeh, gustîl, guhar, hoqqe, gerdenî, jê çêdibe bi rengê sorayî û bi bihayê xwe tê ber çavan. Rengê şerabê jî dişibe yaqûtê (Pala, 2015: 479).

Di vê derê de yaqûta li ser gerdena dîlberê şibiyaye stêra şeveqa sibehê. Lê daçeka şibandinê nehatiye bikaranîn. Li gor rivayetê li dema sibehê zû stêra suheylê ku derdikeve rengê xwe dide kevirê eqîq. Gerdena dîlberê weke şeveqa sibehê ye. Xemla li ser gerdena dîlberê jî weke stêra sibehê hatiye dîtin.

Di malika jor de gerdena dîlberê şibiyaye goşiyê stêrkan. Çawa stêr li şeveqa sibehê rê û wext nîşanî mirovan dike gerdena dîlberê jî weke stêra sibehê dibe rêberê evîna evîndar û dinyaya wî ya tarî ronî dike û rê nîşanî evîndarê serxweş dike.

*Mehbûbi wek stêr e govend û ‘îşqibazî*

*Têkil biçîn semayê hişyar û mest û serxweş*

(X. 37, m. 4)

Muşebbeh (Şibîn/dirûvîn): **Mehbûbi**

Muşebbehun Bih (Şibandin/dirûvandin/Mînandin) : **stêr**

Wechê Şebêh (Hêla şibandin/mînandin):

Edata Teşbîhê (Daçeka şibandin/Mînandin): **wek**

Di vê malika jor de hunera teşbîh bikar hatiye. Li vê derê yar (berdil) şibiyaye stêrê. Sê heb hêmanên hunera teşbîhê hatine bikaranîn. Hêla şibandin bikar nehatiye. Dîlber (maşûq) ji aliyê bedewiya xwe ve şibiyaye stêra li rûyê asîmanan. Çawa stêr di şeva tarî li rûyê asîmanan dityeise, aşiq dema maşûq dibîne şeva emrê wî bi bedewiya rûyê yara wî dibiriqe. Jixwe di edebîyata klasîk de rûyê yarê dişibe hîv, roj, an jî stêran. Ji bo bedewiya berdilê xwe ji me re terîf bike rûyê wê mîna stêr dide nîşan. Ewî jî weke helbestvanên W.D. hunera şibandinê girîng dîtiye û li gelek cihan bikar aniye.

**Teşbîhê Mufassal:** “Şibandina bi çar hêmanan ve were çêkirin jê re teşbîhê mufassal tê gotin. Teşbîhê mufassal, ji teşbîha ku hindava wê hatibe zikirkirin re tê gotin.” (Bolelli, 1992: 41)

*Tîrek ji qewsê malzirav tê dil qewî tavêje nav*

*Xûn tê purî teşbîhê av firyad û efxan sed esef*

(X. 46, m. 9)

Muşebbeh (Şibîn/dirûvîn): **xûn**

Muşebbehun Bih (Şibandin) : **av**

Wechê Şebah (Hêla şibandin): **tê**

Edatê Teşbîh (Daçeka şibandin): **teşbîhê (weke)**

(Tîrek ji qewsê (birhê) malzirav bi dizî hat û di nav dilê min de çikiya. Bi feryad û bi fîxan bi sed esef (ax) weke avê xwîn ji dilê min hat.

Di beyta jor de herçar hêmanên şibandinê hatine bikaranîn. Helbestvan berdila xwe dîtiye. Awirên berdila wî weke tîrekê li ser dilê wî çik dibe. Ji ber wê tîrê dilê wî birîn dibe, ji birîna wî xwîn weke avê tê. Di vê derê de xwîn ji aliyê kişandinê, ji aliyê hatinê û herikandinê ve şibiyaye avê. Çawa av diherike û dikişe, xwîn jî ji birîna dilê helbestvanî weke avê tê û dikişe.

*Ger ne teşbîhê du birhên te bitin*

*Me di ‘îdan bi hilalê çî xered*

(X.41, m.2)

Muşebbeh (Şibîn/dirûvîn): **du birhên te**



Muşebbehun Bih (Şibandîn/dirûvandî/Mînandin) :di ‘îdan bi hilalê

Wechê Şebeh (Hêla şibandî/minandin):**kevan, qews**

Edatê Teşbîh (Daçeka şibandî/Mînandin): **teşbîhê**

**Ebrû (Birh):** Hêmanên berdilê yê rindiyê (bedewî) yê duyem e. Di aliyê fitneyê (ewanê) de bi çav re hevbeş e. Birh weke firoşgeha fitneyê (ewanê) ye. Tê de çav, bijang û xemze hene. Bi porê berdilê re nêzikayiyê dike û wî jî ber bi ewanê de dikişîne. Taybetiya wê ya herî mezîn kevantiya wê ye. Ev kevantî di tevgera wê de jî heye. Tu carî rasterast nabe. Xwarkirina birhan carinan gilî û gazin, carinan jî hêrs tê famkirin. Çumkî xuyana kevana birhê yarê di navbera aşiqan de destpêkirina iyd (cejn)ê ye. Ev cejin ewana ser mehê jî tîne. Di navbera cejna remezanê û birhê de têkilî heye. Ebrû di eynî demê de xurreyê meh e. Di cejna qurbanê de jî hîv tê xuyan ji ber vê yekê di navbera birh û qurbanê de jî têkilî heye. Birh carinan bi tîpa yê, rê û nûnê ve dertê pêşiya me. Birh bi qewsbûna xwe dişibe van tîpan. Birh carinan bi xencer û keman ve jî xwe dide nişan. Di vê rewşê de evîndar weke qurbanekê amade ye. Birh ku xencer be çavê di bin wê de secdegah e, mescîd e. Aşiq li ser vê yekê ber bi cemala dîlberê ve diçe. Daxwaziya dilê evîndar dardakirina koşeya birhê dîlberê ye. Ji bilî wan birh: kej, ra, aşûbê cihan, çevgan, pire, şayeban, çiya, xet, axyar, û gotin tê dîtin. Birh wek enberê bîne dide. Weke îşareta medê li ser pozî wek elîfê disekine. Welhasil li ser birhê yarê gelek teşbîh û îstîfare hatiye çêkirin (Pala, 2015: 131)

**Iyd:** Cejn. Di edebîyata klasîk de iyd (cejn) di navbera evîndar û dîlberê (aşiq û maşûq) de li aliyê evînê bi gelek mijaran ve rewşa cejnê tê bikaranîn. Meseleya wîsala dîlberê ji bo evîndar iyd (cejn) e. Hêsirê evîndar gulava cejnê, xebera wisleta dîlberê jî şûna şekirê di cejnê de tê belavkirin e. Birhê dîlberê dibe hîva êvara cejnê. Ji bo wê ku hîva nû tê xuyan cejin dest pê dike. Dîsa gotina dîlberê ji aşiq re weke cejnê ye. Dema ku rûyê wê û demê wê tê xuyan, ji evîndar re iyd e û gelek têkiliyên cejnê û kevneşopên cejnê tînin gotin... Di cejnê de dilşadiya gel, ger û şabûn, serbestiya hêsir û bendiyar hwd. Çena dîlberê ku wek zîndan e di cejna rû û demê de vala dibe. Wê rojê evîndar dikenin û şa dibin. Êdî dem dibe cihê cejnê. Di helbesta dîwanî de: Mehê iyd, iydê newroz, iydê ekber, iydê fitir, iydê adha, iydê canan telakiyên jênager in. Peyv, bi şiklê iyd ve jî tê bikaranîn. Ji mijarên ku behsa cejnê dikin re jî “iydiye” tê gotin (Pala, 2015: 223).

**Hîlal:**“Hîva nû (heyvok), hîlal. Hîva ku di cejnê de tê dîtin hîlalê iyd, hîva ku di remezanê de tê dîtin re jî hîlalê rûze an jî hîlalê sewm tê gotin” (Pala, 2015: 209).

Helbestvan birhê berdila xwe şibandiye hîva nû ya herdu cejnên olî. Birh ji aliyê qewsbûna xwe dişibe hîva nû, Çawa gelê misliman dema hîva nû dibîne û piştî hîvê cejna remezan û qurbanê dike, Mela jî dema birhê yara xwe dibîne weke misliman bi keyf û şahî cejna xwe pîroz dikin, kêfxweş dibin ew jî bi dîtina herdu birhên berdila xwe dilşad dibe.

**Teşbîha Mucmel:** “Ew şibandina ku ji hêla (aliyê) dirûvandîne nehatiye gotin re teşbîhê mucmel tê gotin. Teşbîhê mucmel, şibandina (drûvandîna) ku qesta aliyê (hêla)

wê were kirin re tê gotin”(Bolelli, 1992: 41). Di teşbîhê mucmel de sê hemanên hunera Teşbîhê bikar tên.

*Hin gulê bo 'enber in hin di şîrîn esmer in*

*Hin guherê dane yin **mislê Suheylê sema***

(X. 2, m. 2)

Muşebbeh (Şibîn/dirûvîn): **Hin**

Muşebbehun Bih (Şibandin) :**Suheylê sema**

Edatê Teşbîh (Daçeka şibandin): **mislê**

**Suheyl:** “Navê stêra di nîvkada başûr de ye. Li Yemenê ku baştir tê dîtin jê re Suheylê Yemanî jî tê gotin. li gor efsaneyan dibê kevîrê eqîq jî rengê xwe ji vê stêrê hildaye.” (Pala, 2015: 411)

Helbestvan carinan yara xwe şibandiye gul û enberê. Yar ji aliyê bedewiya xwe, ji aliyê bêhna xwe ve şibiyaye gulê. Carinan şibandiye şêrîniyê. Carinan şibandiye gewherî. Yar weke gewherî biha ye. Carinan jî şibandiye stêrka suheylê. Di risteya dawiyê de dîlbera xwe şibandiye suheylê sema, şibandiye stêrka suheyl, lê ji kîjan aliyê ve şibandiye negotiye.

**Teşbîha Muekked:** Teşbîhê muekked, ji teşbîha ku daçeka şibandin nehatibe gotin re teşbîhê muekked tê gotin (Bolelli, 1992: 46).

*Meşî mestane reyhanî dilê min dî di amancê*

*Reşandî sîneyê tîran bi qewsê her du mal ebrû*

(X, 69 m. 14)

Muşebbeh (Şibîn): **berdil (ewê)**

Muşebbehun Bih (Şibandin) :**reyhanî**

Wechê Şebah (Hêla şibandin/mînanandin):**meşî mestane**

Helbestvan berdila xwe ji aliyê meşandinê yan libakirinê, çûyin û hatinê şibandiye rihanê. Dîlbera wî jî weke rihanê mestane ye. Bi naz û cilwe xwe li ba dike diçe û tê. Lê di vê hunerê de daçeka şibandinê bikar nehatiye.

## 2.2.2. Îstiare

Îstiare jî wekê teşbîhê bi Minandinê ve tê çêkirin lê bi du hunerên teşbîhê ve çêdibe. Bi hemana şibîn û hemana şibandin. Hêl û daçeka şibandinê nayê bikar anîn, bitenê tiştê lawaz û ya dijwar ve çêdibe. Gelek lêkolînerên edebîyatê fikrê xwe yên aliyê itiareyê de bi vê awayê anîne ziman. “Tiştêk ji bilî navê xwe di aliyê wateyê de bi navek din were bibîranîn e.” (Dilçîn, 1997: 412) Cinar jî wek Dilçîn difikire. “Bingeha îstiareyê ye ku bi teşbîhê ve tê çêkirin. Îstîfare, şibînek (teşbîhek) bi kurtasî ye” (Çınar, 2008: 132).

Saraç, hunera îstîfare wek teşbîhek kurtasî dibîne. Li gor wî îstîfahem mecaz hem jî teşbîh e. “Îstîfare bi du heb bingehên teşbîhê ve tê. Muşebbeh û jî muşebbehun bih. Yeka wan ve bi rasterast an jî neyekser ve were gotin lê tevbeşa ku nehatiye gotin were qestkirin re tê çêkirin. Bi îfadeyeke din îstîfare teşbîheke bî kurtasî ye. Ku tê nêrîn tê dîtin ku îstîfare hem mecaz e hem jî teşbîh e.” (Saraç, 207: 118)

“Îstîfare, tiştêkî ji bilî navê xwe ji aliyê lêanînê ve bi navekî din were salixdan an jî tiştê nenasbar were şibandina tiştê nasbar e” (Erkman û Akerson, 2005: 189).

Îstîfare li gor bûyîna lefza tek an jî pir dibe du beş, yek mufret îstare ya din jî murekkep îstîfare. Mufret îstîfare jî du cûre ye; îstîfareya vekîrî (mûsarrah) û îstîfareya girtî (meknî). Di edebîyatê de ya herî tê bikaranîn îstîfare ye. Cureyên îstîfareyê yên herî tîn bikaranîn ev in:

1. Îstîfareya vekîrî
2. Îstîfareya girtî
3. Îstîfareya temsîlî (Pala, 2004: 239).

Dema li fikir û ramanên jor tê nêrîn tê dîtin ku tiştêkî ji aliyê têvelan de, bi navê tiştan şibiya be ve were gotin re îstîfare tê gotin. Bi şibîn û şibandina du hêmanên teşbîhê bi tenê yek were gotin û beşa din were qestkirin ve îstîfare çêdibe. Îstîfare di edebîyatê de wateya peyvekê derbarê peyva din ve bikaranîn e. Di hunera îstîfareyê de peyv bi wateya xwe ve bikar nabe, wateya peyvê mecazî ye. Mînak, evîndar bi berdila xwe re bi peyvên “selwa min, gula min, hîva min” hwd. tîne ziman. Bi rastî dîlber ne selwî ye, ne gul e û ne jî hîv e. Di îstîfareyê de merc e ku peyv ji bilî wateya xwe bibe navê têgehekê an jî bibe navê tiştêkî. Di vê hunerê de merc e ku peyv di wateya xwe de neyê bikaranîn.

Mela Ehmedê Cizîrî jî weke helbestvanên edebîyata klasîk ji bo gotina xwe bi awayek rind, bedew; ji bo rewşa ku agah bide, bi kelecana, bihêz be, ji bo ku huner raydan be hunera îstîfareyê li gelek cihan bikar aniye. Bi vê hunerê wateya gotina xwe bihêz û dijwar kiriye. Mela li pirê cihan qesta dîlberê bi mazmûnên wejêyî aniye ziman.

Di şûna dîlberê de padîşeh, belqîs, gul, selw, rihan, rimbaz, tîrendaz, durdane, durrê yetîm, yaqût, sedef, şervan, cellad, saqî, rind, meyfiros,,; di şûna endama dîlberê de selw, rihan dara çam, şitla gul an jî şitla rihan hwd; di şûna por û zulfê dîlberê de şev, pût, senem, çengel, zulmat; şûna dêmê (rûyê) dîlberê de wehdet, ava heyatê, sibeh, şeveq; şûna birhê dîlberê de qews, hilal, hîva nû, keman, kevan, mihrab, qabeqewseyn, secdgah, mîraç hwd.; şûna bijangê dîlberê de tîr, rim, xencer, qime; şûna nînê li rûyê dîlberê hîndû, şev; şûna lêvên dîlberê de şekir, şîrin, nûn, rê, xal, noqte; şûna diranê dîlberê sedef, durr, mircan; şûna gerdana dîlberê zozan, ziyaretgah, deşt, berf hwd. daye nîşandan. Ev teşbîh carinan bi herçar hêmanên teşbîhê carinan bi yekî carinan jî bi du an jî sê hêmanan çêkirine, bikaranîne. Evyek dide nîşan ku Cizîrî girîngiyeke mezin daye hunera teşbîh û hunera îstîfareyê.

**Îstîfareya vekirî:** “Bi tenê bikaranîna muste’arê tê çêkirin. Ji îstîfareya di nav de lefza muşebbehun bihîn bi vekirî hatibe zikirkirin û muşebbehun hatibe veşartin re tê gotin”(Bolelli, 1992: 92). “Teşbîha ku şibîna wê nehatibe gotin e. Ji ber ku şibandina wê bi awayek vekirî wateyê dide jê re îstîfareya vekirî tê gotin.” (Saraç, 2007: 119). Di Edebîyata Klasîk a Kurdî de di pirê cihan de ev îstîfare hatiye xebitandin. Mela Ehmedê Cizîrî jî di xezelên xwe de nêzê 219 heb hunerên îstîfareyê bikar anîne. Zehfên wan îstîfareya vekirî ne.

*Can û dilê min ew e **horîweşê** min ew e*

***Padîşehê** min ew e ez li derê wê **geda***

(X.2, m.5)

Îstîfareya vekirî: **horîweş**

Îstîfareya vekirî: **padîşeh**

Îstîfareya vekirî: **geda**

**Padîşeh:** Hukumdar, sultan. Di edebîyata klasîk de padîşeh bi navê: şêx, şehriyar, şahînşah, sultan, serwer, xusrew, xan, haqan hwd. tê binavkirin. di medhiyeyan de bi navê xwe yê rastî tê dayîn. Padîşehê ku bi mubalexe tê pesindayîn dibê qehremanê medhiyeyê. Lêbelê ku di xezelan de behsa padîşeh tê kirin pirê caran qesta dîlberê tê kirin. Di vê rewşê de dîlbera ku jê re padîşeh tê gotin tac, text, welat, artêş û evdên wê hene. Taybetiya padîşeh dad e. Evîndar ji dîlberê vê yekê dixwaze. Padîşehê alema maneviyatê jî derwêş in(Pala, 2015: 365).

**Geda:** Parsek, qûl, bende. Di helbesta dîwanî de herdem bi sultan re di nav hunera tezdad de tê bikaranîn. Evîndarê ku li taxa dîlberê derî bi derî didivê gedayek e. Li dijî dîlberê bi lixwekirin û xemil, jiyana ku dijî dişibe ya bendeyan. Evîndar ji vê rewşê gazinan nake. Di gedatîyê de mezintîyekê dibîne (Pala, 2015: 166).

Dîlber şibiyaye horîweşê, lê navê dîlberê nehatiye gotin. Bi gotina horîweşê qesta dîlberê hatiye kirin. Dîsa helbestvan berdila xwe weke padîşehek, xwe jî weke gedayekê dibîne. Bi peyva padîşeh û geda îstîareya vekirî bikar aniye. Di wan teşbîhên jor de: - horîweş, padîşeh, geda- hêmana şibandin hatiye dayîn lê hêmana şîbîn û hêmanên din nehatine dayîn. Helbestvan bi peyvên horîweş, padîşeh qesta dîlberê; bi peyva geda jî qesta xwe kiriye. Lêbelê behsa dîlberê û xwe nekiriye.

*Gote me **durdaneyî** em ji te û tu ji me yî*

*Lew bi heqîqet yek in mes'ele bêşubhe ma*

(X.2, m.7)

Îstîareya vekirî: **durdane**

Helbestvan bi tenê peyva durdane daye, lê belê tişta şibiyaye durdane, dîlberê, nedaye nîşandan. Ji wê yekê şa'ir "hunera îstîareya vekirî" bikar aniye. Durdane peyvek jî bo pêxemberê me hatiye bikaranîn. Wateya liba dur e. Dîlber jî aliyê qedr û qîmetî de şibayaye durdane. Ji bo bihayê dîlbera wî were nîşan ev peyv aniye ziman. Çawa qedrê peyxemberê me (e.s.) di nav gelê misliman de bêhempa be di dilê evîndar de jî dîlber bêhempa ye.

*Nêrgîza **mestî** ji bala çîmena **sunbul û gul** tê*

*Qedehê taze bi destê xwe tenê da me lebaleb*

(X.7, m.4)

Îstîareya Vekirî: **nêrgîza mestî**

Îstîareya Vekirî: **sunbul û gul**

Li gor helbestvan dîlber wek nêrgîzê pir bedew e. bedewek pozbilind e. Haya wê ji cewr û cefaya bi evîndar dide kişandin tune ye. Dilê evîndar hertim bi kul û derd e. evîndar bi agirê evînê dişewite lê dîlber tu xemê naxwe. Tu wextî bersivê nade evîna

evîndarî. Lê evîndar bi hêviya bersiva wê dijî. Dermanê evîndar bersiva evîna dîlberê ye. Helaka wî jî evyek e. Lê ne dîlber bersiv dide ne jî evîndar dev ji hêviyê berdide.

Cizîrî, bi gotina nêrgiza mestî qesta dîlbera xwe kiriye nêrgiz û navê dîlbera xwe neaniye ser ziman.

Mela Ehmedê Cizîri keziya yara xwe wekê sumbul, rûmeta wê wekê gul dîtiye. Jiber wê gotinê ji vê hunerê re “hunera istiareya vekirî tê gotin.

*Lazim bi xwe ayîneyê Rûhi l-qudus î*

*Lew kes nedîn horî bi vê ayîneyê*

(X.7, m.4)

Îstîare, Îstîareya Vekirî: **horî**

**Horî:**“Keça (qîza) bihuştê ye. Qîza ku spîtiya çavê wê ji reşayiya çavê wê pirtir be, qîza çavxezal. Quq’ana Kerîm, agah dike ku di bihuştê de horî xizmeta mu’minan bikin” (Al-îmran/15, Beqere/25, Nisa 57).

Rîwayet tê kirin ku horî ji maddeya safran, misk, enber û kafûrê hatine çêkirin. Dibe ku ev rîwayet ji bo xwedanê porê bi bîna enber û bi misk, birhê hîlal, rûyê weke rojê ronî, gotinê şîrîn re hatibe gotin. Ji ber ku horî dêm gul, dur diran, lêv mircan bejin selw, bên xweş, xûy baş, qîzên ji gulê nûtir in. Di helbesta klasîk de dîlber şibiyaye horiyê. Dîlbera ku hişê evîndar ji serê wî biriye horî ye. Di vê rewşê de taxa dîlberê jî dibe bihuşt (Pala, 2015: 212).

Horî keça ku bi bedewiya xwe nav daye, ya di bihuştê de ji bo mukafatê ji kesê mu’min re ye. Di Edebîyata Kurdî de gelek helbestvan di helbestên xwe de peyva horî bikar anîne. Haya Cizîrî ji motifên îslamî hebûye, ewî bi hunerek hosteyane mazmûnên olî bikar anîne. Ji wan yek jî peyva “horî ye. Berdila Mela wek horî bedew û nazenîn e. Di vê beyîtê de dîlber şibiyaye horiyê. Ew li ber çavê evîndar weke horiya di bihuştê de ciwan e. Weke guleke nû ye. Weke misk û enberê ye. Dîlber ji aliyê bedewiyê, bêhnê, ter û ciwantiyê, rindiya rû û dêmê xwe û ji aliyê xuyê xwe ve weke horiyê muqedes e. Ji bo vê yekê helbestvan berdila xwe şibandiyê horiyê, lê di risteya jor de navê berdilê negotiye. Bi peyva horî qesta berdilê kiriye. Di îstîareyê de heke hêmana şibîn tunebe, bi hêmana şibandin qesta hêmana şibîn were kirin jê re îstîareya vekirî tê gotin.

**Îstîfareya Temsîlî:** “Li cem hêmanên şibîn û şibandin, ji herdu hêmanan bi yekî re ji libek zêdetir hêmana aliyê (hêla) şibandin bikar were jê re Îstîfareya temsîlî tê gotin” (Pala, 2004: 240).

*Mehbûb û reyhan pur gulav ker kir li min cerg û hinav*

*Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cullabi da*

(X. 1, m. 5)

Muşebbehun bih (şibandin): **reyhan**

Cizîrî, bi peyva reyhan qesta zulfa dîlberê kiriye lê belê behsa zulfa dîlberê nekiriye. Di edebîyata klasîk de por û mûyên rûyê dîlberê dişibîne rihanê. Mela jî porê dîlbera xwe ji aliyê bêhna wê ve şibandiye rihanê. Behsa rihanê kiriye lê behsa porê nehatiye kirin. Bitenê taybetiya porê ji aliyê bêhnê ve hatiye dayîn. Di malika jor de bitenê hêmana şibandin hatiye dayîn. Ji bo vê jî vê hunerê re hunera “îstîfareya vekirî” tê gotin.

### 2.2.3. Kînaye

Armanca kînayeyê, gotinê bi awayek girtî bîne ziman e. Peyvek an jî gotinek ku bi du wateyan were gotin û famkirin, bi wateya mecazî were bikaranîn e. Di kînayeyê de wateyek rastî û yeka mecazî heye. Lê wateya peyvê ya mecazî bi ser wateya rastî dikeve. Lê ev rewş wateya rastî ji hole ranake. Kînaye bi giranî di wateya mecazî de bikar tê, evyek kînayeyê ji iham û tewriyeyê vediqetîne (Pala, 1992: 109).

Di salixê kînayeyê ku Soysal dide, tê famkirin ku Peyvek di wateya rastî de were gotin lê di qesta wateya mecazî de were bikaranîn e. Di hunera kînayeyê de tişta ku were vegotin bi navgîn tê ziman û heke ku hewce be bi wateya rastî jî tê bikaranîn.

*Ji axa asitanê mistekê bîn*

*Li daxan da bibînim xweş seba tîz*

(X.33, m. 4)

Kînaye: **dax**

Bi wateya rastî dax birîn e. Dilê helbestvan bi agirê evîna dîlberê hatiye sotin, dax bûye. Çawa mirov şîşekê bixe nav agir sor bike bi bedena jîndarekî ve deyne, awirên dîlberê jî wek şîşa di nav agir de sor dibe dilê evîndar dax dike. Bi wateya mecazî ve

dax durfê yarê, xeta li ser dêm û gerdena wê ye ku qesta wê hatiye kirin. Cizîrî wateya mecazî li pêş derxistiye.

#### 2.2.4. Mecazê Mursel

Peyvekî mirov ji bilî armanca şibînê di wateya nerastî de bikar bîne jê re mecaza hinartî tê gotin. Di vê hunerê de di navbera peyvan de şibîn tune ye. Ji vî aliyê ve ev huner ji hunera îstîfare û ya şibandîne diqete. Di mecaza hinartî de di şûna pêwenda şibîn de pêwendiyên din hene. “Di navbera wateya rastî û ya mecazî de pêwendiyên girîng hene. Ew: sebebîyet, musebebîyet, kulliyet, cuz’iyet, mahaliyet, halliyet, raborî û ya bê mirov bîne ber çavan” (Boelli, 2009: 44).

Mela Ehmedê Cizîrî di xezelên xwe de di 17 beytan de hunera Mecazê Mursel (Mecaza Hinartî) bikar anîye. Ev huner di pirê cihan, di aliyê dîlberê de agahiyê dide me. Mela bi gotina dêm, gulî, zuluf, xal, birh û çavê dîlberê qesta dîlberê dike.

*Hêstir rewan tên wek coyan tîr dan ewan reşbriwan*

***Dil wek goyanber kaşowan ser lu’lu’an bergên wereq***

(X. 48, m. 10)

Mecazê Mursel: **Dil wek goyan**

Helbestvan, bi gotina dil qesta xwe kiriye. Lewra behsa parçe were kirin qesta tevî bike an jî behsa tevî were kirin mirov qesta parçe bike jê re mecaza hinartî tê gotin.

*Zulfê siyahê bêwefa qet me nedî ji wê sefa*

*Kuştime ez bi sed cefa ahi ji dest cefayê **zulf***

*Zor û feqîr û mubtela zahid û sofî û Mela*

*Kuştime ew bi sed belakes nekevit belayê **zulf***

(X. 43)

Mecazê Mursel: **Zulf**

Helbestvanê navdar Mela Ehmedê Cizîrî di van beytên jor de bi gotina peyva zulf qesta dîlberê kiriye.



*Surrê le'lê lebê canbexşi nizanî tu bi behs*

*E'idi n'nezrete ya naziru fe's-surru deqîq*

(X. 47, m. 3)

Mecazê Mursel: **Surrê le'lê lebê canbexşi**

Bi gotina “Surrê le'lê lebê canbexşi” ve qesta dîlberê hatiye kirin. lêv perçeyek dîlberê ye. Helbestvan behsa lêvê dîlberê kiriye lê qesta wî dîlber e.

### **2.2.5. Mecaz**

Peyv heke ji bilî wateya xwe ya rastî û ya biwêjî bi wateyêke din were bikaranîn jê re wateya mecazî tê gotin.

Di wateya cihekî jê derbas bûyî de ye. Peyv ji wateya xwe ya rastî neqlî wateyek din dibe, heke karîneyê manîa yek hebe ji bo ku di wateya xwe ya rastî de were bikaranîn ew peyv bi wateya mecazî ve tê bikaranîn. Ji mecazek wiha re “mecazê luxawî” jî tê gotin. Di pirtûkên belaxetê de pirê caran wateya mecazî wiha tê dayîn: Di wateya peyvan de ji bo ku gotin xweştir, zîndetir bihêztir be mirov cudayî (cihetî) bide peyvan re tê gotin. (Uysal, 2010: 139,140 )

Mela hunera mecazî bi hunerên din re li pirê cihan bikar aniye. Mirov nikare vê hunerê bi serê xwe ji hunerên din biqetîne û ji wan cuda bide nîşandan. Ev huner bi îstîfare, teşbîh, mubalexe re hatiye dayîn. Mela di şêst û sê beytan de hunera mecaz bikar aniye.

*Camê 'îşqê pakê rûhanî tuhûra batin e*

*Ê nenoşî her we ma hetta ebed napakî rûh*

(X. 20 m. 5)

Mecaz: **camê 'îşqê**

Qedeha paqij a eşqa rûhanî tiştê batinî dişo û paqij dike. Ev gotin ne bi wateya rastî ye, bi wateya mecazî ye. Lewra qedeh bi xwe ne paqîş e, tiştêkî heram e.

*Bi mîzan qewsê mahê nû li wechê dîlberê min dî*

*Ji çêşm û goşeyê ebrû bi dor camê îşaret kir*

(X. 28 m. 3)

Mecaz: **Bi mîzan qewsê mahê nû li wechê dîlberê min dî**

Dîtina hîva nû li rûyê dîlberê hunera mecazî ye. Helbestvan bi vê gotinê qesta birhên dîlberê kiriye.

*‘Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz*

*Dê li nik sahibdilan hetta ebed bit serferaz*

(X. 32 m. 1)

Mecaz: **‘Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz**

Dibe ku bi birûska eşqa mecazî li evîndar bikeve. Heta hetayê serefraz dimîne li cem ehlê dilan. Ev gotin mecazî ye.

*Zulfên put û şîrînleban jehrî ne şubhet ‘eqreban*

*Lê min ji biska purgirê îro tinê girtin du ta îqab*

(X. 4, m. 4)

Mecaz: **îro tinê girtin du ta**

Girtina “îro tinê girtin tu ta” ve şa’ir xwe bi du tayê yara xwe girtiye. Di edebîyata klasîk de dilê aşiq pare pare ye û her parçeyek bi zulfê yarê ve dardakirî ye. Dardakirina bi zulfê yarê “hunera mecazî”ye

#### **2.2.6. Ta’rîz**

Bi armanca henekkirina (tinaz) bi rewşek an jî bi kesekî bi qesta tersê gotina peyvek an vegotinekê re “hunera tarîz” tê gotin. C. li 5 cihan ev huner pêk aniye.

*Kir şefqe mîr anîme bîr berdan mi tîr kirme esîr*

*Negha feqîr zulfa herîr avêhte şîr da pê meheq*

(X. 48, m. 6)

Ta’rîz **Kir şefqe**

Helbestvan bi gotina “kir şefqe” hunera ta’rîzê bi cih aniye. Lewra bi vê gotinê xedartiya dîlberê aniye ziman. Dîlber tu dem gunehê xwe bi evîndar nayne. Dîlber pir xedar û bêxem e. Haya wê ji evîndar heye lê tu xem nake.

## 2.3. HUNERÊN CIWANKARÎ (BEDÎ' /WATEYÎ)

### 2.3.1. Tenasub

“Tenasub, mur'atê nazîr, telfîq, tewfîq, îstîlaf. Peyvên ji aliyê wateyê de pêwendî bin di risteyek an jî di malîkekê de werin berhevkerin û werin gotin re hunera tenasub tê gotin.” (Soysal, 1998: 94)

Tenasub, di navbera du an jî ji duduyan zêdetir peyvan de ji bilî nakokî pêwendarî, aliyê wateyê de hevparî hebe û li ba hev werin komkirin ji wê hunerê re hunera tenasub tê gotin. Ji hunera tenasub re: muratê nazîr, cem'îyyet, telfîq, îtilaf, tewfîq, mutenasib hatiye gotin. Helbestvanên edebîyata klasîk vê hunerê di berhemên xwe de ji bo pêwendîya taybet a peyvan di pîrî cihan de bikar anîne. Ji bo wê ev huner di nav helbestvanên dîwanî de belav bûye (Pala, 2004:448).

Cizîrî, girîngiyek mezin daye hunera tenasubê. Di xezelên xwe de li 188 cihan hunera tenasub bikar aniye. Ewî huner bi awayek hosteyane aniye holê. Cizîrî hunera tenasub bi hunerên din re bikar aniye. Bi hunera teşbîh, îstîfâre, telmîh, teşxîs hwd. bikar aniye. Hunera tenasub pîrê cihan li ser taybetiya dîlberê ye. Carinan rasterast behsa taybetiyên dîlberê kiriye, carinan jî bi navgîn ew taybetî anîne ziman.

*Çîn çîn kirin zulfên siya kesketlesa dîbaqeba*

*Êdî nîşan nabin xwuya têkil kirin lazim seba*

(X. 3, m. 1)

### Hunera Tenasub: Çîn çîn, zulfên siya, nîşan

**Nîşan:** Xal. Xala di bedenê de tê holê ye . Di edebîyatê de bi gelemperî bi dîtina li rû, bi biçûkbûna xwe û bi reşbûna xwe pir tê behskirin. Zehftir li dêm, por, birh, mûyê biyok, û bi lêvê re tê dîtin. Xal pêşiya her tiştî noqte ye. Ji pêûsa zuluf nuqtiye rupelê bedewiyê. Dema zuluf bibe cîma peyva cemalê, nîşan jî dibe xala navenda cîmê. Carinan xal dibe dane. Di vê rewşê de dil dibe çûk por jî dibe dafik. Dêm bibe agir ev dane dişewite dibe ûd. Dîsa bi rengê reşî ve dibe filfilek û Hidîstanê jî bi xwe re tîne. Carinan hîndûyek, hebeş an jî hîndûbaxçe ye. Por ku dibe baxçevanê dêmê xal dibe hîndûyek niyetqirêj dikeve wî baxî. Dêm ku dibe pelê gulê, xal dibe perdeyek sunbulî lê weke hebeşê li ser gulê. Ew hîndûyekî şekirfiroş e bi lêvê ve. Lêv bibe şekir xal dibe mêşek li ser wê. Xal carinan li derkenarê lêvê ye, carinan li kenarê birhê û carinan jî li ser dêmê ye. Ku por bibe kafir an jî kafiristan xal dibe pûtperest. Di vê rewşê de herdu jî hemmeşreb in hem jî rengê herduya kafir (reş) e. Carinan xal dibe sultan an jî hukumdarê hebeşê. Por bibe sîdang xal dibe sultanek li wê derê bina xwe dayî. Carinan xal dibe birîn an jî dibe dax. Dêm bibe lîloz xal dibe daxeke di navenda wê de. Ev birîna daxa lîlozê ji ber dexesiya xala di navenda dêmê ye. Lêv bibe kewser xal dibe Bîlalê hebeşê di navenda bihuştê de. Ku xal li derkenarê çenê were fikirkirin dişibe harût por jî ji xwe carût e. Xal carinan enber carinan jî misk e. Xal bi pirça rû ve weke ayetek li

mishefa dêmê hatiye nivîsîn. Dîsa herdu bi hev re dişibin artêş û leşkeran. Di navbera xal û xelîl de têkilî çêdibe. (Pala, 2015: 184).

Çîn çîn, zulfên siya û nîşan peyvên derbarê dîlberê ne. Mela Ehmedê Cizîrî, bi van peyvên hunera tenasub bikar aniye. Tê zanîn ku, di navbera du an jî ji duduyan zêdetir peyvên de ji bilî nakokî û pêwendarî, ji aliyê wateyê de hevparî hebe û li ba hev werin komkirin ji wan huneran re hunera tenasub tê gotin. Ew peyvên jor jî bi hev re pêwendar in. Zuluf lûleya por e li ser rûyê dêmê dîlberê. Zuluf şev e, pût e, rûyê dîlberê wehdet e. zuluf û xal kafir (reş) in li pêşiya dêm û rûyê dîlberê. Weke hîndûyek nahêlin evîndar bigihêje wehdetê. Zuluf û xal bi hev re weke şevêk tarî rûyê dîlberê girtine û nahêlin evîndarî bibîne. Ji bo dîtina evîndar a rû û dêmê dîlberê ronahiya sibehê hewce ye. Tê dîtina ku helbestvan hersê peyvên (çîn çîn, zuluf, nîşan) bi hev re dane. Zulfê siya, çîn çîn û nîşan peyvên derbarê yarê (rûyê yarê) de ne. Ji vê yekê ev huner “hunera tenasub” e.

*Li derd û êşan peykan û nîşan*

*Me ji herdu çeşman kifş in 'elamet*

(X. 13, m. 5)

Tenasub: **êşan, peykan, nîşan**

**Peykan: Peykan:** “Temren, hesinê pîjê di sere tîrê de ye. Hesinê di serê rimê de jî re peykan tê gotin. derbarê tîrê awirê dîlberê tê bikaranîn.” (Pala, 2015: 370)

Di vê malikê de peyvên “êşan, peykan û nîşan” di aliyê dîlberê de ne. Peyv bi hev re pêwendî ne. Tîrendaz nîşan digire û tîra xwe davêje, serê tîrê bi peykan e. Tîr digihêje menzîla xwe. Heke menzîl can be diêşîne. Dîlber bi awirê xwe ji herdu çeşmên xwe, bi birhê xwe yê wek kevanê bi bijangên xwe tîrê davêje evîndar. Dilê evîndar nîşangeha dilbêrê ye. Dîlber bi awirê tîrê davêje û li ser dilê evîndar çik dibe. Serê tîrê bi peykan e. Dema tîr li ser dil çik dibe dilê evîndar bi ax û fixan bi êş û elem disote. Tê xuyan ku peyvên “êşan, peykan, û nîşan” taybetiyên dîlberê ne. Bi awirê dîlberê ve pêwendî ne.

**Nêrgiza** mestî ji bala çîmenasunbul û gul tê

Qedehê taze bi destê xwe tenê da me lebalet

(X. 7, m. 4)

Tenasub: **Nêrgiza mestî, çîmena sunbul û gul**

Ev peyv bi ev re pêwendî ne.

**Sunbul:** *Bi porê dîlberê re pêwendî (eleqeder) ye. Kulîlkek di helbesta klasîk de bi sixletî tê tîdin. Bi şîkl û bêhna xwe dişibe porê dîlberê. Hetta ji porê dîlberê dexesiyê dike û pête pê dide. Sunbul û gul pirê deman bi hev re ne. Sedema wê jî ew e ku porê sunbulê dikeve ser dêmê gulê. (Pala, 2015: 414)*

Nêrgiz, çîmen, gul û sunbul peyvên derbarê dîlber û evîndarî de ne. Dîlber bi bêxembûna xwe dişibe nêrgizê. Por, zuluf û kagulên yarê dişibin çîmen û sunbulê. Tê xuyan ku ev peyvên han bi hev re pêwendî ne.

*Nameya cewr û cefa û elem û derd û xeman*

*Dê bi destê zeriye muhteşemê Serwîsehê*

(X. 79, m. 4)

Tenasub: **Cewr, cefa, elem, derd, xeman**

Di vê malikê di risteya ewil de peyvên “cewr, cefa, derd, elem, xeman” di aliyê berdilê de ne. Ew peyv bi hev re pêwendî ne. Pêwendiya peyvên hunera rêzê dide şanîdan. Ew peyvê jor hemû derbarê evîn û evîndar de ne. Evîn bêxem e, lê evîndar li ber bêxemtîya wê hertim cewr, cefa, elem, derd û xeman dikêşe. Ev taybetî yên evîndarî ne.

*Li derd û êşan peykan û nîşan*

*Me ji herdu çeşman kifş in ‘elamet*

(X. 13, m. 5)

Tenasub: **êşan, peykan, nîşan**

Nîşan, Menzîl, hedef, armanc e. Di helbesta klasîk de nîşan bi du wateyan dertê pêşîya me. Yek: xal, ya din jî armanc, menzîla tîrê. Dilê evîndar herdem armanca menzîla awirê dîlberê ye.

Di vê malikê de peyvên “êşan, peykan û nîşan” di aliyê dîlberê de ne. Peyv bi hev re pêwendî ne. Tîrendaz nîşan digire û tîra xwe davêje, serê tîrê bi peykan e. Tîr digihêje menzîla xwe. Heke menzîl can be dêşîne. Dîlber bi awirê xwe ji herdu çeşmên xwe, bi birhên xwe yên wek kevan bi bijangên xwe tîran davêje dilê evîndarî. Dilê evîndar nîşangeha dîlberê ye. Dîlber bi awir tîr davêje û li ser dilê evîndar çik dibe. Serê tîrê bi

peykan e. Dema tîr li ser dil çik dibe dilê evîndar bi ax û fixan bi êş û elem disote. Tê xuyan ku peyvên “êşan, peykan, û nîşan” taybetiyên kirinên dîlberê ne.

### 2.3.2. Telmîh

“Di navbera gotinê de, bûyereke raborî ku ji aliyê herkesî ve hatibe zanîn, kesekî navdar, baweriyek an jî gotinek pêşiyar were nîşandan, bi peyvek, bi du peyvan were bîrhatin re “hunera telmîh” tê gotin.” (Turan, 2010: 92)

“Di helbest an jî pexşan de nîşandana bûyereke dîrokî ya girîng, rewşek, efsaneyek, pêkenînek navdar an jî çîrokek yaxut kevneşopê re hunera telmîh tê gotin.” (Soysal, 1998: 93)

Li gor ravekirinên jor, di metnekî de helbestvan an jî nivîskar bûyereke dîrokî, sedemeke kifş (eşkere), şexsiyeteke girîng, ayetek, hedîsek, gotineke pêşiyar nîşan bike jê re telmîh te gotin. Ku hunera telmîh (bibîranîn) were çêkirin mijara tê nîşandayîn bi hemû diştên derbarê xwe ve nayê dayîn, bitenê tê bibîranîn. Tiştê tê bibîranîn bi peyvek an jî du peyvan tê gotin, çavkaniya wî tiştî nayê nîşandan. Lê derbarê wî tiştî de kesê erbabê wê dizane behsa çî tê kirin.

Mela li 201 cihî de hunera telmîhê bikar aniye. Ev yek jî dide nîşandan ku Mela girîngiyeke mezin daye vê hunerê. Di pirê cihan de an bûyerên olî, kesên di dirokê de şervan û xwediyê hunerên navdar û di beşa evîne de kesê di edebîyata klasîk de cih girtiye tîne bîra me.

*Ê vi Xudrî ra divêt avê heyatê bit nesîb*

*Dê bi se'y û cehdê yeksan bin li bal wî roz û şeb*

(X. 8 m. 10)

Telmîh: **Xudrî, avê heyatê**

(Ew kesê bixwaze bi xizir re ji ava heyatê vexwe hewce ye ku bi xîretek mezin şev û bi roj qet nesekine û lê bidivê.)

**Xudrî (Xizir/Xidir):** Kesê ava heyatê vexwariye û bûye nemir e. di Qur'ana Pîroz de behsa serencama (serpêhatiya) wî û Hz. Mûsa tê kirin (kehf/59-81). Baweriyek jî ev e ku kesê di tengasiyê de bimîne Xidir bi hewariya wî ve diçe. Li gor hinekan Xidir leqeba Hz. Ilyas pêxember e.

Li gor efsaneyê, Xidir /Xizir û hevalê xwe yê Ilyas bi hev re di mahiyeta Iskenderê Zulqarneyn de mane û jê re rêbertî kirine. **Di warê zulmatê de li ava**

**heyatê geriyane.** Piştî serencamek dirêj Xizir tevî Ilyas li ser kaniyekê rûdinên, masiyê pijandî derdixin û dixwin. Wê gavê dilopek ava kaniyê bi ser masiyê destê Xizir de dirije. Masî vejîn dibe xwe qil dike nava avê. Ew jî fam dikin ke ew “ava heyatê” ye. Jê bi dilê xwe têr vedixwin. Pêştî wê xeber dabin Iskender jî ew kanî careke din nedîtine. Iskender ji ava heyatê mehrûm maye. Herwiha, Xizir û Ilyas bi emrê Xwedê li rûyê dinê digerin û kesê bikeve tengasiyê bi hewara wî ve diçin. Ew li rûyê avê dikarîbûye bidivê. Li ser behrê sicadeya xwe radixe û nimêj dike. Dema pêl erdê dike erd hêşîn dibe û bêhnxeş dibe. Bi kincên xwe yên kesk li hespek boz siwar dibe û didivê, ji bo wê jê re Xidir gotine.

Di edebîyatê de Xizir, bi ava heyatê, Iskender û zulumat ve tê dayîn. Pirê taybetiyên dîlberê Xizir bibîr tîne. Pirça rûyê dîlberê dişibe Xizir. Carinan ji dîlberê re “xizirhat” tê gotin û dîlber jê biqedirtir tê girtin. Dema evîndar di behra hêsirê dîlberê de dixeniqe ji dîlbera xwe ya Xizir hewariyê dixwaze. Ku rûyê dîlberê dibe av, pirça rûyê dîlberê dibe Xizir li ser avê bi rê ve diçe. Xizir ketiye warê zulumatê û ava heyatê ditiye, ji bo wê bûye waqîfê sîrrê. Xala li kenarê lêvên dîlberê jî Xizir e. (Pala, 2015: 204-205).

Xidir û ava heyatê di qîsseya Xizir û Ilyas de derbas dibe. li gor helbsetvan ava heyatê bidestxistinek zor e. Hewce ye ku mirov di warê zulumatê de rêwîtiyeke bizehmet bike. Bi sebir û tehemuleke mezin bigihêje ava heyatê. Ava heyatê meqsed û mirazê mirov e. Ji bo mirov wê bidest bixe divê sebreke mezin bidomîne. Ava heyatê dîlber e. Warê zulumat jî tengasî û zehmetiya di rêya evînê de ye. Ji bo mirov bigihêje dîlberê divê rêwîtiya bizehmet bide ber çavê xwe. Cizîrî bi gotina “ava heyatê” ve bûyera Xizir û Ilyas tevî Îskender aniye bîra me. Ev yek “hunera telmîh” e.

*Hacet niye cana yedê beyda bi deranîn*

*Inkara di dîn da nebit 'îcazi çi hacet*

(X. 10, m. 10)

**Telmîh: yedê beyda**

**Yedê beyda:** Destê spî. Mucîzeyek ku Xedayê Te'ala daye Hz. Mûsa ye. Mûsa bi emrê Xwedê destê xwe dixist kêleka xwe û derdixist, destê wî weke rojê dibiriqî. Ev mucîze li dijî Fir'ewn hatibû nîşandan. Di edebîyata klasîk de gelek caran hatiye bibîranîn. Di tesewîfê de “yedê beyda” sembola hêza îlahî ya derdikeve holê hatiye dîtin. (Pala, 2015: 481)

Yedê beyda, mucîzeyek e ku Xwedayê Te'ala daye Hz. Mûsa ye. Di Qur'ana Pîroz de wiha behsa vê bûyerê tê kirin.

“Sond be, me neh ayetên eşkere dane Mûsa, vêca ji îsraîliyan bipirse, dema Mûsa hat nik wan, Fir'ewn jê re got: Ey Mûsa! Ez guman dikim ku sêr li te hatiye kirin” (Qur'ana Pîroz: 185).

Helbestvan bi gotina “yedê beyda” ev bûyer aniye bîra me. Dibê ji bo ku rastî were dîtin hewce bi yedê beyda tune. Lewra tişt rast ji xwe li holê, li ber çavan e. Cizîrî bitenê behsa yedê beyda kiriye lê bûyera Hz. Mûsa û qewmê wî aniye bîra me.

*Bi Şîrînê negehit desti eger Ristemî bit*

*Dê bi bazû û milan şubhetê Firhatiçikî*

(X.11 M,2)

Telmîh: **Şîrin, Ristem, Firhat,**

**Şîrin** Qernas (qehreman) ê çîroka Xusrew û Şîrîn yaxut Ferhat û Şîrîn ê jin e. Biraziya melîkeya Ermen a Mehîn Banû ye. Piştî evîneke dramatik li ser mezê Xusrew xwe kuştîye. Di edebîyata klasîk de hem bûye mijara mesnewiyan hem jî di hinek malikên munferîd de derbas bûye (Pala, 2015: 433).

**Firhat:** Qehremanek di çîroka Ferhat û Şîrîn de derbas bûye. Ferhat, evîndarê dîlbera padişêhê Iranê, evîndarê Şîrîn e. Bi dawxaziya Şîrîn çiyayê bêstûn qûl dike. Lewra ew endazeyar û mîmar bûye. Di helbesta klasîk de ji bo evîna xwe evîndarê di rêyek bizehmet û zor dinimîne, sembolîze dike. Pirê caran bi Şîrîn û Xusrew re tê bibîranîn. Carinan jî bi Mecnûn re dertê holê.(Pala, 2015: 152)

Bi gotina Firhat û Şîrin evîna di navbera Firhat û Şîrîn de ya di çîroka wan de tê bîra me. Dibê tu weke Ferhat bi dest û milan tê çî bikî. Her çiqas di navbera aşîq û maşûq de çiya û astengî hebin jî li pêşiya evîne tu tişt nikare bisekine.

**Ristem:** Qehremanê Iranê ye. Navê wî di Şehnameyê de derbas dibe. Leqebên Rustemê Dastan, Rustemê zal, Perê Zal, Porê Zalê Zer, porê Destan, Tehemten, Heft xanê Ecem leqebê wî ne. Ristem di helbesta klasîk de sembola gernasî, êş, hêz, bêbinketî ye. Ristem, ji zayenda Cemşîd, neviyê Nêrîman û lawê hukumdarê Seyîstan û Sicîstan ê Zal e. Bi navdarbûna şerê hukumdarên Tûran û Efrasyab tevî kuştina Siyavûş û xilaskirina bindestiya Guştab tê naskirin. Ji ber ku por, rû û birhê spî bûne leqeba “Zal”. Wateya peyvê pîremir e. Bavê wî vê rewşa wî bêyotî hesabandîye. Ew avêtiye çiyayê Elbûrz. Zal ji aliyê teyrê sîmir ve hatiye xwedîkirin û mezinkirin. Ji bo wê jê re Dastan hatiye gotin. Dastan wateya dek (hîle) de ye. Ji ber vê yekê navê Ristem bi taybetiyên dekî (hîleyî) bi zulûf, birh, çav, xemze hwd. re tê gotin.(Pala, 2015: 382)

Her çiqas Ristem di çavkaniyên tirkî û yê farisî de qehremanek îranî were ravekirin jî di gelek çavkaniyên kurdî de Ristem qehremanek kurd e. Mirov dema li çîrok, dasîtan, efsane, gotinên pêşîyan û biwêjên kurdî dinêre dibîne ku Ristem di hemûyan de bi navê Ristem an jî Ristemê kal derbas dibe. Gelek helbestvan û nivîskarên kurd dema behsa qehremantiyê kirine Ristem mînak dane. Ristem bi hêzbûna xwe, bi wêrebûna xwe bi camêrtî û bi navdarbûna xwe di Edebîyata Kurdî de cihekî gelek grîng girtiye. Di folklor û Edebîyata Kurdî de cihê wî û qehremantiya wî tu kes



nagire. Ew bi nav û dengê xwe bi efsanewîtiya xwe di jiyana û dîroka kurdan de cihê xwe girtiye. Çawa Leyla û Mecnûn qehremanê ereban in, Aslî û Kerem qehremanê tirk in, ew jî weke Zenbilfiroş, weke Mem û Zin, weke Siyabend û Xecê, weke Huseyn Beg weke Ceberîkê mîrê Hekariyan qehremanek kurd ê bi qehremantiya xwe hatiye naskirin e. Di helbestên Mela Ehmedê Cizîrî, Ehmedê Xanê, Feqiyê Teyran û gelek helbestên helbestvanên kurd ên din de hatiye ser zimanî.

Mela bi gotina Ristem bûyera Ristem û qehremaniya wî tîne bîra me. Bûyerê nabêje lê peyva Ristem bibîr tîne. Di malikê de bûyera dîrokî bi sedemeke kifş (eşkere), şexsiyeta girîng a Ristem rave kiriye ji vê yekê re telmîh te gotin. Mela hunera telmîhê (bibîranîn) çêkiriye. Peyva Ristem bi hemû tiştê derbarê xwe ve nehatiye dayîn, bitenê hatiye bibîranîn. Tiştê tî bibîranîn bi peyvek an jî du peyvan tî gotin û çavkaniyên wî tiştî nayên nîşandan. Lê derbarê wî tiştî de kesê erbabê wî dizane behsa çî tî kirin.

*Min dî seba dayê seher madarê **bedrê kir du ker***

*Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfan ra teba*

(X. 3, m2 )

Telmîh: **bedrê kir du ker**

(Min di dema bayê sibehê dît ku hîvê rûyê xwe kiriye du perçe. Şeveqa sibehê Li rûyê wî bi şewqa zulufan ve zaye.)

**Şeqû'l-qemer:** Mucîzeyaya ku hîv di navê re dibe du qet e. muşrikê qureyşî di şevê tavahîv de ji pêxemberê me mucîze xwestin. Wî jî lavayî Xwedê kir û tiliya xwe bi hîvê ve kir. Hîv bû du qet û hat erdê. Piştî wê şhadetî li ser pêxemberiya wî da û ket binê pêşa wî û derket. Pey wê dîsa şhadetî anî û giha hev (*Pala, 2015: 420*).

Evîndar dîlbera xwe dema sibehê dibîne. Wê demê bayê sibehê tî û li porê dîlberê dixê. Porê dîlberê dike du perçe, dike du ker. Siha zulfên dîlberê weke şeveqa sibehê dide ser rûyê wê. Helbestvan rûyê dîlbera xwe ku zulufên wê bi ser de hatine û wê weke du perçe dide nîşandan û şibandiyê bedra du ker. Helbestvan bi gotina “bedrê kir du ker” behîtek (mucîzeyek) bûyî nîşan daye.

### 2.3.3. Îstifham

“Pirs, sîal: Ji bo bala mirov zehftir were kişandin tiştêkî bi zen an ji hîs ve were famkirin hunera bi pirsê tî çêkirin e.” (Soysal, 1998: 59)

Ji bo bal baştir were kişandin tiştê bi armanca daxwaziya gotinê ji aliyê pirsê ve were holê re hunera îstifham tê gotin. Ku hinek hîs û raman bi pirsîrînê ve werin holê baldartî didin peyvê. Ji bo îstifhamê ne hewce ye bersiv were dayîn. Pirs jî xiroş û ji hîsa dilê helbestvan tê zayîn (Pala, 1998: 121).

"Ji bo bala mirov baştir were kişandin, tiştê bi hiş an jî bi hîs were famkirin pirs were pirsîn re hunera îstifham tê gotin." (Soysal, 1998: 59)

Ji bo ku mirov gotinê bi awayek raydan, bi awayê pirsîrînê bêje re tê gotin. Armanca helbestvan ne bersiv e, armanca wî ew e ku bala xwendevan bikişîne ser tiştê vegotinê. Helbestvan carinan vê yekê ji bilî mirovan ji tiştê din dipirse. Di Zimanê Kurdî de bi peyvên pirsê û kirpê (ton) ev huner çêdibe.

Cizîrî di gelek cihan de ev huner di xezelên xwe de bikar aniye. Ewî jî bi armanca bala xwendevan bikişîne ser hinek mijar an jî tiştan ev huner bikar aniye. Pirê caran ji dîlberê dipirse. Carinan ji xwe, carinan ji dilê xwe, carcaran ji dêm, rû, kagul, por, lêv û gerdana dîlberê û carinan jî ji tiştê din dipirse. Mela di xezelên xwe de di not beytî (malikan) de hunera îstifhamê bikar aniye.

*Bi Şîrînê negehit desti eger Ristemi bit*

*Dê bi bazû û milan şubhetê **Firhati çikî***

(X.11 M,2)

Îstifham: **çi**

Di risteyekê de heke ku helbestvan ji xwe an jî ji bilî xwe ji hinekên din pirs an jî pirsan bipirse di edebîyata klasîk de jê re hunera îstifham tê gotin. Dema li vê beytê tê nêrîn helbestvan hevokek pirsê bikar aniye ji ber vê yekê ji vê bûyerê re "hunera Îstifham" tê gotin.

*Bêj ew şîrîna surperî durdaneya ez muşterî*

***Kan** 'ehd û peymanî berê bê fayde çûn şubhê heba*

(X. 3 m. 6)

Îstifham: **Kan**

Mela, ji yara xwe ehd û peymanî berê dipirse. Lê belê, ji yara wî re soz û qîrar nemaye. Jiber vê yekê jê dipirse. Dibê ew ehd û peymanî berê kanî? Elbet bersiva pirsê

bixwe dizane. Armanca pirsâ wî ne ku dîlber bersivê bide, armanca wî ew e ku bala xwendevanî bikişîne. Bi peyman “kan” “hunera îstifham” bikar aniye.

*Erzê kî dê bikirim sûretê hal*

*Ko tu wî qibleê erbabê du'a*

(X. 5 m. 3)

Îstifham: **ki**

Di van vegotinên jorê de şa'ir ji yara xwe pirsîye, gotiye ku: ji bilî te kiyê min heye ez dê halê xwe jê bipirsim? Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku Mela Ehmedê Cizîrî, hunera îstifham bikar aniye..

*Ya Reb çî turfe mêw e evrenge mey dibexşet*

*Ş'îra me tê perîşan nezma me tê muşewweş*

(X, 37 m,2)

Îstifham: **çî**

Mela ji Xwedayê Teâlâ pirsîye. Dibê: Ev çî mêwî (fêkî) yê turfande ye ku hertim mey dide? Bi vê pirsê hunera istifhamê bikar aniye.

*Kes bi dada me nepursit gilleh û dadi çî kit*

*Te nebit dadiresek beyhude firyadi çî kit*

(X. 11 m. 1)

Îstifham: **çî**

Cizîrî, dipirse, dibê heke dengê me neçe kesekî, tu kes bi dengê me nehese gilî û gazinên me ewê çî bikin. Di risteyekê de heke ku helbestvan ji xwe an jî ji bilî xwe ji hinekên din pirs an jî pirsan bike di edebîyata klasîk de jê re hunera îstifham an jî hunera pirsê tê gotin. Dema li vê beytê tê nêrîn helbestvan hevokek pirsê bikar aniye ji ber vê yekê ji vê bûyerê re “hunera Îstifham” tê gotin.

### 2.3.4 Husnê Talîl

“Bûyerek ku derketibe holê bi xeyalî an jî bi sedemek baştir/rindtir ve were girêdan re husnê talîl tê gotin.” (Kocakaplan, 2002: 47).

“Husnê Tal’lîl, ji bo bûyerek an jî rewşek bedewî/rindî bigire ji bîlî sedema wê ji tiştê sedemek were nîşandan re husnê ta’lîl tê gotin.” (Saraç, 2015: 50)

Teşbîh û Husnê Tal’lîl pirê caran ne bi serê xwe ne. Ew bi hunerên din re bikar tî. Husnê Tal’lîl tiştêkî vebirî nade nîşan. Ku şik bîne jî dibe “Şîbhê Husnê Talîl.” Ji vê hunerê re “Husnê Tewcîh” jî tê gotin. Dema di xezelên Mela de lêkolîn tê kirin dixuyê ku ewî di 86 beytan de hunera Husnê Tal’lîl bikar aniye. Mela jî weke helbestvanên edebî girîngiyeke mezin daye vê hunerê. Bûyerên nebaş bi bahaneyek qenc ve, bahaneyek xweş ve girê daye. Li gor wî sîm li ber bedewiya dîlberê bê hiş û aqil maye. Li gor wî hemû felek û ferîşte; temamî roj, stêr û bircê bi wan re li dor dîlberê digerin.

*Sîma ko numa nema li hiş sîm*

*Sîmabê ji xucle ma ji îxrac*

(X. 16 m. 8)

Husnê Ta’lîl: **Sîma ko numa nema li hiş sîm/ Sîmabê ji xucle ma ji îxrac**

Li gor Mela, dema ku sîmê bedewiya rûyê dîlberê dît ji ber hesûdiyê di serê wê de hiş û aqil nemaye. Ev bûyer ne tiştêkî rast e. Helbestvan di vê beytê de ji bo bedewiya dîlberê bide nîşandan bahaneyeke xweşik aniye holê. Lewra rûyê yarê wek sîmê diteyise. Spî û nazik e dêmê dîlbera helbestvanî. Ji bedewiya dêmê dîlberê sîm hesûdî dike û mat dimîne. Di edebîyata klasîk de bûyerek bi bahaneyeke xweş were ziman jê re Husnê Talîl tê gotin. Derbarê vê mijarê de Kocakaplan jî wiha difikire: “Bûyerek derketibe holê bi xeyalî an jî bi sedemek baştir/rindtir were girêdan re husnê talîl tê gotin.” (Kocakaplan, 2002: 47).

Di risteya duyemîn de Mela, dîsa jî bahaneyeke xweş tîne ziman. Li gor wî, ava sîmê (avsîm) li ber bedewiya dêmê dîlberê ji şerma xwe derneketiye derve. Lewra bedewiya sîmavê li ber bedewiya dîlbera helbestvan temirandî maye. Evyek tiştêkî ne rast e, Mela evyek di xeyala xwe de çêkiriye û bi bahaneyeke xweş, bahaneyeke bedew daye nîşandan. Vê yekê Hunera Husnê Tal’lîl aniye holê.

*Dora qemerê ji ber şefeq da*

*Ku spêde li ferqê ser niha tac*

(X. 16 m. 10)

Husnê Talîl: **Dora qemerê ji ber şefeq da/ Ku spêde li ferqê ser niha tac**

Di vê dumalikê de di risteya yekemîn de şefeq weke taceke spî li ser serê dîlberê ye. Şewq û şemala dîlberê bi ronahiya xwe dora hîvê ronî kiriye. Helbestvan ronahiya şeveqê û tava hîvê bi bedewiya dîlbera xwe ve girê daye. Eva tiştêkî xweşik e. Ev bûyer bi bahaneyeke xweş hatiye şanîdan. Ji ber vê sedemê ev huner Hunera Husnê Ta'lîl e.

*Çerx e felek û melek dibazin*

*Şemsun we-kewakibun we ebrac*

(X. 16 m. 11)

Husnê Talîl: **Çerx e felek û melek dibazin/Şemsun we-kewakibun we ebrac**

Helbestvan dîsa bedewiya dîlberê bi awayek hunerî nîşanî me dide. Li gor wî hemû felek û ferîşte; tamamê roj, stêr û bircên bi wan re li dor dîlberê digerin. Dîlber di navêndê de ye. Her tişt li dor wê ye. Ev xeyal û bahaneyê xweşik li gor helbestvan e. Helbestvan, sazûmana di navbera felek, ferîşte, roj, stêr û bircan de bi bedewiya dîlberê ve girê daye.

*Mir'atê sikenderî li pêş e*

*Behrun we-lehel 'ukûsu emwac*

(X. 16 m. 9)

Husnê Talîl: **Behrun we-lehel 'ukûsu emwac**

Di vê derê de, ji ber bedewiya yarê derya hatiye eşqê û çoš bûye. Tê zanîn ku dema ba were derya bihêz dibe, pêl bi pêl lêpê wê tîn. Lê belê Mela ev yek bi sedema bedewiya dîlberê ve girê daye. Li gor wî derya ji ber bedewiya berdila wî bipêl dibe. Ev tişt bahaneyeke xweşik e.

*Zuhre bi qeranê qabê qewseyn*

*We'n-necmu iza hewa bi midrac*

(X. 16 m. 12)

Husnê Talîl: **Zuhre bi qeranê qabê qewseyn/ We'n-necmu iza hewa bi midrac**

Di vê derê de, li gor Cizîrî, li ber bedewiya dîlberê stêra zuhre nêzîkî herdu qewseynan (kevanan) disekine û stêra sureyya jî li aliyê rojava disekine, berê xwe dide cihê rojê, diçe ava.

*Îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e 'îd*

*Ez tinê mehrûmê dîdar im bi sed menzil be 'îd*

(X. 25 m. 1)

Husnê Talîl: **Îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e 'îd**

Li gor Mela, herkes ji bo dîtina yarê cejnê pîroz dike. Yara evîndar tiştêkî pîroz e. Sedema pîrozbûna eydê dîtina cejna dîlberê ye. Mela vê yekê bi bahaneyek xweş, bi awayekî xeyalî nîşan daye. Li gor wî sedema pîrozbûna iyde ne sedemek olî ye. Sedema pîrozahiya iyde dîtina dîlberê ye. Sedema rastî bi sedemek xeyalî ve bi bahaneyeke bedew, xweş ve daye girêdan. Ev girêdana bahaneyên xweş, bahaneya bedew hunera husnê talîl çêkiriye.

### **2.3.5. Îrsalê Mesel**

“Ji bo ku gotin bihêz be, ramanek were peyîtandin û bawerkirin ji helbestvanekî navdar an jî nivîskaran bi gotinên mînakî –wecîzayan\_ bi gotinên pêşiyên vegotina hunerî ye” (Soysal, 1998: 519).

Di helbestê (nezmê) de an jî di pexşan (nesîr)ê de bikaranîna ji bo ku vegotin zeximtir, bi bawertir be gotina pêşiyên an jî peyveke bi hikmet, (metelok) pirûpendiyek e. Ji vê hunerê re îradê Mesel jî tê gotin. Hinek caran ji bo ku vegotin bi bawertir be di şûna gotina pêşiyên de fikrên bi hikmet jî beşdarî vê hunerê dibin. Ev huner li 5 cihan hatiye ziman.

*Bi dînarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî*

*Kesê Yûsif firotî wî di 'alem da xesaret kir*

(X. 28, m. 7)

Îrsalê Mesel: **Bi dînarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî**

Îrsalê Mesel: **Kesê Yûsif firofî wî di ‘alem da xesaret kir**

Di malika jor di risteya duyemîn de gotina pêşiyên bikar hatiye. Ev gotin ji bo kesê bo sûd (menfe’et) a xwe bêbextiyên bike. Ew hertim zîrarê dibîne. Tiştek dibe ku li ber çavan bikêr were xuyan lê li pişt perdeyê ew tişt ne wisa ye. Serê ewil dibe mirov bûyerek pê dilşad be were xuyan lê di dawiyê de zîrarê dide mirov. Tiştê dawî xîsarê tîne bîra mirov.

Gotina “bi dînarê dinê zîhar ve xwe firoşî” gotina pêşiyên e. Ev gotina pêşiyên ji bo kesê bêaqil tê gotin. Kesê ku ji bo tiştek dawî pûç, bo tiştek bêfeyde karekî bike re tê gotin.

### 2.3.6. Mubalexe

Ji bo ku bandora peyvê were zêdekirin tiştekî qasê xuyana (dîdara) xwe bi awayek pirole pirtir an jî hindiktir were diyarkirin re hunera mubalexe (pirole)tê gotin. Pirole heke bi awayê hiş (eqil) be jê re **teblîx**; li gor eqil be lê belê tiştekî nebûyî be **îxraq**; dûrî eqil û kevneşopê be **xûlûv** tê gotin. Hunera pirole di nav hunera îstîfara, îxraq û kînyayê de cih digire. Ev huner ji aliyê belaxatîyên kevin de bi navê “mubalexeyê meqbûle” hatiye ziman. Eveyk jî dide nîşan ku “mubalexeya meqbûl nebe” jî heye. (Saraç, 1994: 105)

Li gorî vê xebata li ser hunerên di xezelên Mela de hatiye kirin di şêst beytî de hunera mubalexe (pirole) hatiye dîtin.

***Dêl me hezar in te di bendê welê***

*Leyse lena ‘enke mecalu bedîl*

(X. 53, m. 4)

Mubalexe: **Dêl me hezar in te di bendê welê**

Hebûna bendeyan bi hezarî tiştekî mubalexe ye. Çumkî hezar heb bende di holê de tune ne. Helbestvan tiştekî ji xwe pir zêdetir daye nîşandan.

*Mehbûb bi ‘eynê kewkeb in reqsa ku tê dilber hebin*

***Sed can giramê min hebin bavême rê erzan e reqs***

(X. 39, m. 4)

Mubalexe: **Sed can giramê min hebin bavême rê erzan e reqs**

Bi rastî sed canê mirov tune ne. Her mirovek canekî wî heye. Ê Mela jî canekî wî tenê heye. Lê Mela xwe sed canî dide nîşandan an jî ger sed canê wî hebin jî wan canan di rêya dîlberê de dide. Ev tiştêkî mubalexe ye.

*Ew cefa çû der ji hed **zulma te bir hetta bi Çîn***

*Rehmkê carek nekî hey zalim ev azari bes*

(X. 36, m. 10)

Mubalexe: Ew cefa çû der ji hed **zulma te bir hetta bi Çîn**

Cewr û cefaya dîlberê ji hedê xwe derbas bûye, zulma wê gihiştiye heta Çînê. Gihiştina zulmê ya heta bi Çînê mubalexe ye. Lewra helbestvan bi vê gotinê hîsên xwe bi awayekî pirole daye nîşandan.

*Hêstir rewan tên wek coyantîr dan ewan reşebriwan*

*Dil wek goyan ber kaşowan ser lu'lu'an bergên wereq*

(X. 48, m. 10)

Mubalexe: **Hêstir rewan tên wek coyantîr** dan ewan reşebriwan

Çûyîna hêsiran ji çavê evîndar dikişe weke coyan bi awayek zêdetir hatiye ziman. Çumkî çûyîna hêsiran weke ava cihokan tiştêkî dûrê aqil e, ne rast e. Mela li vê derê çûyîna hêsirên xwe şibandine ava cihokan û bi awayekî mubalexe rave dike.

### 2.3.7 Lef û Neşr

Wateya peyvê komkirin û belavkirin e. Du an jî ji duduyan zêdetir peyv an jî gotin di risteya ewil de were gotin û di risteya peyre de di wateyek pêwendiyên wan de were gotin re “lef û neşr” tê gotin. Ev huner di armanca dirûvîn (şibîn) de nayê bikaranîn (Kocakaplan, 2005: 96).

Heke peyv an jî vegotin di risteya ewil û ya pey de rû bi rû bin jê re *lef û neşrê muretteb*; ku wateya wan di herdu risteyan de ne di rêzekê de bin, tevlihev bin, jê re *lef û neşrê xeyrî muretteb tê gotin*. Mela di yanzdeh malikan de hunera lef û neşir bikar aniye.

*Herdu birhên te ne Mihrêbi çi **îman** û çi **kufr***

*Bûd û nabûd ku yek in ev çi **sewab** û çi **îqab***

(X. 6, m. 11)



Lef û Neşra Mureteb: **îman û kufr, sewab û îqab**

Helbestvan di risteya yekemîn de” îman û kufr”, di risteya duyemîn de “sewab û îqab” bikar aniye. Îman baweriya bi rastiyê ye, kufr perdeya li ser rastiyê ye. Îman rastiyê dide nîşandan, kufr tişta rast vedişêre. Di aliyê ravekirinê de îman dîtina rastiyê ye, kufr veşartina rastiyê ye. Di risteya duyemîn de sewab û îqab hatine dayîn. Sewab tişta rast e, bi dîtina rastî tê karkirin. Îqab jî ji rastiyê dûr e, sewab xêr e û îqab guneh e.

Di risteya pêşiyê de du an jî ji duduyan pirtir peyv û di risteya peyre jî hinek peyv bi hev re eleqedar bin ji vê bûyerê re hunera Lef û neşr tê gotin. Lef û Neşr hunerek edebî ye. Di malika jor de” îman û sewab kufr û îqab” pêwendiya wan bi hev re heye. Ev peyv bi awayek birêzik hatine bikaranin. Ji vê hunerê re hunera “Lef û Neşra Mureteb” tê gotin.

*Li derd û êşan peykan û nîşan*

*Me ji herdu çeşman kiş in ‘elamet*

(X. 13, m. 5)

Lef û Neşra Mureteb: **êşan, peykan, nîşan; Me, herdu çeşman, ‘elamet**

Di vê malikê de peyvên “êşan, peykan û nîşan” di aliyê dîlberê de ne. Peyv bi hev re pêwendî ne. Tîrendaz nîşan digire û tîra xwe davêje, serê tîrê bi peykan e. Tîr digihêje menzîla xwe. Heke menzîl can be dêşîne. Dîlber bi awirên xwe ji herdu çeşmên xwe, bi birhên xwe yên wek kevan bi bijangên xwe tîran davêje dilê evîndarî. Dilê evîndar nîşangeha dilberê ye. Dîlber bi awiran tîran davêje û li ser dilê evîndar çik dibe. serê tîrê bi peykan e. Dema tîr li ser dil çik dibe dilê evîndar bi ax û fixan bi êş û elem disote. Di malika jor de” **êşan peykan û nîşan**”, **Me, herdu çeşman, ‘elamet**” pêwendiya wan bi hev re heye. Ev peyv bi awayek birêzik hatine bikaranin. Ji vê hunerê re hunera “Lef û Neşra Mureteb” tê gotin.

*Meşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da*

*Da ‘işqi hil bit pêli pêl qelbê me pê cellabi da*

(X. 1, m. 1)

Lef û Neşra Mureteb: **meşate, çengalê zulfan / işsq, cellabi**

Di malika jor de Mela Ehmedê Cizîrî, di risteya ewil de **meşate, çengalê zulfan di** risteya din de jî **işq û cellabi** aniye ziman. Di navbera van peyvên de lef û neşr a mureteb heye. Lewra “meşate û “işq”, “çengela zulf” û “cellabi” di edebiyata klasîk de wateyên wan bi hev re pêwendî ne.

*Qulzemê ‘işqê ji bayê xwe muxalif demekê*

*Di hemamatê ‘ecacê me li ser destê xurab*

(X. 6, m. 7)

Lef û Neşr: **Qulzem, ba û hemamet ‘ecac, xurab**

Di beyta jor, di risteya ewil de “qulzem û ba” di risteya dawiyê de “hemametê ecac û xurab” bi hev re pêwendî ne. Lewra keştî li ser deryayê diçe; ba ku bi lez were bahoz derdikeve. Ji ber vê yekê qulzem û ‘ecac; ba û xurab bi hev re eleqeder in. Di risteya pêşiyê de du an jî ji duduyan pirtir hinek peyv; di risteya piştî wê de jî hinek peyv bi hev re eleqeder (pêwendî) bin ji vê bûyerê re “hunera Lef û neşr” tê gotin.

### **2.3.8. Tezad**

Di wateyê de du heb peyvên nakokî (dijminane) bi hev re werin bikaranîn re tezad tê gotin. Ji bo ku hunera tezad were holê bi tenê peyvên nakokî li pey hev werin nabe. Hewce ye ew di xalekê de bi hev re bin.

Li gor Pala, “Tezad; di navbera du raman, hes û xeyalan de wesif û hevşibiyê li dijî hev bin re tê gotin” (Pala, 124).

Di hunera tezad de peyvek bi xiroş were gotin peyva dijî wê jî tê hişê însan. Ev herdu wateyên dijî hev bi awayek kelecânî tînin gotin. Hunera tezad bi navê mutabeqat, tîbaq, tatbîq, mustezad teqafû ve jî hatiye gotin. Mele Ehmedê Cizîrî di xezelên xwe de hunera tezad (nakokî) bi xebatek serkeftî ve û di 45 cihan de bikar aniye.

*Can û dilê min ew e horîweşê min ew e*

*Padîşehê min ew e ez li derê wê geda*

(X. 2, m. 5)

Tezad: **padîşeh û geda**

Padîşeh û geda ji aliyê wateyê ve li dijî hev in. Padîşeh kesekî sayedar e, xwediyê lutf û ihsanê ye, hukumdar û sultan e. Her tişt bi saya wî dibe; Geda, Parsek e, qûl e, bende ye. “Di helbesta dîwanî de geda herdem bi sultan re di nav hunera tezdad de tê bikaranîn.”(Pala, 2015: 365) padîşeh xwediyê fermanê ye, lutufkar e; geda emirqûl e hewceyê lutf padîşehî ye. Jiber vê yekê di edebîyatê de me’neyên wan ne yek in, Dijî hev in, Ev têgeh di dîwana klasîk de hatine ziman. Dema behsa geda were kirin padîşeh tê bîra mirov; behsa padîşeh were kirin geda tê bîra mirov.

Cizîrî, hunermendê huneran û mîrê helbestê, çawa di hemû helbestên xwe de bi awayek hosteyane hunerên edebî bikar anîne. Di hunera tezdad û hunerên din de “şah û geda li pirê cihan bi hunermendî hatiye holê. Dîlbera xwe weke padîshekî dibîne û xwe jî weke gedayekî, weke bendeyekî dibîne.

*Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed*

*Wahid û ferd e bi zatê xwe wî nînin çu ‘eded*

(X. 24, m. 1)

**Tezad: ezel, ebed**

Li gor helbestvanî sirra yekîtiya Xweda ji ezel (berê ve) girtiye heta ebed (bêdawi). Peyvên ezel û ebed di aliyê wateyê de li dijî hev in. Ev peyv di risteyekê de bi awayekî xiroş hatine bikaranîn. Mela, bi peyvên “ezel û ebed” hunera tezdad bikar aniye.

*Lam’îa husn û cemalê dê ji ‘ilmî bête ‘eyn*

*‘îşqî da jê hilbitin kê dî heqîqet bêmeceaz*

(X. 32, m. 3)

**Tezad: heqîqet, mecaz**

“Heqîqet û mecaz” du peyvên dijî hev in û di risteya jor de bikar hatine. Meczaz, peyvek ji xêncî wateya xwe ya rastî di wateyê de din de were bikaranîn re tê gotin. Tiştê mecaz durrî rastiyê ye. Dibê Çawa ji zanistiyê eşq derkeve tiştêk namîne, zanistî bê evîn nabe, heqîqet jî bê mecaz nabe. Di nav her zanistiyê de eşq, di nav her heqîqetê de jî mecaz heye. Li gorî vê yekê peyva heqîqet û mecazê wateyên wan li dijî hev in.

*Herdu birhên te ne Mîhrêbi çi îman û çi kufr*

*Bûd û nabûd ku yek in ev çi sewab û çi ‘îqab*

Tezad: **îman û kufr,**

Tezad: **sewab û 'îqab**

Du peyv heke ji aliyê wateyê ve dijberî hev bin ji wan re nakokî, an jî tezdad tê gotin. Di aliyê me'neyê de îman û kufr, sewab û îqab nakokî ne. Me'neya îmanê bawerî bi rastiyê ye, kufr jî perdeya li ser rastiyê ye. Îman rastiyê dide nîşandan, kufr jî tiştê rast vedişêre di aliyê ravekirin û veşartinê de peyva îman û kufr dijî hev in.

Di risteya duyemîn de sewab û îqab bi hev re nakokî ne. Sewab tiştê rast e, îqab jî ji rastiyê dûr e. Sewab xêr e îqab guneh e. Li gor wateya risteyê sewab û îqab dijî hev in.

### 2.3.9. Tewriye

Bi sedema nukteyê (qerfek) ve gotinek bi wateya rastî an jî mecazî – ji bilî wateya nêzik- qesta wateya dûr were kirin e. Tewriye bi çar hêmanên bingehê tê dayîn: Tewriyeyê Mucerede, Tewriyeyê Mureşşeha, Tewriyeyê Mubeyyene, Tewriyeyê Muheyyî (Soysal, 1998: 108).

Di malikek an jî risteyekê de gotinek an jî peyvek du an jî sê wateyên wê hebin û bi wateya wê ya nêzik were gotin lê qesta wateya dûr were kirin re hunera tewriye tê gotin. Helbestvanê nemir Mela di xezelên xwe de di diwanzdeh malikan de hunera tewriye bikar aniye.

*Carekî gohtî Nîşanî ne **Mela** yî were banî*

*Ev dixwast me ji dil û can dehen û kame lebaleb*

Tewriye: **Mela**

Dîlberê ji helbestvan re gotiye tu Mela yî kerem bike were jorê. Peyva Mela di du wateyan de hatiye bikaranîn: yek; Mela, kesê xwedanê ilmê, kesê li pêşiya gel di mizgeftê de nimêj dike, du; Mela mexlesa Cizîrî ye. Wateya nêzik di me'neya yekemîn de ye, wateya dûr a ku qest dike ya duyem e. Dîlber ne ji ber melatîyê wî keremî jor dike. Leqeba wî mela ye û wî keremî jora dilê xwe dike.

*Birhên ji qewsê qudret **nîşane** kir **Nîşanî***

*Lam'î ji ber dibarin çî yengiyek we perweş*

Tewriye: **Nîşan**

Peyva “nîşan” bi sê wateyan hatiye bikaranîn:

1. Bi wateya tiştêkî ku mirov ji xwe re kifş ke ye. Evîndar herdem sekran û sermest e. Ji ber evîna dîlberê herkes wî nas dike. Herwiha dirfa eşqê li ser endamê aşiq e.

2. Menzila, armanca tîrê. Bîrhên dîlberê tîr in ji evîndarî re. Armanca wan tîran dilê evîndar e. dîlber çiqas awiran bide evîndar ewqas dilê wî dibe bîrîn lê ew bi halê xwe dilşad e.

3. Mexlesa helbestvanê nemir Mela Ehmedê Cizîrî ye. Helbestvan ji bilî Mela mexlesa “Nîşanî” jî bikar aniye.

Ev peyv bi sê wateyan hatiye holê û qesta wateya dûr hatiye kirin. Bi wateya nêzîk, helbestvan dibê ew bîrhên ji qewsê qudret nîşan li ber xwe, nêzî xwe da nîşan, rabe kir. Di wateya dûr de jî dibê dîlberê bi bîrhên xwe yê kevan Nîşanî nîşan de. Yanî dîlber bi tevgera bîrhên xwe Evîndar, Mela, nîşan de. Wateya din jî, li gor edebîyata klasîk birha dîlberê kevan e. bijangê dîlberê tîr e. Armanca tîrê dilê evîndar e. Li gor vê wateyê dîlber bi bîrhê xwe yê kevan (Bîrhên ji qewsê qudret) awirek daye evîndar, bi awirên xwe tîra eşqê li ser dilê helbestvan çik kiriye. Dilê helbestvan bûye nîşangeha awirên dîlberê. Dema li peyva “nîşanî” tê nêrîn ev peyv bi sê wateyan hatiye holê: mexlesa Mela Ehmedê Cizîrî, nîşana li bedena mirov, û armanc (nîşangeh). Mela Qesta herî dûr qesta mexlesa xwe kiriye.

**2.3. 10. Îqtîbas**

Di helbestê (nezmê) de an jî di nivîsê (nesrê) de ji bo gotin bi hêz be, ji ayet an jî ji hedîsan mînak werin girtin re hunera îqtîbas tê gotin. Ji wan ayet an jî hedîsên ku jê tîr girtin ji bo li qaliba weznê were, hinekî cihêtî, cudahî tê kirin. Li gor Soysal û Pala “Hunera Îqtîbas wiha ye:

*Îqtîbas di navbera xwe de bi du cureyan tê dayîn: “ Îqtîbasê tam, îqtîbasê naqis.” Îqtîbasê tam, heke ku hedîs an jî ayetek bi temamî were dayîn; Îqtîbasê Naqis, ji peyvek an jî du peyvên ayet an jî hedîsekê were dayîn re tê gotin (Soysal, 1998: 48).*

*Di helbestê de peyvek an jî hevokek aydê yekî, bi wateya giştî an jî ya nêvî were girtin û were veguhastin e. Bi taybetî ayet, hedîs, kelamê kîbar û gotinên helbestvanên din îqtîbasê tînin holê. Îqtîbas zehfir ji bo ramanê xurt û bi hêz ke, gotinê bedew ke tê bikaranîn (Pala, 1992: 119).*

Mela di xezelên xwe de di hîvdeh cihan de hunera îqtîbas bi awayek hunermendî, bikar aniye.

*Husna te nizanîm bi çi teşbihê bikim*

*Fî ehzeni teqwîm lew hatiye tefsîrê*

(X. 82, m. 3)

**Îqtîbas: Fî ehzenî teqwîm**

Mela, ev gotin ji Qur'ana pîroz ji Sûretê Tîne hilbijartiye. Xwedayê Te'ala wiha dibêje: "Bi rastî me jî insan di şeklê herî rind û tekûz de afirandiye." (Qurana Piroz A Kurdî, 2015: 406) Helbestvan bedewbûna dîlberê bi ayeteke Quranê tîne ziman. Li gor wî çawa berhemên hunermend hostatiya wî û mezintiya wî dide nîşandan rindî û bedewiya dîlberê jî mezintiya Xweda dide nîşandan. Çumkî Xwedayê Te'ala ku navekî wî jî sanî' e, dîlber di nav temamê mexlûqan de û herî rind û tekûz afirandiye. Bedewiya wê bi tenê bi tefsîra ehzenî teqwîm tê kirin. Evyek hunera îqtîbas e. Lewra ev gotin ji ayetê hatiye girtin.

*Li yetmeinne qelbî 'eynu lyeqîn dibexşet*

*Eynu l'eyan divêtin kafî nehin dîrayet*

(X. 12, m. 10)

**Îqtîbas (Jêgirtin/Jê wergirtin): 'eynu lyeqîn, 'Eynu l'eyn**

Di vê malika jor de li du cihan hunera "îqtîbas" hatiye bikaranîn..

'Eynu lyeqîn:

Ku muraqebe were kirinê di ewliyayan de hinek halên ku hasil bibin jê re 'ilmu l'yaqîn; di dil de şewqek biteyise jê re 'eynu lyaqîn; bi exlaqê Xwedayê Te'ala were bi exlaqkirinê hequ lyaqîn tê gotin. Ya dîn jî Eynu l'eyan e.

*Barî ji we'ellem ku xeberdari kirîn*

*Îro tu bizan ademê esma yim ez*

(X. 31, m. 2)

Mela, gotina “we’elleme, ademê esma”ji Quranê hildaye. Dibê ez ademê esma me. Xwedê îro sirra we’ellemel esma bi min eşkere kiriye. Ev gotin ji ayeta Sûretê Beqere hildaye. Wiha dibêje Rebê ‘alemê: “Xwedê navê temamê tiştan bi adem dan hînkirin. Paşê ew tişt bi melayîketan dan û ji wan re got, eger bera hûn rast dibêjin; de navê wan tišta jimîn re bibêjin.” (Qurana Piroz A Kurdî, 2015: 8).

*Tu ji nusxeê tewhîdê mexûn ayeta nefyê*

*Bê aletê isbatê ku îlla yim ez*

(X. 31, m. 8)

Îqtîbas: Tu ji **nusxeê tewhîdê** mexûn ayeta **nefyê**, Bê aletê **isbatê** ku **îlla** yim ez

Mela, di malika jor de behsa Qur’ana pîroz û ayetên wî dike. Dibê bi tenê ayetên nefyê nexwîne, ayetên isbatê jî bixwîne. Ew hebûn helbestvan her çiqas dîlber qebûl meke jî weke ayetên isbatê rastî ye. Mela ev gotin ji Sûretê Nîsa, ayeta 153; Sûretê E’raf, ayeta 33 û Sûretê Rûm, ayeta 35an hilbijartiyê.

### **2.3.11. Tecahulê Arif**

“Bi sedema çêkirina nuqteyekê (qerfek) tiştê ku ji aliyê herkesî were zanîn li hemberê wî tiştî weke ku mirov nizanibe were ravekirin re hunera “Tecahulê Arif” tê gotin.” (Soysal, 1998: 85).

Tiştê ku ji aliyê herkesî ve were zanîn lê helbestvan mîna kes pê nizanibe radan be jê re têcahulê arif tê gotin. Di vê hunerê de divê misoger ji van peyvên di yekî de nuqte çêbe, heyirandin, Pesinandin, piçukdiyîn, mezindiyîn, bêrûmetkirin bilindkirin hwd. Mela Ehmedê Cizîrî, Li bîst û sê cihan ev huner bikar aniye.

*Min dî seher şahê Mecer lebsê di ber mexmûri bû*

*Ew dêmzerî surmuşterî ya Reb perî ya horî bû*

(X. 71, m. 1)

Tecahulê Arif : ya Reb **perî ya horî** bû

Mela berdila xwe ya wek şahê mecer sibeşû bi çavê mexmûrî dibîne, lê wê nas nake, dişibîne perî û horiyên. Ji Xwedê dipirse ka berdila wî perî ye an jî horî ye. Mela

vî tiştî dizane lê ji bo ku berdila xwe bilind bike xwe li nezantiye datîne. Evyek nezantiya bizanîn e.

### 2.3.12. Îstixdam

Di beytek an jî risteyekê de peyvek hem bi wateya rastî hem jî bi wateya mecazî were bikaranîn re tê gotin. Ev peyv carinan tekrar dibe carcaran jî caran di şûna wê de cînav tê bikaranîn. Di metnê de îşareta herdu wateyan jî heye. Mela jî di xezelên xwe de hinek peyv di wateya rastî û mecazî de bikar anîne. Di heft malikan de em rastî vê hunerê tên.

*Birhên ji qewsê qudret **nîşane** kir **Nîşanî***

*Lam 'î ji ber dibarin çi yengiyek we perweş*

(X. 37, m. 14)

Îstixdam: **Nîşan**

Peyva nîşan hem di wateya mexlesa helbestvan de hem jî di wateya nîşangehê de hatiye bikaranîn. Wateya mecaz û ya rastî bi he re bikar hatiye

*Cewrê hindî dê kişînit her kesê **tawûs** divêt*

***Gewher û durra yetîm** bê terki ser têtin teleb*

(X. 8, m. 12)

Îstixdam: **Durra yetîm**

Di vegotina “dura yetîm” de du wate hene. Yek birastî ye ya din jî mecazî ye. Dura yetîm hem ji bo pêxemberê me Hz. Mihemmed hatiye gotin hem jî di wateya mecazî de dîlber şibiyaye dura yetîm. Ku wateyek hem bi maneya rastî hem jî bi maneya mecazî, bi herdu maneyan were bikaranîn di edebîyatê de jê re “îstixdam tê gotin. Di xezelên Mela de 6 heb hunera îstixham bikar hatiye.

*Carekî gohtî **Nîşanî** ne **Mela** yî were banî*

*Ev dixwast me ji dil û can dehen û kame lebaleb*

(X. 7, m. 8)

Îstixdam: **Mela**



Dîlberê ji helbestvan re gotiye tu ne Mela yî were jorê. Peyva mela di du wateyan de hatiye bikaranîn: yek; Mela, kesê xwedanê ilmê, kesê li pêşiya gel di mizgeftê de nimêj dike, ya din jî; Mela ye. Ev yek mexlesa Cizîrî ye.

### 2.3.13. Têdrîc

“Di gotinê de hîsek, fikir û ramanek dema ku were gotin bi rêzekê ve qedemeya wî were zêdekirin an jî kêmkirin Hunera Têdrîc e” (Soysal, 88). Derecekirina wateya di riste an jî malikê de qedeme qedeme were kêmkirin an jî zêdekirin e. Cizîrî li 6 cihan ev huner bikar aniye.

*Xudrê bi remz û mu'cizî mestî me dî di dengizî*

*Hatî peyaleyek di dest eşkere sed peyale kir*

(X. 27, m. 7)

Têdrîc: Hatî **peyaleyek** di dest eşkere **sed peyale** kir

Bi gotina peyalek bi sed peyale kir ve hunera têdrîc hatiye kirin.

### 2.3.14. Têkrîr

“Peyvek an jî ji peyvek pirtir peyv ji bo hêzê bide wateyê, bi sixletî hema hema di her rîsteyê de were tekrarkirin re” hunera têkrîr” tê gotin.” (Soysal, 1998: 91)

Dema li fikrê lêkolîner M Orhan Soysal ê derbarê hunera têkrîr tê nêrîn tê xûyan ku ev huner, di çekûyek de ji bo gotineke raydartir were kirin peyv an jî gotin di rîsteyê an jî di malikê de werin dubarekirin (carîkirin) re hunera Têkrîr tê gotin. Ji vê hunerê re têkrîr an jî “husnê têkrîr” tê gotin. Ew xezelên bi hunera têkrîrê werin nivîsîn jê re “xezela mukerrer” tê gotin. Cizîrî li 163 cihan hunera tekîr bikar aniye.

*Te'ale l-lah zehê husna mûbarek*

*Tebarek sed tebarek sed tebarek*

(X.50, m.1)

Têkrîr: **Tebarek**

Peyva “Tebarek” di malika jor de di pênc cihan de hatiye carîkirin. Carîkirina peyva “tebarek” bi dubarekirinê hêz daye wateya malikê.

*Aferîn sêdaferîn hê min ji wan ra aferîn*

*Ê ji tîrên dilberan daîm di dil peykan û gaz*

Tekrîr: **aferîn**

Peyva aferîn li sê cihan hatiye dubarekirin. Ji dubarekirina peyvan re hunera tekrîr tê gotin.

*Çi zeman û çi mekan û çi cihat û çi hudûd*

*Çi meqadîr û tefasîl û hisab in çi 'eded*

( X. 24, m.11)

Hunera Tekrîr: **Çi**

Peyva “çi” di malika jor de di pênc cihan de hatiye carîkirin. Armanca carîkirina peyva “çi” bi dubarekirinê hêz bide wateya malikê. Helbestvan bi dubarekirina peyvê bala me kişandiye ser peyva “çi.” Ji dubarekirina peyvan re hunera tekrîr tê gotin.

*Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir dil ji min*

*Awurên heybetpilingê dil ji min bir dil ji min*

Tekrîr: **dil ji min bir dil ji min**

Peyvên: dil, ji, min, bir di herdu risteyan de hatine dubarekirin. Dubarekirina van peyvan hunera tekrîr aniye holê. Mela di vê xezela xwe de li dawiya hemû malikan bi gotina **dil ji min bir dil ji min** hunera tekrîrê bikar aniye.

*Dermande yîmheyran te yîmpîrane yîmxweş bende yîm*

*Zaza bi sur dil j'ê m vekir derheq me pur erzan mebe*

(X. 69, m. 9)

Tekrîr: **yîm**

Cizîrî, bi carîkirina peyva “yîm” hunera tekrîr çekiriye.

*Herfi ji yek bûne fesl ger bibirî wan bi esl*

*Herfi dibit yek xetek tex ku nema nuqte ma*

(X. 2, m. 11)

Tekrîr: **herf, yek**

Peyvên “herf û yek” hatine dubarekirin. Ji ber wê yekê hunera tekrîr hatiye xebitandin. Em dizanin ku peyv werin carîkirin, an jî werin dubarekirin hunera tekrîr tê ziman.

*Te dizanim te dibînim ku tu wî nûrê wucûd*

*Allah Allah ji çi nûr e di seraya me lebaleb*

(X. 7, m. 9)

Tekrîr: **te, Allah, nûr**

Tê xûyan ku Cizîrî, ji bo çekûyê ji bo gotin raydartir were kirin ev peyv an jî gotin di risteyek an jî di malikekê de dubare kirine (carî kirine) û hunera tekrîr aniye holê.

### **2.3.15. Nîda**

Denglêkirina yekê an jî heyîniyekê, bi armanca axaftina bi wan re bi baneşanên “hey, wey, oy, ya, ey, lê, lo...”, carinan jî baneşan neyê bikarhatin ve jî tê çêkirin (Soysal,1998: 73).

Di vegotina nivîsê û ya devkî de peyvên bangkirin û baneşan, mîna “hey, wey, oy, ya, hey, lê, lo... werin bikaranin re nîda (denglêkirin/banglêkirin) tê gotin. Banglêkirin ji bo balkêşiyê û li piştî kelecane hêsa ku dertê holê ye. Ew kesê bang lê tê kirin herdem ne mirov e. Pirê caran helbestvan deng li dîlbera xwe, li yara xwe dike. Carinan jî helbestvan deng li xwe dike, carinan jî nîda tê dubarekirin (carîkirin). Di rewşên wiha de nîda; bi hunera teşxîs, tecrîd û tekrîrê re tê bikaranîn. Mela di xezelên xwe de girîngiyek mezin daye hunera nîdayê (banglêkirin). Geh deng li Xwedê dike geh li berdila xwe dike, carinan deng li xwe dike û cacaran jî deng li dilê xwe yê li ber tîra evîna dîlberê birîndar dike. Di temamê xezelên xwe de, di 50 malikî de hunera nîdayê bikar aniye.

‘îd e’w hebîbê nezre lê yan dê bi qurban bê Melê

**Ya** Reb bibînim roj hilê sikkîn di dest qessabi da

(X. 1, m. 12)

Nîda: **Ya Reb**

Nîda hunerek bangkirinê ye. Helbestvan bi gotina “ya Reb” deng li Xwedê kiriye. Gazî Xwedayê Te’ala kiriye. Daxwaziyek xwe aniye ziman, ji Xweda tiştek xwestiye. Ji ber vê daxwaziyê deng li Rebê Alemê kiriye.

Dil bendê dava zulfek’î keftî kemenda ulfekî

Hel fî yedi’l-meftûni şey? ew keyfe esne’ **ya** feta

(X. 4, m. 3)

Nîda: **ya feta**

Mela Ehmedê Cizîrî: bi gotina xwe ya “ya feta” deng li dîlbera xwe kiriye. Gotiye: “ey dost, ey muhuba dilê min!” Gazîkirin an jî denglêkirin hunerek e. Ji vê hunerê re jî hunera Nîda (denglêkirin) tê gotin.

Nisbet perî zîba ye ew wek nêrgiza yekta ye ew

**Ya** men re’a xillî fe-hel yuşbî bi-şey’in qameta

(X. 4, m. 5)

Nîda: **Ya** men re’a xillî.

“Ey kesê ku yarê (dîlberê/berdilê) dîtiye!” bi vê gotinê gazî li kesên yarê dîtibe kiriye. Di vê malikê de jî deng li kesê ku yara wî dîtibe kiriye.

Her lehze çi hacet ku bi nazan bikujî min

**Cana** ji xwe qurbana te me nazi çi hacet

(X. 10, m. 8)

Nîda: **Cana**

Mela, bi peyva “cana” deng li dîlbera xwe kiriye. Gotiye, ey dîlbera min tu dizanî ku ez qurbana te me, tu çima van nazan dikî?

Îro ji me l’bedra tamam ‘enberfeşan bin sed selam

**Ey** hudhudê şîrînkêlam ehlen wesehlen merheba

(X. 2, m. 15)

Nîda: **ey**

“Ey” peyvek baneşanî ye. Mela dîlbera xwe şibandiye hudhud û deng li dîlbera xwe kiriye. Dema li risteyên jor tê nêrîn tê dîtin ku helbestvan carinan deng li Xwedê, carinan deng li dîlberê û carinan jî deng li hinekên din kiriye. Bi vê denglêkirinê hunera Nîda bikar aniye.

### **23.16. Tecrît**

Kesê canê xwe, aqlê xwe, dilê xwe weke kesek din qebûl bike, deng li xwe bike re tê gotin. Hinek caran hilbestvan deng ji bilî mirovan li tiştêkî din dike. Evyek jî hunera tecrîdê ye. Hunera tecrîdê ya herî helbestvan dide nîşan e. psîkolojiya (derûnî) helbestvanî herî baş ev huner dide nîşandan. “Kesê xwediyê gotinê ji bilî xwe deng li giyandar, li eşyayan bike an jî dilê xwe di şûna mirovek, şûna giyandarek din de bibîne û deng lê bike re tê gotin”(Saraç, 2010: 192).

*Bi hebabê mebe mexrûr wehe sergeşte **Mela***

*Ba vi ber keftiye wê beyhude sergeşte hebab*

(X. 6, m. 9)

Tecrîd: **Mela**

Mela Ehmedê Cizîrî, li vê derê deng li xwe kiriye. Gotiye: “weke serxweş û sermestek betran nebe Mela.

*Husnê edaya te **Mela** her ki dî*

*Sehhe lehu enneke ‘eynu l-fisah*

(X. 19, m. 10)

Tecrîd: **Mela**

Weke deng li kesek dinê bike deng li xwe kiriye. Xwe razber kiriye.

Mela, di xezelên xwe de li gelek cihan deng li dilê xwe kiriye, li goyînan kiriye, li teyr û tilûrên li xwezayê kiriye.

### **2.3.17. Telmî**

“Hunerekî ku risteyek an jî malikek bi du sê zimanan were nivîsîn e” (Soysal, 92). Nivîsîna malîkan an jî risteyan bi çend zimanan be jê re hunera telmî tê gotin. Mela

Ehmedê Cizîrî di xezelên xwe de li pirê cihan hunera telmî bikar aniye. Di malikan de gelemperî di risteya duyemîn de zimanê biyanî yên erebî, farisî, di du cihan de jî zimanê tirkî bikar aniye. Telmiyên xwe bi piranî kurdi- erebî, peyre kurdî- farisî, ji wî şûn de jî bi kurdî -tirkî aniye holê. Mela di 63 malikan de hunera Telmî bikar aniye.

*Pur meke israfê di qetlê mubah*

*Sefku demi'l- 'aşiqi ma la yubahyelmî*

(X. 19, m. 1)

**Telmî: Pur meke israfê di qetlê mubah/Sefku demi'l- 'aşiqi ma la yubahyelmî**

*Ya Reb în guldestei ya nergisê re'na esti în*

*Serwê gulşen ya elif ya qametê yekta esti în*

(X. 58, m. 9)

**Telmî: Ya Reb în guldestei ya nergisê re'na esti în / Serwê gulşen ya elif ya qametê yektaesti în**

Helbestvan risteya yekemîn bi Zimanê Kurdî nivîsiye, risteya duyemîn jî bi Zimanê Farisî nivîsiye. Ji vê hunerê re hunera telmî tê gotin.

*Netrik û tayên bi rîşî êdî zêr in pê ve wêşî*

*Min du fêris dîn di pêşî murwe û insafî yox*

(X. 22, m. 6)

**Telmî: Netrik û tayên bi rîşî êdî zêr in pê ve wêşî /Min du fêris dîn di pêşî murwe û insafî yox**

Helbestvan risteya yekemîn bi Zimanê Kurdî nivîsiye, risteya duyemîn jî bi Zimanê Tirkî nivîsiye.

*We çî 'îşq û çî selamet herdu dûr in ji yekê*

*Kullu men yesluku hubben subule n-nari selek*

(X. 51, m. 8)

**Telmî: We çî 'îşq û çî selamet herdu dûr in ji yekê / Kullu men yesluku hubben subule n-nari selek**

Helbestvan risteya yekemîn bi Zimanê Kurdî nivîsiye, risteya duyemîn jî bi Zimanê Erebî nivîsiye. Ji vê hunerê re hunera telmî tê gotin.

*Sîne bi destê xwe mûbarek veke*

***Te'rife kem fî kebidî min cirah***

(X. 19, m. 2)

Telmî (Du Sê Zimanî): **Sîne bi destê xwe mûbarek veke/Te'rife kem fî kebidî min cirah**

Helbestvan risteya yekemîn bi Zimanê Kurdî nivîsiye, risteya duyemîn jî bi Zimanê Erebî nivîsiye.

### **2.3.18. Teşxîsh / Întaq**

Teşxîs kesandin e, întaq jî peyvandin e. Ji bilî mirovan jîndar (giyandar) û hebûnên dinê ku taybetiyên mirovatîyê mirov li wan bar bike jê re teşxîs (kesandin), ji axaftina wan re jî întaq (peyvandin) tê gotin (Saraç, 1994: 112).

Li gor Kocakaplan teşxîs wiha tê terîfkirin: “Ev huner di çîrok û çîrçîrokan de hatiye xebitandin. Di edebîyata rojhilat de Kelîle û Dimne mînak e ji bo wê. Di dema niha de jî filmên karton ji ber vê hunerê mînak hildane û hatine çêkirin. Tê xuyan ku dinyaya modern jî ji vê hunerê kêr dibîne.”(Kocakaplan: 2002, 179,). Dema li xezelên Mela tê nêrîn tê xuyan ku helbestvanê nemir di pêncî û sê malikan de hunera kesandinê bikar aniye.

Netrik û tayên bi rîşî êdi zêr in pê ve wêşî

**Min du fêris dîn di pêşî murwe û insafi yox**

(X. 22, m. 6)

Teşxihs: **Min du fêris dîn di pêşî murwe û insafi yox**

Li ser gerdena dîlberê hemû xemil, kok û pîraye sef bi sef girtine. Herdu çavên dîlberê yên fettan li pêşiya wan xedar sekinîne. Sekinandina çavan a xedar teşxîs (kesandin) e. Çumkî xedarbûn taybetiyek mirovan e û hatiye dayîn ji çavan re.

**Heyheya reqs û semaya te çi xweş bestiyê çerx**

**Ku di bircê bi sema têt li ser destê xwe berx**

(X. 23, m. 1)

Teşxihs: **Heyheya reqs û semaya te çi xweş bestiye çerx/Ku di bircê bi sema têt li ser destê xwe berx**

Dilşadiya reqsa sema tamamê gerdûnê girtiye, birca berx li ser destê xwe reqs dike û têt. Reqsa sema, dilşadiya bi halan, reqsa birca berx a li ser destan taybetiyên mirovan in. Lê di vê beytê de helbestvan ev taybetî daye sema û birca berx.

Min dî seher **zulfên** di mest Hatînsema ihrami best

Çûn **secdeya** xalê bi qest lew haciban Mihrêbi da

(X. 1, m. 3)

Kesandin/ teşxîs: **zulf, secde**

Di risteya jor de zulufên yarê wek mirovan diçe secdeyê. Jiber vê yekê Mela Ehmedê Cizîrî, di risteya xwe de hunera teşxîs bikar aniye.

*Ji goher xunçe kuşa'î **digirî durcê 'eqîq***

*Bi şeker xende zenî **ger bigirî şekerê teng***

(X. 52, m. 14)

Teşxîs: **digirî durcê 'eqîq, Bi şeker xende zenî ger bigirî şekerê teng**

Dema ku di devê goncayê de cewher têt xuyan eqîq ji ber bedewiya dîlberê qutiya xwe ya cewheran digire, kenîna dîlberê ya şêrîn re şeker hesûdî dike û digirî. Girtina eqîq a qutiye, hesûdî û girîna şeker hunera kesandinê ye. Çumkî hesûdî û girîna taybetiyên mirovan in. Lê helbestvanî ev taybetî dane eqîq û şeker.

## 2.4. HUNERÊN PEYVÎ

### 2.4.1. Cînas

“Du Peyv xwendin û nivîsîna wan yek be lê wateya wan cuda be re têt gotin. cînas di helbestê de hunerek ku ji aliyê bihîstinê ve ahengeke xweş dide helbestê” (Yıldırım, 2010: 166) Mela Ehmedê Cizîrî li 10 cihan cih daye hunera cînasê.

*Pîrê şe''ar e di ş'îrê we Melê şalîfiroş*

*Tu nîşan min mede **Ferxî** ku li nik min bûye **ferx***

(X. 23, m. 6)



Cînas: **ferx**

Di malika jor de peyva ferx bi du wateyan li du cihan hatiye bikaranin. Ji ber wilo ji vê hunerê re hunera cînas tê gotin.

*Çi xet-eşkeste muselsel ya Reb ku te pê nesix kirî dîwanî*

*Gerçî purxal û nîşan î emma bi **Nîşanî** ku tu **bênîşan** î*

(X. 81, m. 5)

Cînas: **Nîşan**

Di risteyên jor de peyva “nîşan” bi sê wateyan hatiye bikaranîn ya ewil, bi wateya tişteki mirov durf ke, mirov ji xwe re kifş ke ye. Evîndar herdem sekran û sermest e. Ji ber evîna dîlberê herkes wî nas dike. Her wiha dirfa eşqê li ser endamê aşiqî ye. Ya dî di menzil, armanca tîrê. Bîrhên dîlberê tîr in ji evîndar re. Armanca wan tîran dilê evîndar e. dîlber çiqas awir bide evîndar ewqas dilê wî dibe birîn lê ew bi halê xwe dilşad e. ya sisêyan jî mexlesa Mela Ehmedê Cizîrî ye. Helbestvan ji bilî Mela mexlesa “Nîşanî” jî bikar aniye.

Peyva nîşan di du wateyan de tê ziman a yekemîn nîşan menzila tîrê, ya risteya duyemîn di wateya xal, durfa li ser bedena însan e.

#### 2.4.2. Îade

Di edebîyata klasîk de heke peyva ku di risteya ewil pê xilas be û risteya pey wê bi eynî peyvê were berdewamkirin jê re “hunera îade” tê gotin. Mela Ehmedê Cizîrî di 5 heb malikan de hunera îade bikar aniye.

*Xirqeê zerq û jengê zuhd min bi meya muxane **şûst***

***Şûst** û şowik di meykedê ewwelê kari fez e ferz*

(X. 40, m. 3)

Îade: **şûst**

Risteya yekemîn bi Peyva “şûst” qediyaye û risteya duyemîn dîsa bi eynî peyvê dest pê kiriye. Ji vê yekê re hunera îade tê gotin.

*Min go ji dilê şubhê bixûr xweş te bi **ker kir***

***Ker kir**bi du le'lên xwe şeker go 'edes î tu*

(X. 75, m. 16)

Îade: **ker kir**

Malika ewil bi peyva “ker kir” hatiye qedandin, risteya pey wê jî bi peyva “ker kir” dest pê kiriye.

Kî dizanit min ji rimbazan dema oxilme **tên**

**Têne** di sed rim ji wan û sîne têne sed cerîd

(X. 55, m. 9)

Îade: **Tên**

Malika ewil bi peyva **tên** hatiye qedandin, risteya pey wê jî bi peyva “**tên**” dest pê kiriye.

### **2.4.3. Îştîqaq**

Peyvên ji kokê hevşêwe hatibin afirandin û bi hev re li cihekê werin bikaranîn re hunera Îştîqaq tê gotin. Di edebîyata klasîk de piraniya peyvên erebî hunera îştîqaqê li pirê cihan aniye holê (Pala, 1992: 127).

Peyvên ji kokekê hatibin afirandin di risteyek an jî di malikekê de werin bikaranîn re hunera îştîqaq tê gotin (Soysal, 1998: 61).

Tê dîtin ku peyvên kokên wan weke hev bin di beyitekê (malikek) de werin bikaranîn re “îştîqaq” tê gotin. Hunera îştîqaq bi gelemperî di peyvên erebî de tê bikaranîn. Ku peyv ji kokekê nebin û telafuza wan weke hev bin jê re “sibhê îştîqaq” tê gotin (Soysal, 1992). Mela Ehmedê Cizîrî di dîwana xwe ya bêhempa, di xezelên xwe yên hêja de li bîst û pênc cihan hunera îştîqaqê bikar aniye.

**Qasid bi meqsûda** me hat ba mujde û emr û berat

Nîşan hinarin hem xelat şehzadeya gulgûnqeba

(X. 3, m. 110)

Îştîqaq: **Qasid, meqsûda**

Qasid: kesê pêşnumakirî, kesê meqsedê bi cih tîne, xwediye meqsed û mirazê ye.

Meqsûd: dişta ku were xwestin, daxwazî, miraz, tişta were qestkirin e.

Peyvên qasid û meqsûd peyvên erebî ne. Koka herdu peyvan jî yek e, ji kokekê hatine afirandin. Heke du an jî du peyvan zêdetir peyv ji kokekê werin afirandin di risteyek an jî malikekê de werin bikaranîn di edebiyata klasîk de ji vê hunerê re “Hunera îştîqaq” tê gotin.

*Gulê iqbalê ji gulzarê qebûl*

*Mi çinîbû di şekerxwabê du'a*

(X. 5, m. 5)

Peyva iqbal û qebûl ji kokekê hatine afirandin. Dema ku du peyv ji kokekê werin çêkirin jê re îştîqaq tê gotin. Helbestvanî di risteya yekemîn de du peyvên ji kokekê hatine afirandin anîne ziman.

*Ji ezel 'aqibeta karî ku me'lûmi nebit*

*Cama mey noş û ji **teqdîrê muqedder** meke behs*

(X. 15, m. 10)

Îştîqaq: **teqdîrê muqedder**

Koka teqdîr û muqedder yek e. Teqdîr di wateya pesinandin, teqdîrkin; muqedder jî tişta hatiye teqdîrkin, tişta di qederê de hatiye nivîsîn e. Ev herdu peyv ji kokekê zane, hatine afirandin.

*Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand*

*'Arifê weqt im û **Me'rûfi** bila bête ji Kerx*

(X. 23, m. 4)

Îştîqaq: **'Arifê, Merûfi**

Peyvên “Arif û Me'rûf” ji kokekê çêbûne. Arif di wateya zana de ye; me'rûf jî di wateya tişta ku herkes pê bizanibe, tişta eşkere, kes an jî tişta navdar, bi nav û deng e. Ji vê hunerê re hunera îştîqaq tê gotin.

#### 2.4.4. Alîterasyon

“Di malikek, risteyek an jî di hevokê de bi armanca çêkirina ahengê ve deng, kîte an jî tîpê hevşêwe werin tekrarkirin re “hunera alîterasyon” tê gotin” (Soysal, 1998: 33).

Di helbestan (nazim) an jî pexşanan (nesîr) de tîp an jî kîte bi awayek ahengî werin dubarekirin alîterasyon çêdibe. Ev hunera di navbera peyvên de mûsikiyê çêdike. Bi saya wê guhê mirov bi ahengek xweş risteyan dibihîze. Jibo vê hunerê, gotina hêsan û bedewiya deng li pêş e (Pala, 2004: 79).

Di herdu salixên jor de, ya Soysal jî ya Pala jî de wateya alîterasyonê de wek hev hatine dayîn. Herdu lêkolîner jî li ser ahenga deng, kîte û tîpan sekinîne. Mîrê şî'rê Mela Ehmedê Cizîrî, di xezelên xwe de di gelek cihan de hunera alîterasyonê bikar aniye. Dema helbestên wî tîpê xwendin ahenga deng, kîte û tîp bi awayek xweşik tîpê guhê mirov.

*Min dî ji xeflet cam di keşahê Necef dil kir hedef*

*Roj hat Şerefstêr bûne xefherçar terefnûra yeqeq*

( X. 48, m. 1)

Alîterasyon “f”

Di malika jor de bi armanca çêkirina ahengê ve tîpên “f” hevşêwe ne û hatine tekrarkirin. Ev tekrar dema tîpê xwendin bi ahengek xweşik deng li guhê mirov dike. Tîpa “f” ahengê daye malika jor. Ji bo vê yekê hunera alîterasyonê hatiye bikaranîn.

*Mi ji bêhriyanpur naliyanşev tariyanceng bû meyan*

*Wer kuştîyanji wan yengîyanbi wan tiliyanxweşke giyan*

(X.m48,n m. 5)

Alîterasyon: “yn”

Di beyita jor de tîpên “y,n” hatine tekrarkirin. Di edebîyata klasîk de ji carêkirina dengên an jî ahengkirina gotinan re alîterasyon tê gotin.

*Şebkagul e xalfulful e çînsunbul e dava dil e*

*Min xefletî dî qibletî wek mah ditîsa xebxeb e*

(X. 69, m.nm2)

Alîterasyaon: “**l**”

Di risteya ewil de tîpa “l” hatiye dubarekirin. Ev tekrar bi armanca çêkirina ahengê hatiye bikaranîn. Tê zanîn ku hunera alîterasyon hunerek zehmet e û ev huner hostatiya helbestvanî dide ravakirin. Tîpa “p” weke avek hûr hûr, hêdî û nerm bikişê di guhê mirov de mûsîkiyeke ahengî tîne holê. Cizîrî hunermendiya xwe ya helbestî daye nîşandan.

*Min dî bi xefsuheb bi defşahê Neceffîncan di kef*

*Nûnên ji Yengberdan xedengwê pur ji tengşîrînleb e*

( X. 48, m. 1)

Alîterasyaon: “**f, ng**”

Di risteya ewil de tîpa “f” di risteya pey de jî tîpen “ng” hatine dubarekirin. Di edebîyata klasîk de ji carîkirina dengên an jî ahengkirina gotinan re alîterasyon tê gotin. Mela di risteyên “Min dî bi xefsuheb bi defşahê Necef fîncan di kef Nûnên ji Yengberdan xedeng wê pur ji teng şîrînleb e” de di risteya ewil de tîpa bédeng “f” di risteya dawiyê de tîpên bédeng “ng” hatine tekrarkirin û aheng çêkirine. Bi vî awayî hunera alîterasyon anîne holê.

*Dêmê bixalew nûn û dalismê celalbejna şepal*

*Yekta elifnaye wesifmin ‘eqlê tif-lî mezheb e*

(X. 69, m. 2)

Alîterasyaon: “**l, f**”

Di risteya ewil de tîpa “l” di risteya pey de tîpa “f” hatine dubarekirin. Di edebîyata klasîk de ji carîkirina tîpên bédeng û ahengkirina gotinan re alîterasyon tê gotin. Mela bi tîpên “l,f” hunera alîterasyonê bikar aniye.

*Zulmet nema suhbet we ma nûra şemalan çû sema*

*Lê ew demazulf bûn cemaHatin semayê yek neseq*

( X. 48, m2)

Alîterasyon: “**m**”

Bi armanca ehengkirinê tîpa bêdeng a “m” di herdu risteyan de hatiye tekrarkirin ev tekrar bi armanca carîkirina tîpan hunera alîterasyonê aniye holê.

*Kir şefqe mîr anîme bîrberdan mi tîrkirme esîr*

*Negha feqîr zulfa herîravêhte şîrda pê meheq*

( X. 48, m. 6)

Alîterasyon: “r”

Bi armanca ahengkirinê tîpa bêdeng a “r” di herdu risteyan de hatiye tekrarkirin. Vê tekrarê alîterasyon aniye holê.

*Werdan gulavgirtin xunavlê min di tavsohtin hinav*

*Min dî bi çavzulfên bilavlê bûne davbend kir bi nav*

( X. 48, m. 3)

Alîterasyon : “v”

Di malika jor de bi armanca çêkirina ahengê tîpa bêdeng “v” hatiye tekrarkirin. Ev tekrar dema tê xwendin bi ahengek xweşik deng li guhê mirov dike. Tîpa “v” aheng daye malika jor.

*Bejna şepal dêmê bixal îrab û dalqewsê hilal*

*Neqşê celalcama zelalxemra helalsuhbet bi hal*

( X. 48, m. 11)

Alîterasyon : “l”

Di herdu risteyan de tîpa “l” hatiye tekrarkirin. Ev tekrar bi armanca çêkirina ahengê hatiye bikaranîn. Di edebîyata klasîk de ji carîkirina deng an jî ahengkirina gotinan re alîterasyon tê gotin.

*Canê Melê ji qal û belê bend im welê der kagulê*

*Belgên gulê rûheykelêew misk e lê carek hilê*

( X. 48, m.13)

Alîterasyon:“l”

Di herdu risteyan de tîpa “l” hatiye dubarekirin. Ev tekrar bi armanca çêkirina ahengê hatiye bikaranîn. Di edebîyata klasîk de ji carîkirina deng an jî ahengkirina gotinan re alîterasyon tê gotin.

Tê dîtin ku Mela Ehmedê Cizîrî bi hunermendiyeke mezin hunera alîterasyonê çêkiriye. Dema mirov helbestên Mela dixwîne weke xwe li ber qeraxê şilavekê dihesibîne. Van deng an aheng dane xwendinê hem jî aheng dane guhdarkirinê.



## ENCAM

Ev xebata li ser hunerên belexetê di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de bikar hatiye. Bi vê riyê em derheqê şexsiyeta Mela Ehmedê Cizîrî, derheqê Edebîyata klasîk û derheqê Edebîyata Kurdî de bûn xwediyê agahiyekê.

Mela Ehmedê Cizîrî weke helbestvanên dîwanî di rê û rêzikên edebîyata klasîk de weke hemû helbestvanên pêşiya xwe, yên serdema xwe û yên pey xwe, di bin bandora edebîyata klasîk de kesîtiya xwe ya edebî domandiye. Ewî şopeke edebî û dîrokî li pey xwe hiştiye. Her çiqas di bin bandora helbestvanên pêşiya xwe de mabe jî ew ne Şîrazî ne jî helbestvanên din ji xwe zêdetir dibîne. Mela Ehmedê Cizîrî helbestên xwe weke yaqût û mircanan dibîne. Helbestên xwe yên bi Zimanê Kurdî nivîsîne, bi zimanekî hunerî nivîsîne, bi uslûb û motifên edebî xemilandine. Helbestên xwe weke libên tizbiyeke bi yaqût û mircanan were rêzkerin dibîne.

Tê dîtî ku Mela di helbestên xwe de girîngiyek mezin, qedr û qîmetekî bêhempa dide hunerê. Ji bo van taybetiyan Mela, di serdema xwe û serdemên pey xwe re helbestvanek navdar e. Ewî jî weke helbestvanên edebîyata klasîk hunerên edebî bi awayekî hosteyane bikar anîne. Jiber vê yekê Mela ji bo helbestvanên serdema xwe mînakek bêhempa ye.

Em dikarin bêjin ku bikaranîna hunerên edebî pir an jî hindik û kêfîyeta bikaranîna huneran, hem derbarê hunerên edebî yên helbestvan bikar tînin, hem jî derbarê serdema helbestvan jiyaye re serişteyên girîng dide me. Heta em dikarin bêjin ku heke kesê bikaribe li hunerên edebî binêre ew ê bibîne ku ev nêrîn weke pencereyekê li şexsiyeta hunermend vebe tê dîtî.

Di vê tezê de me da nîşandan ku Mela Ehmedê Cizîrî, kîjan hunerên edebî bi çi awayî û çiqas bikar aniye? Baş tê zanîn ku bersiva vê pirsê bi xebateke zor û zehmet ve tê meferkirin. Ji bo wê, bi pêşanî derbarê hunerên edebî de ger mirov agahdar be, piştî wê jî hewce ye mirov hunerên Mela Ehmedê Cizîrî bikar anîne tespît bike. Di vê tezê de de me ji çavkaniyan agahî hilda, sûd ji wan girt. Pirê çavkaniyên me sûd jê wan girt, bi Zimanê Tirkî hatibûn nivîsîn. Ji ber vê yekê wergerandina gotinan gelek dijwar bû. Ew gotinên me ji çavkaniyan hildidan û dida nîşandan hewce bû ku em ji wan metnan re sadiq bimînin. Li pirê cihan evyek weke pirsgerêkekê derket pêşiya me. Piştî tesbîtkirina çavkaniyan em li ser hunerên Cizîrî sekinîn. Me di xezelên wî de li beytan tek tek, nêrî



û hunerên hatine bikaranîn tesbît kirin. Bi vê xebatê em di xezelan de çend huner; her huner çend carî hatine bikaranîn jî hîn bûn. Mela Ehmedê Cizîrî, li ser 30 heb hunerên edebî rawestiyaye.

Heke em encama vê xebatê bi reqeman bidin nîşandan tê xuyan ku Mela di 1984 beyitan (malikan), risteyan de hunerên edebî bikar anîne. Di xezelên Mela Ehmedê Cizîrî de: 314 lib (heb) Teşbîh, 219 Îstîfare, 17 Mecazê Mursel, 9 Kînaye, 3 Tarîz, 53 Teşxîs, Întaq, 9 Îham, 12 Tewriye, 6 Îstixdam, 188 Tenasub, 10 Lef û Neşr, 23 Tecahulê ‘Arif, 86 Husnê Talîl, 60 Mubalexe, 43 Tezad, 7 Îstîdrak, 50 Nîda, 95 Îstifham, 201 Telmîh, 5 Îrsalê Mesel, 17 Îqtîbas, 25 Îştîqaq, 9 Cînas, 4 Îade, 63 Telmî, 223 Alîterasyon, 63 Mecaz, 6 Tedrîc û 163 Tekrîr bikar anîne.

Mela Ehmedê Cizîrî girîngiya huneran zanîbûye. Ewî hunerên di nezmê xwe de weke xemla bûkê, weke xemla li ser gerdena dîlberê dîtiye. Li gor wî çawa dîlber bê xemil nabe nezim jî bê huner nabe. Ji ber wê ew hunerên di nezma xwe de weke yaqût û mircanan dibîne.

Bi puxteyî, Mela Ehmedê Cizîrî di xezelên xwe de hunerên edebî bi awayek serkeftî bikar anîne, Li ser wan çendî sal derbas bûne jî ew huner ji bihayê xwe tu tişt winda nekirine. Bi saya van huneran Dîwana Mela bi çendî sedsal e kesê dixwîne kêf û şadiyekê dide wan. Heke tê xwestin ku qedrê Dîwana Cizîrî bê kêmasî were zanîn hewce ye xezelên wî baş werin famkirin. Famkirina xezelan jî bi zanebûna hunerên di wan xezelan de hatine bikaranîn ve bimefer e. Mela Ehmedê Cizîrî, bi huneran dilbera dilê xwe xemilandiye, dara evînê bi huner hêşîn kiriye û fêkiyê wê darê pêşkeşî dîlberê kiriye. Bi huneran gerdena dîlberê weke zozanan bi yaqût mercan û bi moriyan xemilandiye. Bi saya huneran em bi agirê dilê Mela dihesin. Bi saya wan em dizanin ku xêncî bayê sibehê tu kes derî li wî venake, xêncî agirê dilê wî tu kes ji bo wî naşewite. Bi saya wan em dizanin ku dilê Mela bûye armanca tîra awirên yarê. Dilê wî qetqetî ye, parçe parçe ye, hertim jê xwîn tê. Lê Mela dîsa bi vê birînê jiyana xwe berdewam dike.

## ÇAVKANÎ

- Aksan, D. (2006). *Anlambilim*, Ankara: Engin Yayınları.
- Aksan, D. (2004). “Göktürk Anıtlarında Söz Sanatları Güçlü Anlatım Yolları”, *Dilbilim ve Türkçe Yazıları*, İstanbul: Multilingual Yayınları.
- Bali, A. (1992). *Antolojiya Helbestvanên Kurd*. Stenbol: Weşanên Pelê Sor.
- Bilgegil, M. K. (1980). *Edebiyat Bilgi ve Teorileri (Belâgat)*. Erzurum: Atatürk Üniversitesi Yayınları.
- Bolelli, N. (2009). *Belâgat. Beyân-Meânî-Bedî‘İlimleri*. İstanbul: İFAV - Yayınları
- Coşkun, M. (2007). *Sözün Büyüsü Edebî Sanatlar*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Çavuşoğlu, M. (1999). *Divan Şiiri, Osmanlı Divan Şiiri Üzerine Metinler*, haz. Mehmet Kalpaklı, İstanbul: YKY.
- Çınar, B. (2008). “Teşbih (Benzetme) Sanatına Dilbilimsel Bir Yaklaşım”, *Modern Türklük Araştırmaları Dergisi*, C.5, S.1, Ankara: <http://www.mtad.ankara.edu.tr> (Dîroka Lênêrînê: 15/05/2016).
- Demir, M. E. (2012). *Li Ser Klasikên Kurdî*. <http://www.nucevan.com/cand/li-ser-klask-kurd.htm> (Dîroka Lênêrînê: 13.03.2016).
- Dilçin, C. (1997). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*. Ankara: TDK Yayınları.
- Doskî, T. Î. (2012). *Dîwana Hadî. Mela Mihemedê Liceyî*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Doskî, T. Î. (Amadekar) (2012). *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Doskî, T. Î. (Amadekar) (2012). *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*. Stenbol: Weşanên Nûbiha Nûbihar.
- Erkman-Akerson, F. (2005). *Göstergebilime Giriş*, İstanbul, Multilingual.
- Farqînî, Z. (2002). *Ferheng*. Stenbol: *Enstîtuya Kurdî ya Stenbole*. Weşanên Nûbihar.
- Gökalp, M. ve H. Kocakaplan (2012). *Tür ve Şekil Bilgisi*. İstanbul: Kesit Yayınları.
- İpekten, H.(1997). *Fuzûli, Hayatı, Sanatı, Eserleri*, Ankara: Akçağ Yayınları.
- Karasar, N. (1999). *Bilimsel Araştırma Yöntemi*: Ankara, Nobel Yayın Dağıtım.
- Kocakaplan, İ. (2005). *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, İstanbul: Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları.

- Koyuncu H. (2014). Dı Hin Dîwanên Kurdî Dê bandora Tesewûfê, (Teza Nehatiye Weşandin) Enstîtuya Zimanên Zindî Ziman û Edebîyata Kurdî, Zanîngeha Bîngolê, Bîngöl.
- Köksal, M. F. (2001). *Mecma'u'l-Nezâ'ir (İnceleme-Tenkitli Metin)*, Ankara: 3. Cilt, Hacettepe Üniversitesi.
- Kurdo, Q. (1992). *Tarîxa Edebîyata Kurdî*. Ankara: Weşanên Öz-Ge.
- Külekçi, N. (1995). *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*, Ankara: Akçağ Yayınları..
- Levent, A. S. (1984). *Divan Edebiyatı Kelimeler Remizler Mazmunlar ve Mefhumlar*. İstanbul: Enderun Kitabevi.
- Mermer, A. ve Alıcı, L., Eflatun, M., Bayram, Y. (2007). *Üniversiteler İçin Eski Türk Edebiyatına Giriş, Gözden Geçirilmiş*, Ankara: Akçağ Yayınları.
- Özünlü, Ü, (2001). *Edebiyatta Dil Kullanımları*, İstanbul: Multilingual.
- Mermer, A. (1991). *Mezâkî: hayatı edebî kişiliği ve Dîvânı'nun tenkidli metni*, Ankara: Atatürk Kültür Merkezi Yayını.
- Pala, İ. (2004). *Ansiklopedik Divan şiiri Sözlüğü*, İstanbul: Kapı Yayınları.
- Sami, Ş. (2006). *Kamûs-ı Türkî*. İstanbul: Çağrı Yayınları.
- Saraç, M. A. Y. (2010). *Klasik Edebiyat Bilgisi*, İstanbul, Gökkuşbe yayınları.
- Saraç, M.A.Y. (1994). *Tahirül- Mevlevî, Edebiyat Lügati*, İstanbul: Gökkuşbe Yayınları.
- Saraç, M. A. Y. (2007). *Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat*, İstanbul: 3F Yayınları
- Serokatiya Karubarên Diyanetê (2015). *Qurana Pîroz a Kurdî*. İstanbul: Diyanet İşleri Başkanlığı
- Soysal, M. O. (1998). *Edebi Sanatlar ve Tanınması*, İstanbul, MEB yayınları.
- Şimşek, R.R. Ö. (2000). *Lise Türk Dili Edebiyatı 1*, İstanbul, Şimşek yayınları.
- Tarlan, A. N. (1981). *Edebiyat Meseleleri*, İstanbul: Ötüken yayınları.
- Tunç, O. Ve S. Dilovan (2009). *Mela Ehmedê Cizîrî/ Dîwan*. İstanbul: Nûbihar yayınları.
- Turan, A. (2010). *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*. İstanbul: Nubihar Yayınları
- Uğur, N. (2003). *Anlambilim Sözcüğün Anlam Açılımı*, Ankara: Doruk Yayınları,
- Uysal, R. S. (2010). *Belâgat ve Edebi Sanatlar Lügati*. İstanbul: Doğu Kitabevi.

- Yıldırım, M. (2002). “Bâkî Dîvânî’nda Sözüñ Gerçek Anlamına Dayalı Sanatlar.”  
Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Fırat Üniversitesi SBE
- Yıldırım M. (2010). Kur’an Sanatı ve Estetiği Üzerine, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi) Selçuk Üniversitesi, SBE
- Yıldırım, A., Şimşek, H. (2008). *Sosyal Bilimlerde Nitel Araştırma yöntemleri*  
Ankara: Seçkin Yayıncılık.
- Zêrevan, A. (2004). *Melayê Cizîrî Dîwan*. Stockholm: Nefel Yay.
- Zinar, Z. A. (2009). *Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê*. Stockholm: Weşanxaneya Çanda Kurdî.
- Zinar, Z. A. (1991). *Şêx Evdîrehmanê Axtepî*. Stockholm: Weşanxaneya çanda Kurdî.

## PÊVEK

### HUNERÊN BELEXETÊ DI XEZELÊN MELA EHMEDE CİZÎRÎ

#### BAB A (ELÎF) XEZELA 1.

#### MEŞŞATEYÊ HUSNA EZEL

Meşşateyê husna ezel **çengalê zulfan** tabi da

Da 'işqi hil bit pêli pêl qelbê me pê **cellabi** da

Teşbih: **çengal, zulf,**

Lef û Neşra Mureteb: **meşate, çengalê zulfan / işşq, cellabi**

Husna hebîb û lutfê yar avête dil 'işqa xedar

Lew selbi kir jê ixtîyar wê husnê ev îcabi da

Min dî seher **zulfên** di **mest** Hatîn **sema** îhrami best

Çûn secdeya xalê bi qest lew haciban **Mîhrêbi** da

Tenasûb: **mest, sema**

Kesandin/ Teşxîhs: **zulf+ secde**

Îstîare: **mîhrebî**

Rûh û rewanê min hebîb dîsa bi telbîsa reqîb

Rencîde kir **miskîn xerîb** terka dilê ehbabi da

Îstîare (îstîareya vekirî) : **Miskîn xerîb**

Mehbûb û **reyhan** pur gulav ker kir li min cerg û hinav

Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cullabi da

Îstîare (îstîareya vekirî): **reyhan**

Wan dest û zend û sa'idan **mey** dane **şeyx û zahidan**

**Mestî** be çeşmê şahidan û **nêrgizasîrabi** da

Tenasûb: **Mey, mestî, şeyx, zahidan**

Şibandîn(Teşbih): **Nêrgiza**

Telmih: **Nêrgiza sîrabi:**

Miskê reşandî ez dibêm wan **nuqteyan** hin bûne kêr

Lê **xettê** reyhanî li dêm **katib** ji nû **‘îrabi** da

Teşxîs: **Miskê reşandî ez dibêm wan nuqteyan**

Tenasûb: **nuqteyan, xette, katib, îrabi**

**Nazikqedanûrînbeşer** ew bû li min neqşê beser

Dîna xîyalê her seher nav dîde’ê bêxwabi da

Îstîfare (îstîfareya vekirî): **Nazikqedanûrînbeşer**

Ew **tilliyênnazik reqîq** pur da me **fîncana ‘eqîq**

Ew **badeya nûrînrehîq** minnet bi min wehhabi da

Teşbîh: **tilliyênnazik reqîq, fîncana ‘eqîq, badeya nûrînrehîq**

Da xef nebit bejna ferî **mey** hate şerkasa surê

Minnet ku îro dêmduî dîsa **şeraba** nabi da

Tenasûb: **mey, şerab**

**Mey** hate **fîncana sedef** kes dê vexwut îro bixef

**Saqî** bi **çeng û nay û defferfûriya mehtabi** da

Teşbîh: **ferfûriya mehtabi**

Tenasûb: **Mey, fîncana sedef, Saqî, çeng û nay û defferfûriya mehtabi**

**‘îd** e’w hebîbê **nezre** lê yan dê bi **qurban** bê Melê

**Ya Reb** bibînim roj hilê **sikkîn di dest qessabi** da

Tenasûb: **Îd, nezre, qurban, qesab**

Nîda (denglêkirin/gazîkirin): **Ya Reb**

**BAB A (ELÎF) XEZELA 2.**  
**MUXBEÇEYÊN MEYFIROŞ**

**Muxbeçeyên meyfiroş** her seherê tèn **sema**

**Badexworan noşi noşmane** li dorê **cema**

Tenasûp: **Muxbeçeyên, meyfiroş, sema Badexworan, noş noşmane, cema**

Hin gulê bo'enber in hin di şîrîn esmer in

Hin guherê dane yin mislê Suheylê sema

Teşbîh: **Hin gulê bo'enber in, hin di şîrîn esmer in, Hin guherê dane yin, mislê Suheylê sema**

**Hin zerî** ne pursur inser bi per in **dêmdur in**

Min ku di çerxê we dî sebr û qerarim nema

Teşbîh: **Hin zerî ne, dêmdur in**

Sebr û qerarim ku **bircan û ceger hûr dikir**

Zulmê we reng kê dikir can dibir û dil teba

Mecaz: **bircan û ceger hûr dikir**

Can û dilê min ew e horîweşê min ew e

Padişehê min ew e ez li derê wê geda

Îstiareya vekirî: **horîweş, padişeh, geda**

Tezad: **padişeh û geda**

Yarê ku dî em geda **desti** bi **destê** me da

Em bi **semayê** birîn **reqs** û **sema** jî we ma

Tenasûp: **sema, reqs**

Tekrîr: **dest, sema,**

Gote me **durdaneyî** em ji te û tu ji me yî

Lew bi heqîqet yek in mes'ele bêşubhe ma

Îstîare: **durdane**

Dame bi destê surê **cama ji rengê durî 1**

**Cezbe** giha can û dil pur şewişandin hema

Teşbîh: **cama ji rengê durî**

Tenasûp: **cam, durr, cezbe**

Bade mi noşî ji dest çûme ji xwe mame mest

Qitre bi behrê giha behri bi ‘eynî xwe ma

Tenasup: **bade, noşî, mest**

Tezad: **Qitre bi behrê**

Gûşi bi ‘amê **mede** terka **medamê mede** 10/26

Ekseruhum fî xuma exlebuhum fî ‘ema

Tekrîr: mede, mede

Alîterasyon: “**m**”

Herfi ji yek bûne fesl ger bibirî wan bi esl

Herfi dibit yek xetek tex ku nema nuqte ma

Tekrîr: **herfî, herfî, yek, yek**

wehdetî mutleq Mela nûr e di qelban cela

Zori di vê mes’elê ehlê dilan şubhe ma

Telmîh: **wehdetî mutleq**

### **BAB A (ELÎF) XEZELA 3.**

#### **ÇÎN ÇÎN KIRIN ZULFÊN SÎYA**

**Çîn çîn** kirin **zulfên sîya** kesketlesa dîbaqeba

Êdî **nîşan** nabin xwuya têkil kirin lazim seba

Tenasûp: **Çîn çîn, zulfên sîya, nîşan**

Telmîh: **seba:**



Min dî seba dayê seher madarê bedrê kir du ker

Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfan ra teba

Telmîh: **seba ( bayê sibe)**

Telmîh: **bedrê kir du ker**

Husnê Talîl: **Min dî seba dayê seher madarê bedrê kir du ker/Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfan ra teba**

Îro ji me l'bedra **temam** 'enberfeşan bin sed selam

**Eyhudhudê şîrînkalam** ehlen wesehlen merheba

Îstîareya Vekirî: **bedra tamam**

Telmîh: **hudhud**

Nida: **Ey**

Min **dilberek wek dur** heye mehbûbê **şîrînsur** heye

Husn û cemalek pur heye **Belqîssifet mesken Seba**

Teşbih: **dilberek wek dur, şîrînsur, Belqîssifet mesken Seba**

Telmih: **Belqîssifet mesken Seba**

**Şox û şepala meyperest** ew **zalima hişyar û mest**

Vê nameyê xef dê vi dest fî teyyiha neşru n-neba

Teşbih: **Şox û şepala meyperest, zalima hişyar û me**

Bêj ew **şîrîna surperî durdaneya ez muşterî**

**Kan** 'ehd û peyman **berê** bê fayde çûn **şubhê heba**

Îstîareya Vekirî: **şîrîna surperî durdaneya ez muşterî**

Teşbih: **ehd û peyman berê** bê fayde çûn **şubhê heba**

Îtifham: **Kan**

Me d'vê **perîya dilberê** lê hê li uslûba berê 2

Lê kifş bibîte j'pencerê bê û biçit teşbîhê ba 1

Îstîareya Vekirî: **perîya dilberê**

Dilber hatiye şibandina perîyek

Teşbih: bê û biçit teşbîhê ba

Dilber mecala name dî nasî ku nîşana me dî

Nûnek muxalif tê nedî **hel qelbuha nehwi seba**

Îstifham: **hel qelbuha nehwi seba**

**Neyşekera spî dest** û zend zanim mecala name xwend

Lêvan tebessum kir ji qend **maset ke banin fî ruba**

Teşbih: **Neyşekera spî dest, maset ke banin fî ruba**

**Qasid** bi **meqsûda** me hat ba **mujde** û **emr** û **berat**

Nîşan hinarin hem xelat şehzadeya gulgûnqeba

Îştîqaq: **Qasid, meqsûda**

Îro mecal lê hat û wext **dîsa cuwan bû min dirext**

Ew lam'îa dayî ji text ma kane berqen xulleba

Mecaz: **dîsa cuwan bû min dirext**

**Selwa rewan zerrînwereq** çiçek Melê dîn sed neseq

**Yaqûtuha yehkî'ş-şefeq** yehkî 'uqûden kewkeba

Teşbih: **Selwa rewan, zerrînwereq, Yaqûtuha yehkî'ş-şefeq, 'uqûden**

#### **BAB A (ELÎF) XEZELA 4.**

#### **DILBER ŞIKÊNA ŞEKEREK**

Dilber şikêna şekerek fequltu ya rûhî meta

Go min heta xatir hebit min go çi kim ez ba heta

Zulfan tu bes **çîn çîn** bike **biskên muqabil dîn bike**

Pêşkêşî yek zulfek te bin **mulkê xeten textê xeta**

Tekrîr: **çîn çîn**

Teşxîsh: **biskên muqabil dîn bike**

Telmih: **mulkê xeten textê xeta**

Dil bendê dava zulfek'î keftî kemenda ulfekî

**Hel fî yedi'l-meftûni şey? ew keyfe esne' ya feta**

Îstifham: **Hel fî yedi'l-meftûni şey? ew keyfe esne' ya feta**

Nîda: **ya feta**

**Zulfên put û şîrînleban jehrî ne şubhet 'eqreban**

**Lê min ji biska purgirê îro tinê girtin du ta**

Teşbih: **Zulfên put û şîrînleban jehrî ne şubhet 'eqreban**

Mecaz: **îro tinê girtin du ta**

**Nisbet perî zîba ye ew wek nêgiza yekta ye ew**

**Ya men re'a xillî fe-hel yuşbî bi-şey'in qameta**

Teşbih: **Nisbet perî zîba, wek nêgiza yekta**

Nîda: **Ya men re'a xillî.**

Me ji buxçeya yar zeyyinî bê pûrsi yek sêvek çinî

We bima ceneytu cenyetî elqet 'eleyye cînayeta

## **BAB A (ELÎF) XEZELA 5.**

### **SERÊ ZULFA TE BI KULLABÊ DU'A**

Serê zulfa te bi kullabê du'a

Hate destê mi bi cellabê du'a

**Sofiyê xelwenuşîn bêne sucûd**

Herdu birhên te ne **Mîhrêbê** du'a

Tenasûp: **Sofiyê xelwenuşîn, sucûd, Mîhrêbê**

**Erzê kî dê bikirim sûretê hal**

Ko tu wî qibleê erbabê du'a

Îstifham: "Erzê kî dê bikirim sûretê hal"

Ji du'ayê **qedehek** derdest

Her seher **mestê meyê** nabê du'a

Tenasûp: **qedehek, mestê meyê**

**Gulê iqbalê ji gulzarê qebûl**

Mi çinîbû di şekerxwabê du'a

Tenasûp: **Gulê, gulzarê**

Îştîqaq: **iqbalê, qebul**

Ber du birhên te ji ixlas û yeqîn

Mi dibir secde bi adabê du'a

Ji dilek **Safî** tu **Mîhrêbê** bibîn

**Secdeyek** lazim e der babê du'a

Tenasûp: **safî, Mihrab, secdeyek**

Me di dil 'urwetê wusqa ye bi dest

Ji senaya te ser elqabê du'a

Ji ezel yek cihetî daye Melê

Her me ixlas e ji esbabê du'a

**BAB B (BÊ)XEZELA6.**

**DESTÊ QUDRET KU HILAVÊT JI BEJNA TE NÎQAB**

**Destê qudret** ku hilavêti ji bejna te nîqab

Bi cemala ceberûtî me neman perde'w hîcab

Mecaza Mursel: **Destê qudret**

Li **gulên te'y ter û nazik** ku seher girtî **xunav**

Di ebarîqê qinînan ji hesed sohtî **gulab**

Tenasûp: **xunav, gulab, gulên teyr ter û nazik**

‘Eynêkafûrî ye meşreb me ji husna te ye saf

**Lew ji ‘işqa te di dil da me vebû ‘ilmê ‘ubab**

Husnê Ta’lîl: **Lew ji ‘işqa te di dil da me vebû ‘ilmê ‘ubab**

Me ji **serçêşmeyê heywan** qedehek safî vexwar

**Nagihê lezzet û zewqa me bi sed cildê kîtab**

Telmih: **serçêşmeyê heywan**

Mubalexe: **Nagihê lezzet û zewqa me bi sed cildê kîtab**

Lew di **çengê** me dixunê ku di ‘işqa te bi **saz**

Me bi bejna te dixunin **ney û qanûn û rebab**

Tenasûp: **Çeng, saz, ney, qanûn, rebab**

Qehweya telxî digel zehra helahil biderî

Me ji destê te mûbarek şekeramîz e gulab

**Qulzemê ‘işqê ji bayê** xwe muxalif demekê

**Di hemamatê ‘ecacê** me li ser destê **xurab**

Lef û Neşr: **Qulzem, ba û hemamet ‘ecac, xurab**

Seherê **Xudrî** ‘înayet ku birîn çêşmeyê dil 19

Bi cîhanê me nezer da ku cîhan ‘eynê serab

Telmih: **Xudrî**

Bi hebabê mebe mexrûr wehe sergeşte **Mela**

Ba vi ber keftîye wê beyhude sergeşte hebab

Nîda: **Mela**

**We yehudhud ji Seba** bê t û bizanîn **çi ye hal**

Ku li halê me xerîban ne sual û ne cewab

Telmîh: **hudhud, Seba**

Îstifham: **We ye, çi yeçi ye**

Herdu birhên te ne Mîhrêbi **çi îman û çi kufr**

Bûd û nabûd ku yek in ev **çi sewab û çi ‘îqab**

Lef û Neşr: **iman û sewap, kufr û îqab**

Tezad: **îman û kufr, sewab û ‘îqab**

Îstifham: **çi**

Tekrîr: **Çi**

**Werenîşanê Nîşanî** de xwe bêperde seher

Lê ji xûnê bike perhîz ku şehîdan **çi hisab**

Tekrîr: **nîşanê Nîşanî**

Nida: **Were**

## **BAB B (BÊ) XEZELA 7.**

### **LILLAHI LHEMD JI YARÊ ME D DEST CAM E LEBALEB**

Lillahilhemd ji yarê me di dest cam e **lebaleb**

Ji lebê noşî peyapey di dil îlham e **lebaleb**

Tekrîr: **lebaleb**

Di riya wan xet û xalan ku ne herfên qelemî ne

**Me ji me ji Feyza te ye mestane rewan ça me lebaleb**

Husnê ta’lîl: **Me ji me ji Feyza te ye mestane rewan ça me lebaleb**

**Mestê şehkasê meya cezîbe** yîn rûhî didîn

Rûh dizanît ku ji ber lezzetê ‘îşq mame lebaleb

Teşbih: **Mestê şehkasê meya cezîbe**

**Nêrgiza mestî** ji bala **çîmena sunbul û gul** tê

Qedehê taze bi destê xwe tenê da me lebaleb

Îstiare: Îstiareya Vekirî: **nergiza mestî**

Tenasûp: **çîmena, sunbul, gul**

**Wehdetê surf** e me meşreb te çi **iksîrê wucûd**

**Em** lebaleb çi **lebaleb** bi xwe **hemcamelebaleb**

Teşbih: **Wehdetê surf, iksîrê wucûd**

Lefû Neşr: **wehdetê surf, em; iksîrê wucûd, cam**

Tekrîr: **Lebaleb**

**Şem' û perwane** bi zatê xwe ji halê me di dîr in

**Ateşek** surf e ji 'îşqa te vewesta me lebaleb

Telmîh: **Şem' û perwane**

Tenasûp: **Şem',perwane, ateşek**

**Qedehek** taze ji 'îşqê di ezel da me **hekîmî**

Jê dinoşîn hey û hey hê bi xwe **cama** me lebaleb

Îstiare (Îstiareya Vekirî): **hekîmî**

Tenasûp: **Qedehek, hekîmî, dinoşîn**

Carekî gohtî Nîşanî ne **Mela** yî were banî 8

Ev dixwast me ji dil û can dehen û kame lebaleb

Tewriye: **Mela**

**Te** dizanimte dibînim ku **tu** wî **nûrê** wucûd

**Allah Allah** ji çi **nûr** e di seraya me lebaleb

Tekrîr: **te, Allah, nûr**

Ji ‘înayet nezerê xass e ku her **mesre’** û **beytek**

**Qedehên abê heyatî** ne di ş’îra me lebaleb

Tenasûp: **ş’îra, mesr’, beyt**

Telmih: **Qedehên abê heyatî**

## **BAB B (BÊ)XEZELA 8.**

### **ŞAH BI QESDA KUŞTINA MIN RIM HEJANDIN BÊSEBEB**

Şah bi qesda kuştina min **rim** hejandin bêsebeb

**Da** me çeşmê qehr û xeşmê**rim** li dil **daku** edeb

Îstiare:/ Îstiareya vrkirî: **Şah**

Nîda: **ku** edeb

Tekrîr: “**Rim**”

Kuşîyên dîdar û dîne bêxeta **her deh sed in**

Her seher dîsa ji nû wên **têne kêrê sed celeb**

Mubalexe: Kuşîyên dîdar û dîne bêxeta **her deh sed in**, Her seher dîsa ji nû wên **têne kêrê sed celeb**

Dê ji **çerxê pencemîn** bêtin tenezzul kit **Merîx**

**Mislê Şemsê** ger kişînîtin li wan tîxên xezeb

Teşbih: **Mislê şemsê- Merîx**

Tenasûp: **çerxê pencemîn, Merîx, Şemsê**

Her mecala ew di cengê bêt û ret her carekê

**Rast** û **çep** dê bêxistin sed sed bi mizraq û qeseb

Tezad: **Rast, çep**

**Ristem** û **Cimşîd** û **Xalid**, **Hemze** yan **şêrê ‘Elî**

Aferîn ya **şehsiwarê Tirk** û **rimbazê ‘Ereb**

Telmîh: **Ristem, Cimşîd, Xalid, Hemze, şêrê ‘Elî, şehsiwarê Tirk, rimbazê ‘Ereb**



Lê li **tolê** asitanê çix bi wan **le'lan** kirin  
Dergehê fethê vebû îro li mehcûran 'eceb

Îstiareya Vekirî: **tole, le'lan**

Bendeê sadiq seher amancê reştûzên xwe kir  
Min bi qewlê dijminan dit ber xedengan bê sebab  
**Leşkerê qehr û xeman** wê çûn hisara dil bikin  
**Ke'be û Beytulheram** e lê bi nûr bêtin **Receb**

Îstiareya Vekirî: **Leşkerê qehr û xeman**

Tenasûp: **Ke'be û Beytulheram, Receb**

Teşbih: Leşkerê qehr û xeman wê çûn hisara **dil** bikin/ **Ke'be û Beytulheram** e lê bi nûr bêtin **Receb**

**Suftiyên pur le'l û mircanan** bi mujganen heta  
Dîde rewşen bûn bi dîna **dêmdurêsimînebeb**

Îstiare: **Suftiyên pur le'l û mircanan, sîmînebeb**

Ê vi **Xudrî** ra divêt **avê heyatê** bit nesîb  
Dê bi se'y û cehdê yeksan bin li bal wî **roz û şeb**

Tenasûp: **Xudrî, avê heyatê**

Telmîh: **Xudrî, avê heyatê**

Tezad: **roz û şeb**

Xidmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd e **mey**  
**Şîşe û cama zucacî** ê divêt dê ret Heleb

Tenasûp: **Mey, şîşe, cama zucacî**

Telmîh: **Mey, şîşe, cama zucacî**

Cewrê hindî dê kişînit her kesê **tawûs** divêt  
**Gewher û durra yetîm** bê terki ser têtin teleb

Telmîh: **Tawis**

Îstiare: **Gewher û durra yetîm**

Îstihdam: **Durra yetîm**

Xefletê ew keşşifi şîr dest bi dest Hatîn ceger

Go xebînetya Mela miskîn me lê ker kir kezêb

### **BAB T (TÊ) XEZELA 9.**

#### **NÊRGIZÊN ŞENGI DI MEST IN ÇEP Û RAST**

**Nêrgizên şengi di mest in çep û rast**

**Saqîyan cami di dest in çep û rast**

Îstare: **nergizên şengî**

Tenasûp: **mest, saqîyan, cami**

Tezad: **çep û rast**

**Rast û çep tîn ceger û sîne kulab**

‘Er’erên şengi di mest in **çep û rast**

Îstiare: **kulab, ‘ererên şengî**

Tezad: **çep û rast**

Tox û ‘ala ku xwuya bûn ji ‘Ecem

‘Ereban tîpi şikestin **çep û rast**

Tezad: **çep û rast**

Ber vi şerqê di seher westayin

Hindûyên rojiperest in **çep û rast**

Tezad: **çep û rast**

Tezad: **çep û rast**

Qeyserê Rûmê li serheddê firing

Top û zincîri vebestin **çep û rast**

Tezad: **çep û rast**

Herdu destên xwe hemail şevêkê

Me ji bo yarê dixwestin **çep û rast**

Tezad: **çep û rast**

Ve Melê **surperîya horîsifet**

**Sed melek desti bi dest inçep û rast**

Tezad: **çep û rast**

Îstiare: **surperîya horîsifet**

Husna Ta'îlî: **Sed melek desti bi dest in**

### **BAB T (TÊ) XEZELA 10.**

#### **MEHBÛBÊ BI DIL BIT ME BI EVRAZI ÇI HACET**

Mehbûbi bi dil bit me bi evrazi **çi** hacet

'**Enqa** bi xwe bêtin firr û perwazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Telmîh: **Enqa**

Ney dûr e hebîbê me **çifîryad** û **fixan** kîn

Wî guh li demîra dil e awazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Tekrî: **çi**

Go **suxte** murada xwe ji min telbe ke îro

Min go ji kerîm telbe û daxwazi **çi** hacet

Îstiare: **suxte**

Îstifham: **çi**

Min nale refîq in xem û tehlî ne musahib

Firyadi enîsê min e demsazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Dildan û nûaziş **çi** ne duşnami bes in min

Pur derd û cefa hurmet û ‘îzazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Suhbet bi **mey û çengi** hebîbê me bivêtin

Firyad û fixan mi ne **bes sazi** **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Tenasûp: **mey û çengi, bes sazi**

Razên me **çi** hacet weku xemmazi bizanin

Eşkên me bes in dîdeê xemmazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Her lehze **çi** hacet ku bi nazan bikujî min

**Cana** ji xwe qurbana te me nazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Nîda: **Cana**

**Ta çendî** bi hecra xwe tu min tecrîbe îî

Zêrê ji xwe xalis mehek û gazi **çi** hacet

Îstifham: **çi, ta çendî**

Hacet nîye **canayedê beyda** bi deranîn

Inkara dî dîn da nebit ‘**îcaziçi** hacet

Îstifham: **çi**

Nîda: **cana**

Telmîh: **yedê beyda**

Esrarê ezel dê di ebed bêne zuhûrê

**Encamê serencami** ji axazi **çi** hacet

Îstifham: **çi**

Îştiqaq: **Encamê serencami**

Ger **lu'lu'ê mensûri** ji nezmê tu dixwazî

Wer ş'îrê Melê bîn te bi **Şîraziçi** hacet

Îstifham: **çi**

Îstiare: **lu'lu'ê mensûri**

Telmî: **Şîrazî**

### **BAB T (TÊ) XEZELA 11.**

#### **KES BI DADA ME NEPURSIT GILLEH Û DADI ÇI KIT**

Kes bi dada me nepursit gilleh û dadi **çi kit**

Te nebit dadiresek beyhude firyadi **çi kit**

Îstifham: **çi**

Bi **Şîrînê** negehit destî eger **Ristemi** bit

Dê bi bazû û milan şubhetê **Firhatiçi** kit

Îstifham: **çi**

Telmîh: **Şîrînê, Ristem, Firhat**

**Fa'ilek** lazim e da **f'îl** û eser peyda bit

Ger tu heddadi nebit kûre'ê heddadi **çi kit**

Îştîqaq: **fa'ilek, f'îl**

Îstifham: **çi**

**Mumkinek** dê hebitin da ku teleb hasil bibit

**Seyd û nêçîr** ku nebit **tûleê seyyadiçi** kit

Îstifham: **çi**

**Her gil û seng dibitin zêri** bi tedbîri **hekîm**

Qabiliyyet ku nebit **hikmetê** ustadi **çi kit**

Îştîqaq: **Hekîm û hikmet**

Îstifham: **çi**

Kan bi **gewher çi bikit gewher** eger paki nebit

Tu **besîret** te nebit **sîretê** ecdadi **çi kit**

Îstifham: **çi**

**Zêr û zîwer dikirin celbi qulûban haşa**

Husn û sur zatî nebit qametê meyyadi **çi kit**

Îstifham: **çi**

‘**Aşiqê mesti** bi ‘**işqê nîye** hacet bi **meyê**

**Waridêwarid** û ehwali bi **ewradi çi kit**

Îstifham: **çi**

Te xered vêkketina yek weliyek murşidi bit

Salik û talibê îrşadi bi Bexdadi **çi kit**

Îstifham: **çi**

Cehde û se’y û teleb bêeserek safî nehin

Tunebî perdenişîn çaker û qewwadi **çi kit**

Îstifham: **çi**

Çi eser dê li berê xare bikit qitreê ab

**Qelemê** me bi du-sê **qitreyê zuhha** di **çi kit**

Îstifham: **çi**

Dê ji heq cazîbeyek dil bigirit wer ne Mela

Ji ezel ger tu hîdayet nebit îrşadi **çi kit**

Îstifham: **çi**

**BAB T (TÊ) XEZELA 12.**

**EWWEL KU YARÊ DA ME YEK ZERREYEK ‘ÎNAYET**

Ewwel ku yarê da me **yek** zerreyek ‘înayet

Qismet me **xemr û cam** e di deftera hîdayet

Îstiare: **Xemr, cam**

**Husn û cemalê canan** nadêritin tu payan

Herçi nebit bidayet esla nehin nihayet

Tenasûp: **Husn û cemalê canan**

Feyda ‘ulûmê hikmet **cama sedef** ku gêra

Me ji destê **muxbeçan** dît bi **mishef** û bi **ayet**

Tenasûp: **cama sedef, muxbeçan**

Telmîh: **mishef, ayet**

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî

Xaib nebû ji hişî peyda nekir wîlayet

Tenasûp: **nenişî, meyfiroşî, ji hişî**

Alîterasyon: “ş”

Gunah û zuhd û tamat hilnagirit xerabat

Kesê bi vî derî ret divê bikit r’îayet

‘Îşqê ji herdu çeşman ewwel di dil eser kir

Lê zerre zerre axir sotin kir û sîrayet

**Şakissilahi** herdem bi kuştina Melê bit

Gazindeyan **ji kê kim ji kê** bikim şîkayet

Îstiare: **Şakissilahi**

Teşxish: **Şakissilahi**

Îstiham: **kê**

Tekrîr: **ji kê**

Alîterasyon: **“k”**

Cama di destê **şahid** jengê ji dil dişotin

**Pîrê muxan** ji **rendan** weh weh fikir rîwayet

Îstiare: **Şahid**

Telmih: **Pîrê muxan, rendan**

Etwarê ‘işq û mestî esrari butperestî

**Teqrîri sed rîwayet nakit li bo kîfayet**

Mubalexe: **Teqrîri sed rîwayet nakit li bo kîfayet**

Li yetmeinne qelbî ‘**eynu lyeqîn** dibexşet

‘**Eynu l’eyan** divêtin kafî nehin dîrayet

Îqtibas: ‘**eynu lyeqîn**, ‘**Eynu l’eyan**

Mîrî û padişahî mûyek li nik Melayî

Nadim bi mulkê ‘alem yek zerreyek ‘înayet

### **BAB T (TÊ) XEZELA 13.**

#### **‘ER’ERXERAMA BI QEDD Û QAMET**

**‘Er’erxerama bi qedd û qamet**

Yek bûse da me bi sed qîyamet

Îtiare: **Er’erxerama bi qedd û qamet**

Yek bûse bexşî **ewwel** bi ihsan

**Axir** li min kir curm û xeramet



Tezad: **ewl, axir**

Ji jeng û zerqê dil da bişotin

Cama sedef bîn **rend** û keramet

Îstiare: **rend**

Ji herdu çeşmên tey mest û xûnrîz

**Nûra du çeşman kê dî selamet**

Nîda: **Nûra du çeşman**

Îstifham: **kê dî selamet**

Li derd û **êşan peykan û nîşan**

Me ji herdu çeşman kifş in ‘elamet

Tenasûp: **êşan, peykan, nîşan**

Ruswayê ‘işqê تنها ne ez bûm

**Kes dî zemanan hub bê melamet**

Îstifham: **Kes dî**

Du secde ferz in fi l-hal bibîn ber

Dema xwîya bin ew **qedd û qamet**

Îstiare: **qedd û qamet**

Da ‘eybê **rendan nekî bi badê**

**Nufûsu qewmin bîha tesamet**

Tenasûp: **rendan, bade**

Telmî: **Da ‘eybê rendan nekî bi badê/Nufûsu qewmin bîha tesamet**

Mela li ‘umrê bêfeyde borî

Kêşa bi zor an qehr û nedamet

## **BAB S (SÊ) XEZELA 14.**

### **‘UMRÊ ZAY’Î BÛ ME BÊ DILBER ‘EBES**

‘Umrî dayi bû me bêdilber ‘ebes  
Wey tevê ‘umrê me borî ber ‘ebes

Dil emanet da bi **naehlan** nedî  
Lê bi **naehlan** me da gewher ‘ebes

Tekrîr: **naehlan**

Da di **seyra** ‘**işqê** bê **dilber** neçî  
Lê dibit **seyra** te bê dilber ‘ebes

Tenasûp: **seyra** ‘**işqê**, **dilber**

Tekrîr: **dilber**

Pur di pê weslê **me** se’y û cehde da  
Cehde û se’ya **me** Hatîn der ‘ebes

Tekrîr: **me**

Ahi wê kuştim bi derba xencerê  
**Madi** mîlakê diret xencer ‘ebes

Îstifham: **Ma**

Dil ji derba kaşuwan bû parepar  
**Goy di** meydanê dibit sed ker ‘ebes

Îstifham: **Goy di** meydanê dibit sed ker ‘ebes

Mubelexe: **sed ker**

Mehdera vî **suxte**’î îro bikin

Ez dibêjim nabit ev mehder ‘ebes

Îstiare: **sed ker**

Kifş e me’na kî li lewhi-sîmi dî

Nuqte’ê **misk** û **xetê ‘enber** ‘ebes

Tenasûp: **misk** û **xetê ‘enber**

**Da Mela hişyari** bî lê pur kesan

Sîne pur lê dane seng û ber ‘ebes

Nîda: **Da Mela hişyari**

### **BAB S (SÊ) XEZELA 15.**

#### **NAMÊ ‘ENBERŞIKENÊ BÊT JI ‘ENBER MEKE BEHS**

Namê ‘**enberşikenê** bêt ji ‘**enber** meke behs

Bil ji wê silsile û **zulfê mu’enbermeke** behs

Îstiare: **enberşikenê, ‘enber,**

Teşbih: **zulfê mu’enber**

Tekrîr: **enber**

Veke lêvê we ji nêvê biwerîn qend û nebat

Ji lebê le’lî**şeker** bêt ji **şekker** meke behs

Tekrîr: **şekker**

Bi **ser enguştê ‘eqîqî** bide fîncana rehîq

**Abê heywan** te çi yin navi ji kewser **meke behs**

Teşbih: **enguştê ‘eqîqî**

Telmîh: **Abê heywan**

**Zeriyên şehla û durdane** bibin şahidê bezm

Ji genimreng û sîyehçerde û esmer **meke behs**

Teşbih: **Zeriyên şehla û durdane**

Dê **bîşaret bi îşaret** ji neyê bête sema'

Tu ji nayê di sîma'ê bike bawer **meke behs**

Alîterasyon: **“şrt”**

Bi wê nîhalê bi deraxûş û bidê canê şîrîn

Şaxê ‘umrî bixwe ber jê we ji **Qeysermeke behs**

Telmîh: **Qeyser**

**Ayeta husnê mufessel** ke ji keşşafê cemal

‘ilmê ‘îşqê bike tefsîr û ji defter **meke behs**

Îqtibas: **Ayeta husnê mufessel**

Razê dehrê ji sipîhrê tû nizanî bi cedel

Hikmeta dawer e tu j' hikmeta dawer **meke behs**

**Abi heywan** te divêtin tu bibe hemrehê **Xudr**

**Camê Cem** bîn û ji **Dara û Sikendermeke behs**

Telmîh: **Abi heywan, Xudr, Camê Cem, Dara û Sikender**

Ji ezel ‘aqîbeta karî ku me'lûmi nebit

Cama mey noş û ji **teqdîrê muqeddermeke behs**

Îştîqaq: **teqdîrê muqedder**

Dil yarê me nebû nermi bi **sed abi** girî

**Ji dilê dilberê ma û berê mermer mekebehs**

Mubalexe: **sed abi**

Teşbih: **Ji dilê dilberê ma û berê mermer mekebehs**

**Tîri sed têne ceger** sîne li ber maye çeper

Ji dil û cergê kul û sîneê kerker **meke behs**

Mubelexe: **Tîri sed têne ceger**

**Şîrê elmasî** kişfnit tu ji lam'î de xeber

**Vekirit huqqe'ê yaqûti** ji gewher **meke behs**

Teşbih: **Şîrê elmasî,**

Îstiare: **Vekirit huqqe'ê yaqûti**

Ji şefeq **Zuhre** xwuya bit tu binê **perwînan**

Cebhetê ew binumêt tu ji **meh û xawermeke behs**

Tenasûp: **Zuhre, perwînan, meh û xawer**

Li rûyê yarê du **meh** nû me qeran dîne di mest

Tu ji seyra **qemerê** tal'î û **extermeke behs**

Tenasûp: **qemerê, exter, meh**

Pur ji **dêm** û **xet** û **xalan** te xeber daye Mela

**Nezerê** wer bide **bejnê** ji mufesser **meke behs**

Tenasûp: **dêm, xet, xalan, bejnê, nezerê**

## **BAB C (CÎM) XEZELA 16.**

### **ŞIMŞAD-I XERAM Û SERW-I XENNAC**

**Şimşadîxeram** û **serwî xennac**

Canan dibirit bi 'işwe tarac

Teşbih: **Şimşadîxeram** û **serwî xennac**

Min dî seherê di xwabê mestî

Bê deng **tezer** we **lalê durrac**

Teşbih: **tezer, lalê durrac**

Bişkiftî ji xunçe **nêrgiza mest**

Bû ferqi ji ser qedîfe dîbac

Îstiare: **nêrgiza mest**

**Cebhet keşifi ji subhêsadiq**

Nûrê ko veda li ser şebê dac

Teşbih: **Cebhet keşifi ji subhê sadiq**

**Elmasî numane şubhê misrî**

Danîn cegerê me dil kir amac

Teşbih: **Elmasî numane**

Teşbih: **şubhê misrî**

**Nesrîn û binefşe tewwizandin**

Mawerd direşandî şûşeê 'ac

Mubalexe: **Nesrîn û binefşe tewwizandin**

Teşxîs: **Nesrîn û binefşe tewwizandin**

**Cohtê hebeşan** bi terfetil 'eyn

Anî qederek ji Espehan bac

Îstiare: **Cohtê hebeşan**

**Sîma ko numa nema li hiş sîm**

**Sîmabê ji xucle ma ji îxrac**

Husnê talîl: **Sîma ko numa nema li hiş sîm**

Husnê talîl: **Sîmabê ji xucle ma ji îxrac**

**Mir'atê sikenderî** li pêş e

**Behrun we-lehel 'ukûsu emwac**

Telmîh: **Mir'atê sikenderî**

Husnê talîl: **Behrun we-lehel 'ukûsu emwac**

**Dora qemerê ji ber şefeq da**

**Ku spêde li ferqê ser niha tac**

Husnê talîl: **Dora qemerê ji ber şefeq da**

Husnê talîl: **Ku spêde li ferqê ser niha tac**

**Çerxefelek û melek dibazin**

**Şemsun we-kewakibun we ebrac**

Husnê talîl: **Çerx e felek û melek dibazin**

**Zuhre bi qeranê qabê qewseyn**

**We'n-necmu iza hewa bi midrac**

Îstiare: **Zuhre**

Îstiare: **qabê qewseyn**

Husnê talîl: **Zuhre bi qeranê qabê qewseyn**

Husnê talîl: **We'n-necmu iza hewa bi midrac**

**Dengê melean zimêhne zimzim**

**Erwahi ji 'îşqê têne mi'rac**

Husnê talîl: **Dengê melean zimêhne zimzim**

Husnê talîl: **Erwahi ji 'îşqê têne mi'rac**

Telmîh: **Erwahi, mi'rac**

**Dil behr e we sed hezari mewc in**

**Zahid çi xeber ji behra mewwac**

Teşbih: **Dil behr e**

Mubalexe: **sed hezari**

Tekrîr: **behr, mewc**

Tenasûb: **behr, mewc**

Borî we bi **xencekê** Mela kuşt

**Ew xunçeleba delal û xennac**

Teşbih: **Ew xunçeleba delal û xennac**

Alîterasyon: “**xn**”

### **BAB C (CÎM) XEZELA 17.**

#### **DIL JI ‘ILACÊ KU BI DER KET MÎZAC**

Dil ji ‘ilacê ku biderket mîzac

Dê ji le bê noşi‘eta bit ‘ilac

**Ayîneê camêcîhanbînê Cem**

**Badeê le’fî** ne di cama zucac

Telmîh: **Ayîneê camêCem**

Teşbîh: **Badeê le’fî**

Tekrîr: **ilac**

Ji **avê heyatê** bi me da şerbetek

Zinde kirîn ma ji ‘edû ra neşac

Telmîh: **avê heyatê**

Bendî kirim gerçi **şubih fîli bûm**

**Sîmiberê sa’id** û **bazo ji ‘ac**

Teşbih: **şubih fîli bûm**

Teşbih: **Sîmiberê sa’id**

Teşbih: **bazo ji ‘ac**



**Exterê iqbal û mehê birca bext**

**Mîhrê sipîhrê kemer û text û tac**

Teşbih: **Exterê iqbal**

Teşbih: **mehê birca bext**

Teşbih: **Mîhrê sipîhrê**

Tenasûp: **mehê, birca, Mîhrê, Exterê**

Tenasûp: **kemer, text, tac**

Kûsêku hingaftî bi şahî li text

**Padîşehan neqdê rewan dan xerac**

Tenasûp: **şahî, text, Padîşehan**

Mecaz: **neqdê rewan dan xerac**

**Xusrewê Şîrînê** li derbendê husn

Sîmîberan lazim e lê mehr û bac

Telmîh: **Xusrewê Şîrînê**

Sikkeê **ş'îra** me bi navê te hat

Lew bi 'îyarê di cîhan da rewac

**Abê rewan** min diye ş'îra Mela

Yunkiru li'l-mai li-sû'i l-mîzac

Teşbih: **Abê rewan**

**BAB C (CÎM) XEZELA 18.**

**DÎSA JI NÛ BÊHAL E DIL**

Dîsa ji nû bêhal e dilsaqî werîn **cama zucac**

Muştaqê **xemra al** e dil lê xwoşi anîbit mîzac

Alîterasyon: **"I"**

Tenasûp: **saqî, cama zucac, xemra al e**

**Saqî** ku dêm **mehweş** bitin **kagul** ji **şêva reş** bitin

**Qerqef** bila ateş bitinem dê bi wê **dil** kîn ‘ilac

Teşbîh: **Saqî**

Tenasûp: **Saqî, mehweş**

Tenasûp: **dêm, kagul, şêva reş, ateş, dil**

Da em bi wê dil **heybikîn** pê sîne dax û **keybikîn**

Sed menzilan pê **teybikîn** ew dê di seyrê kit rewac

Tekrîr: **bikîn**

Alîterasyon: “y”

Bênûr û narê muhbetê bêneqş û sun’ê qudretê

Naçîn meqamê wesletê nûrun lena we- l-leylu dac

Alîterasyon: “t”

**Ev narê sîqala dil edaîm li wî qala dil e**

**Newroz û sersala dile weqtê hilêtin ew sîrac**

Husnê talîl: **Di mailka jor de husnê talîl bikar hatiye**

Hetta bi nûra **badeyê rengîn** nekî seccadeyê

Dûr î ji wê **şhzadeyê durdaneya gerden ji ‘ac**

Telmîh: **badeyê rengîn**

Îstiare: **şhzadeyê durdaneya gerden ji ‘ac**

**Durdaneya gerdenbilorreyhan** ji ser werdên di Cor

**Hey hey** bi mestî têne dor xala li nik ferqê bi tac

Îstiare: **Durdaneya gerdenbilor**

Alîterasyon: “r”

Tekrîr: **Hey hey**

Mîhrê te pur ebter kirîn xalan ji ber biskan derîn

**Zulfa muselsel ‘enberîn çîn çîn ji Çînê têtê bac**

Teşbih: **Zulfa muselsel, ‘enberîn çîn**

Tekrîr: **çîn**

Cînas: **çîn**

Tenasûb: **xal, bisk, zulf, çîn çîn**

**Tenha ne Kurdistan didin şîraz û Yeng û Wan didin**

**Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac**

Husnê Talîl: **Tenha ne Kurdistan didin şîraz û Yeng û Wan didin/Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac**

**Çehvên belek qewsên xelex çerx û felek xalib melek**

Fî hubbiha ‘umrî delek we-l-**hubbu** yecrî fi ‘ucac

Teşbih: **Çehvên belek**

Teşbih: **qewsên helek**

Teşbih: **çerx û felek xalib melek**

Îştîqaq: **hubbiha**

Alîterasyon: “l k”

**Şahid hezar reng xemmilîn reqs û sema pê kemmilîn**

Îro Mela em sed dil însaqî werîn **cama zucac**

Mubalexe: **Şahid hezar reng xemmilîn**

Husnê Talîl: **reqs û sema pê kemmilîn**

Tenasûb: **reqs, saqî, cama zucac**

## **BAB H (HÊ) XEZELA 19.**

### **PUR MEKE ISRAFÊ DI QETLÊ MUBAH**

Pur meke israfê di qetlê mubah

**Sefku demi'l-'aşıqi ma la yubahyelmî**

Telmî: **Pur meke israfê di qetlê mubah / Sefku demi'l-'aşıqi ma la yubahyelmî**

Sîne bi destê xwe mûbarek veke

**Te'rife kem fî kebidî min cirah**

**Dil ji hewayaya te di fikrên di hûr**

**Fî lucecin beyne hubûbi r-riyah**

Teşxîhs: **Dil ji hewayaya te di fikrên di hûr**

Telmî: **Dil ji hewayaya te di fikrên di hûr / Fî lucecin beyne hubûbi r-riyah**

'Işq ku giha kê we li 'eqlê xwe ma

**Yeftiku bi'l'aşıqi husnu l-milah**

Îstifham: **kê**

Telmî (Du Se Zimanî): **'Işq ku giha kê we li 'eqlê xwe ma / Yeftiku bi'l'aşıqi husnu l-mila**

Dê du siyehsurmeê çehvên xwe kit

**Xakê rehê yarê seba her sebah**

Teşxîhs: **Dê du siyehsurmeê çehvên xwe kit / Xakê rehê yarê seba her sebah**

Husnê talîl: **Dê du siyehsurmeê çehvên xwe kit / Xakê rehê yarê seba her sebah**

Tekrîr: **seba**

Telmîh: **seba**

Toz û xubarê seherê ber çîmen

**Qed neşere t-tîbe we-bi'l-miski fah**

Telmî: **Toz û xubarê seherê ber çîmen / Qed neşere t-tîbe we-bi'l-miski fah**

Husnê Talîl: **Toz û xubarê seherê ber çîmen / Qed neşere t-tîbe we-bi'l-miski fah**

Fêris û rimbazi gihan yek bi tîr

**Ehmedu fi l-beyni qetîlu r-rimah**

Telmî: **Fêris û rimbazi gihan yek bi tîr / Ehmedu fi l-beyni qetîlu r-rimah**

Tenasûb: **fêris, rimbaz, tîr**

Bûsezenan her kî ber an asitan

**Mekkene min cebhetihi la berah**

Husnê Talîl: **Bûsezenan her kî ber an asitan / Mekkene min cebhetihi la berah**

Telmî: **Bûsezenan her kî ber an asitan / Mekkene min cebhetihi la berah**

